



Kovara Akademîk a Xebatên Kurdî ya Navneteweyî
International Peer-reviewed Journal of Kurdish Studies

Cild 1 Jimar 3 Sal 2 - 2015
Volume 1 Issue 3 Year 2 - 2015



Pak Ajans Yayıncılık Ltd. Şti.

Büyük Reşitpaşa Cad. Yümni İş Merkezi No: 22/29

Vezneciler – Fatih / İSTANBUL

Tel & Faks: 0212 519 00 09

www.nubiharakademi.com | email: nubiharakademi@gmail.com

Li Ser Navê Pak Ajansê Xwediyyê Kovarê û Berpîrsê Karên Nîvîsê
On Behalf of Pak Agency the Owner of Journal and Responsible Editor
Pak Ajans Yayıncılık Ltd. Şti. adına Sahibi ve Yazışları Müdürü
Süleyman Çevik

EDÎTORÊ GIŞTÎ / EDITOR-IN CHIEF

Adak, Abdurrahman / Assoc. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey

DESTEYA EDÎTORIYÊ / EDITORIAL BOARD

Acar, Hayrullah / Asst. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey

Aydın, Tahirhan / Assoc. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey

Baluken, Yusuf / Mardin Artuklu University, Turkey

Beltekin, Nurettin / Asst. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey

Bor, İbrahim / Assoc. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey

Ergün, Zülfü / Mardin Artuklu University, Turkey

Tek, Ayhan / Asst. Prof., Mus Alparslan University, Turkey

Türel, Vehbi / Asst. Prof., Bingöl University, Turkey

DESTEYA ŞÊWRÊ / ADVISORY BOARD

Akın, Salih / Assoc. Prof., Rouen University, France

Bozarslan, Hamit / Prof., École des Hautes Études en Sciences Sociales, France

Bruinessen, Martin Van / Prof., National University of Singapore, Singapore

Jalil, Jalile / Prof., Instituta Kurdzaniyê, Wien, Austria

Kreyenbroek, Philip G. / Prof., Georg-August University, Germany

Musa, Abdulwahab Khalid / Assoc. Prof., Zakho University, Kurdistan-Iraq

Valî, Abbas / Prof., Boğaziçi University, Turkey

Yeğen, Mesut / Prof., İstanbul Şehir University, Turkey

SEKRETERYA / SECRETARY

Kurt, Şehmuz / Mardin Artuklu University, Turkey

ÇAP / PRINTED BY

Alioğlu Matbaacılık Bas. Yay. ve Kağı. San.

Tic. Ltd. Şti. Orta Mah. Fatin Rüştü Sk.

No: 1-3 / A Bayrampaşa / İstanbul

MÎZANPAJ & PAGE DESIGN

Dawud Rébiwar

Nûbihar Akademî kovareke bihekem, akademîk û navnetewî ye. Di demsalên bihar û payîzê de salê du caran tê weşandin. / Nûbihar Akademî is an international peer-reviewed academic journal. It is published biannually in spring and autumn.

Yayın Türü: Yerel Süreli Yayın.

ISSN: 2147-883X

HEKEMÊN VÊ JIMARÊ/REVIWERS OF THIS ISSUE

Acar, Hayrullah / *Asst. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*

Adak, Abdurrahman / *Assoc. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*

Akın, Salih / *Assoc. Prof., Rouen University, France*

Aslan, Mustafa / *Asst. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*

Aydın, Tahirhan / *Assoc. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*

Çeçen, Ramazan / *Mardin Artuklu University, Turkey*

Ergün, Zülküf / *Mardin Artuklu University, Turkey*

Jabbari, Najmoddin / *Asst. Prof., Kurdistan University, Iran*

Kardaş, Canser / *Asst. Prof., Mus Alparslan University, Turkey*

Keskin, Necat / *Asst. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*

Kıran, Abdullah / *Assoc. Prof., Mus Alparslan University, Turkey*

NAVEROK / CONTENTS

JI EDÎTOR/EDITORIAL	07-10
Şêx Muhyedînê Hêni: Di Edebiyata Kurdî de Nûnerekî Girîng ê Temaya Xwarinê Sheikh Muhyeddin Hêni: An Important Representative of Food Theme in Kurdish Literary	
ABDURRAHMAN ADAK.....	11- 52
زمانی ستاندەر، فۆنۆلۆژی و رینوس Standard Language, Phonology and Alphabet	
BAKIR O. ALI / ABDULWAHAB KH. MOSA.....	53-74
Analîza Strana Ez Xelef im Li ser Şopa Dîroka Kurdan ya Sedsala XIXem The Analysis of Ez Xelef im Song in the Footsteps of Nineteenth Century of Kurdish History	
NURDAN ŞARMAN	75-100
Bîbliyografiyayeke Weşanên bi Îngilîzî li ser Folklora Kurdan A Bibliography of English Publications on Kurdish Folklore	
NECAT KESKİN / RAMAZAN PERTEV.....	101-116
WERGEREK / A TRANSLATION	
Li ser Edebiyata Kurdî & Li ser Melayê Cizîrî MARTIN HARTMANN / Ji Almanî: ABDULLAH İNCEKAN	119-133
DOKUMENTEK / A DOCUMENT	
A Yezidi Commentary by Mawlânâ Muhammed al-Barqal'î Şîroveyeke Êzîdîtiyê ya Mewlana Mihemedê Berqel'î	
MUSTAFA DEHQAN	137-151

Ji Editör

Lêkolînerên hêja merheba.

Kovara akademîk a xebatêñ Kurdî ya Navneteweyî *Nûbihar Akademî* bi jî-mara xwe ya sêyem li pêşberî we lêkolîner û eleqemendêñ Kurdolojiyê ye. Cihê kêfxweşiyê ye ku bi saya *Nûbihar Akademiyê* di nav lêkolînerên Kurdolojiyê de tevgereke akademîk a berbiçav tê çavdêrîkirin. Daxwaza me ji endamêñ akademiya Kurdî ew e ku bi nivîsîna gotar û lêkolînêñ xurt ên akademîk piştgiriyê bidin *Nûbihar Akademiyê*. Guman tuneye ku bihêzbûna *Nûbihar Akademiyê* bihêzbûna akademiya Kurdî bi xwe ye û di riya tekamula xebatêñ Kurdolojiyê de qeti'kirina mesafeyeke mezin e.

Di vê jimara *Nûbihar Akademiyê* de di qadêñ Kurdolojiyê yên ciyawaz de çar gotar, wergerek û dokumentek cih digirin. Ji bilî dokumenta ku bi Îngilîzî ye, hemû nivîsîn dîtir bi Kurdiya Kurmancî ne. Ji gotarêñ Kurmancî yek bi alfabeşa Kurdî-erebî, yên dîtir bi alfabeşa Kurdî-latînî ne.

Ji çar gotaran du heb bi şewekeyeke interdisiplinerî hatine nivîsîn ku yek ji wan di warêñ edebiyata klasîk û çanda Kurdan, ya dî jî di warêñ muzîk û tarîxa Kurdan de ye. Ji gotarêñ dîtir yek jê di warê zimanzanî, ya dî jî di warê folklorê de ye. Werger di warê edebiyata Kurdî ya klasîk, dokument jî di warê baweriyêñ Kurdan de ye.

Abdurrahman Adak di gotara xwe de ku sernavê “Şêx Muhyedînê Hêni: Di Edebiyata Kurdî de Nûnerekî Girîng ê Temaya Xwarinê” ye, li ser helbestvanê klasîk ê serdema piştî mîrektîyan Şêx Muhyedînê Hêni, malbata wî ya Xalidî-Neqşebendî ku ji berhemdariya wî re bûye paşxan û menzûmeya wî ya xwarinê ku ji girîngtirîn berhemêñ qada edebiyata ladînî-beşerî a serdema klasîk tê hesibandin, analîzeke berfireh kiriye.

Nurdan Şarman di gotara xwe ya bi sernavê “Analîza Strana Ez Xelef im: Li ser Şopa Dîroka Kurdan ya Sedsala 19mîn” bi arîkariya tarîxa devkî û ya nivîskî ya sedsala XIXem û bi nîşandana varyantêñ ciyawaz ên strana navdar a bi navê *Ez Xelef im* a herêma Botan, hin xalêñ tarî û pêşqeþbûlêñ şaş ên bi tarîxa Kurdan a sedsala XIXem û yên bi metnê stranê ve peywendîdar ronî kirine.

Bakir O. Ali û Abdulwahab Kh. Mosa di gotara xwe ya hevpar a bi navê “Zimanî Stander, Fonolojî û Rênuş” de li ser rastiya têgehêñ zimanê standart, fonolojî

û rînusa Kurdî rawestiyane, peywendiya navbera wan û kartêkirina wan a li ser hev destnîşan kirine û hewl dane ku ji bo sazkirina yekîtiyekê di navbera têgehên van qadêن cuda de hin pêşniyazan bikin.

Necat Keskin û Ramazan Pertev di gotara xwe ya hevpar a bi sernavê “Bibliyografyayek Weşanên bi Îngilîzî li ser Folklora Kurd” de hem ji bo lêkolînerên folklora Kurdî bîbiliyografyayeke gotar û pirtûkên li ser folklora Kurdî yên di zimanê Îngilîzî de amade kirine, hem jî bi vê gotara xwe bal kişandine ser girîngiya amadekirin û nûjenkirina bîbiliyografyayê hemû qadêن Kurdolojiyê.

Di vê jimarê de me nûjeniyek jî kiriye û bi sernavê “Wergerek”ê beşeke nû a kovarê saz kiriye. Armanca me ew e ku di vê besê de em gotarêن girîng, jibîrbûyî û klasîk ên Kurdolojiyê bi bal Kurdî yan Îngilîzî ve bidin wergerandin û pêşkêşî cîhana Kurdolojiyê bikin. Di vê beşa yekem de Abdullah Încekan, gotareke Martin Hartmann a li ser edebiyata Kurdî ya klasîk ku di sala 1898an de bi navê “Zur Kurdischen Literatur” (Li ser Edebiyata Kurdî) di kovara *Wiener Zeitschrift für die Kunde des Morgenlandes* de hatiye weşandin ji Almanî bi bal Kurdî ve wergerandiye. Încekan herweha li pey vê wergerê cih daye wergera nivîsa Harttman a ku di sala 1904an de li Berlinê di destpêka çapa dîwana Melayê Cizîrî de li ser Mela nivîsiye. Bi vî awayî her du nivîsên Hartman ên ku li ser Kurdolojiyê nivîsîne bi hev re hatine pêşkêşkirin.

Di beşa “Dokumentek”ê ya vê jimarê de Mustefa Dehqan ji mecmû'eyeke destxet ku di sala 1005/1596an de hatiye îstînsaxkirin û niha li Meşhedê (Îran) li pirtûkxaneya “Astanê Quds”ê tê parastin, şîroveya Êzîdiyan a alimê Kurd ê sedsala XVIem Mela Mihemedê Berqel’î deşifre kiriye. Berqel’î ev şîroveya xwe li ser fetwaya Êzîdiyan a alimekî dî yê Kurd bi navê Mela Salihê Hekkarî kiriye. Berqel’î di şîroveyên xwe de nêrînên tund ê Mela Salihê Hekkarî nerm kirine û xwestiye ku di nirxandina Êzîdîtiyê de rîbazeke zanistî bisopîne. Ev dokument, hem ji ber ku di sedsala XVIem de nêrîna Kurdan a li Êzîdiyan, hem jî ji ber ku cihêrengiya di navbera du alimên Kurd ên wê serdemê radixe ber çavan girîng e.

Em di wê baweriyê de ne ku hûn dê vê jimara têr û tijî ya *Nûbihar Akademiyê* bi kêf bixwînin û em jî dê di jimara bê de dîsa bi gotar û lêkolînen akademîk li pêşberî we bin.

Bi hêviya rojêن xweş û geştir.

Doç. Dr. Abdurrahman Adak
Edîtor

Editorial

Esteemed researchers,

Nûbihar Akademî, international peer-reviewed journal of Kurdish studies, greets researchers and enthusiasts of Kurdology with its third issue. It is gratifying to see that there have been visible academic efforts among Kurdology researchers thanks to *Nûbihar Akademî*. We expect Kurdish academia to support *Nûbihar Akademî* with sound academic articles and studies. There is no doubt that strengthening of *Nûbihar Akademî* is strengthening of Kurdish academia itself and great progress in the development of Kurdology studies.

This issue of *Nûbihar Akademî* features four articles, a translation, and a document from the diverse field of Kurdology. Except for the document, which is in English, all the other articles are in Kurmanji Kurdish. One of the Kurmanji articles is written in Kurdish-Arabic script, while the rest are in Kurdish-Latin script.

Two of the four articles have employed an interdisciplinary method with one of them on Kurdish classical literature and culture and the other on Kurdish music and history. One of the remaining two articles deals with linguistics and the other folklore. The translated article is on classical Kurdish literature and the document is about Kurdish faiths.

In his article entitled “Sheikh Muhyedîn Hêni: An Important Representative of Cookery in Kurdish Literature,” Abdurrahman Adak offers an extensive analysis of classical poet in the post-principality period Sheikh Muhyedîn Hêni, his family Naqshbandi-Khalidi, which contributed to his prolificacy, and his poetry of cookery that is considered as one of the most significant works of nonreligious literature of classical period.

In her article entitled “An Analysis of the Song Ez Xelef im: In the Pursuit of the 19th Century Kurdish History,” Nurdan Sarman sheds light on certain obscure spots and clarifies certain faulty preconceptions about the 19th century history of the Kurds and related to the text of the song with the help of the 19th century oral and written history, and by demonstrating various versions of the renowned song from the Botan region named *Ez Xelef im*.

In their article entitled “Standard Language, Phonology, and Orthography,” Bakir O. Ali and Abdulwahab Kh. Mosa studied concepts of standard language,

Kurdish phonology and orthography, demonstrated their relationship and the influence they have on each other, and offered a number of suggestions for establishing uniformity of concepts from different fields.

Necat Keskin and Ramazan Pertev, in their article entitled “A Bibliography of English Publications on Kurdish Folklore,” not only prepared for Kurdish folklore researchers a bibliography of articles and books written in English on Kurdish folklore but they also attracted attention to the significance of preparing and updating bibliographies of all areas of Kurdology.

We did something new in this issue and added a new section titled “A Translation” to our journal. Our aim in this section is to have significant, forgotten articles of classical Kurdology translated into Kurdish or English, and submit to the world of Kurdology. In this section we first feature Abdullah İncekan’s translation into Kurdish from German of an article by Martin Hartmann on classical Kurdish literature entitled “Zur Kurdischen Literatur” (On Kurdish Literature), which was published in 1898 in the journal *Wiener Zeitschrift für die Kunde des Morgenlandes*. İncekan also included the translation of another piece of writing by Hartmann published in the introduction of the second edition of diwan of Melayê Cizîrî in Berlin in 1904. In this way Hartmann’s both works in Kurdology are presented together.

In the “Document” section of this issue, Mustefa Dehqan deciphers a commentary by a 16th century Kurdish scholar named Mela Mihemedê Berqelî on Yazidis that was copied in 1005/1596 from a handwritten magazine now preserved in the Central Library of Astan Quds Razavi in Mashad, Iran. Berqelî bases his commentary on a fatwa regarding Yazidis by another Kurdish scholar named Mela Salihê Hekkarî. He softens in his commentaries rigid views of Hekkarî, and tries to pursue an academic method in the critique of Yazidism. This document is significant in that it not only reveals how Kurds viewed Yazidis in the 16th century but also demonstrates the difference of opinion between two Kurdish scholars of that time.

We believe that you will enjoy reading this packed issue of *Nûbihar Akademî* and we will meet you again in the next issue with academic articles and studies.

With the hope of better and brighter days.

**Assoc. Prof. Abdurrahman Adak
Editor**

Şêx Muhyedînê Hêni: Di Edebiyata Kurdî de Nûnerekî Girîng ê Temaya Xwarinê

Sheikh Muhyedin Heni: An Important Representative of Food Theme in Kurdish Literary

Abdurrahman Adak*

PUXTE:

Şêx Muhyedînê Hêni (k.d.derdora 1897an) yek ji girîngtirîn helbestvanê klasik ê serdema piştî mîrektiyen e. Paşxana wî ya edebî, wekî piraniya helbestvanan wê serdemê Xalidîtiya Neqşebendî ye. Lewra bavê wî bi xwe postnişînê şaxa Xalidiyan a Hênen bû. Şêx Muhyedîn ku mexlesên wî Sa'î û Heqî ne, hem li pey şopa Melayê Cizîri helbesten klasik nivîsiye, hem jî di mijara xwarinê de menzûmeyike serbixwe nivîsiye. Di wê serdemê de li Hênen û Aqtepeyê di nivîsîna helbesten bi temaya xwarinê de bizaveke edebî derketiye meydanê. Bi qasî ku tê dîtin, di tarixa edebiyata Kurdi de yegane helbestvanê klasik ê ku di vî warî de berhemeke serbixwe nivîsiye Şêx Muhyedîn e. Ji ber ku di edebiyata Kurdi ya klasik de di mijarên ladînî-beşerî de berhemên serbixwe kêm in, ev berhema nivîskar girîngiyeke taybet bi dest dixe. Berhema ku bi qasî 20 kom û 130 cureyên xwarinê di xwe de dihewîne, bi şêwazeke edebî xwarinên Kurdan ên serdema nivîskar, pênaseyên wan û menûya ser sifreyê radixe ber çavan. Berhem ji vî alîyî ve wekî berhemeke pêşserdemî dikare bê hesibandin.

* Doç. Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Fakulteya Edebiyatê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdi, Mêrdin, Türkiye

Assoc. Prof. Mardin Artuklu University Faculty of Literature, Department of Kurdish Language and Literature, Mardin, Turkey
e-mail: abdurrahmanadak@gmail.com

Bêjeyêن sereke: Şêx Muhyedînê Hêni, Xalidîti, simatiye, xwarin.

ABSTRACT:

Sheikh Muhyedin Heni (about 1897) is one of the most prominent poet of the period of after principality. His literary background, like most poets of that period, is based on Khalidy branch

of Nakhsibendi sect. Because his father was a sheikh of the branch of Khaldî in Hêni. Sheikh Muhyeddin, whose pen names are Sa'i and Heqi, wrote classical poem on the road of Melayi Ciziri, he also wrote an independent poem on foods. On that period, a movement of writing poems contents of which were foods was emerged in Hêni and Aqtepe. As far as known, Sheikh Muhyeddin Heni is the sole classical poem who write an independent literary artifact on that issue. Because of the fact that the secular content are limited in the classical Kurdish poem, this work of Sheikh have a special place. That work which contains 20 group and 130 sort of foods, in a literary way presents the Kurdish kitchen of the period of the writer, their recipies and menus. In this aspect, that work can be seen as a futuristic work.

Keywords: Sheikh Muhyedin Heni, Khalidiyyah, simatiyyah, food.

1. DESTPÊK

Serdema piştî mîrektiyan, di nav qonaxên tarîxa edebiyata Kurdî de xwediyê hin taybetiyên xweser e. Di vê serdemê de helbesta klasîk li ser terzê Melayê Cizîrî dewam kiriye, edebiyata tekyayê pêş ketiye û di warên edebiyata dînî û ladînî/beşerî de jî berhemên orjînal hatine dayîn. Taybetiyeke dî ya vê serdemê jî ew e ku medrese û tekyayê Neqşebendîtiya Xalidî wekî wargehêن nû yên edebiyata Kurdî ya klasîk derketine pêş. Yek ji nûnerên girîng ê vê serdemê jî Şêx Muhyedînê Hêni ye ku ew bixwe endamê malbeteke Xalidî/Neqşebendî ye. Wî ji aliyekî ve kevneşopiya berê ya helbesta klasîk a standart domandiye, ji aliyekî ve jî di cureya simatiyeyê (temaya xwarinê) de menzûmeyeke resen daye. Simatiyeya Şêx Muhyedîn ji hemû simatiyeyê din bihecimtir e û ji aliyê edebî ve gelekî bi hêz e. Berhem herweha ji kêm berhemên edebî yên Kurdî ye ku di serdema klasîk de di warê edebiyata beşerî/ladînî de hatiye nivîsîn. Armanca vê gotarê ew e ku wekî nûnerekî girîng ê serdema piştî mîrektiyan li ser Şêx Muhyedînê Hêni û wekî nimûneyeke girîng a cureya simatiyeyê li ser simatiyeya wî bê rawestan.

Jêdereke klasîk ku rasterast ji bo Şêx Muhyedîn hatiye terxankirin nayê zanîn. Lîbelê derheqê bavê wî Şêx Ehmed Efendî de du jêderên girîng hene. Yek ji wan biyografiyeke ku ji aliyê birayê wî yê mezin Şêx Me'rûf ve derheqê bavê wan Şêx Ehmed Efendî de hatiye nivîsîn. Di vê biyografiyê de bi awayekî giştî derheqê zarokên Şêx Ehmed de jî agahî hatine dayîn. Ev biyografi hem derheqê malbata Şêx Muhyedîn, hem jî derheqê wî de gelek tiştan ronî dike. Jêdere duyem a nivîskî jî berhema Ebdulmecîd b. Muhemed el-Xanî ya bi navê *el-Hedaiqu'l-Werdiyye fi Heqaiq Ecillai'n-Neqşebendîyye* ye. Di vê berhemê de derheqê aliyê wî yê tesewîfî de agahiyên girîng hatine dayîn. Di vê gotarê de ji bo ronîkirina jiyana Şêx Muhyedîn di serî de ji van her du jêderan sûd hatiye wergirtin. Ji bo mijarênu ku di her du jêderên

navborî de tunene rasterast ji nûnerên girîng ên malbata Şêx Muhyedîn agahî hatine bidestxistin. Yek ji van nûneran Şêx Cahid e. Şêx Cahid kurê Şêx Mehmûd e, ew jî neviyê Şêx Mérûfê birayê nivîskarê me ye. Me di sala 2008an de li Diyarbekirê li mala Şêx Cahid bi wî re hevdítinek saz kir. Wê demê Şêx Cahid digel agahiyêن zarekî yên girîng biyografiya ku bapîrê wî Şêx Mérûf nivîsiye jî dabû me. Mixabin Şêx Cahid piştî hevdítina me bi hefteyekê koçî dawiyê kir. Ev hevdítin ji bo ku di sempozyuma Liceyê de di gotara me ya derheqê helbestvanê Lice û derdora wê de em behsa Şêx Muhyedîn bikin hatibû sazkirin. Di encamê de di wê sempozyumê de behsa Şêx Muhyedîn û herweha behsa neviyê wî Şêx Heybet jî hat kirin û gotar di pirtûka sempozyumê de hat çapkiran. Nûnerê duyem ji Mela Ehmed e. Mela Ehmed kurê Şêx Heybet e, ew jî neviyê nivîskarê me Şêx Muhyedîn e. Bi vê minasebetê em ji Şêx Cahid re bexşandina Yezdanê Dilovan daxwaz dikin û ji Mela Ehmed re jî spasdarî û minetdariyêن xwe pêşkêş dikin. Ebdulkaliq Arca ku pêwendiya me bi her duyan re saz kir spasiyêن ji dil heq dike. Hemîd Kılıçaslan jî derheqê tarîxa malbatê de hin agahiyêن zarekî dan me. Em ji wî re gelekî spas dikin.

Metnê simatiyeya Şêx Muhyedîn derveyî sînorêن vê gotarê hatiye girtin. Hem faksîmîle, hem jî latînîzeya simatiye û helbestên Şêx Muhyedîn ji aliyê Mela Birhanê Tarînî ve bi hev re hatine çapkiran (Weşanxaneya Peywendê, Stenbol 2015). Ji ber ku bidestxistina wê guncaw e, me pêdawîstî nedît ku em jimareyêن beytên ku di gotarê de wekî nimûne hatine pêşkêşkirin ji nusxeya orjînal nîşan bidin. Bi vê minasebetê ji bo ku nusxeya destxet a metnê menzûmeyê da me em ji Tarînî re spasiyêن xwe pêşkêş dikin.

Di gotarê de pêşî nasname, malbat, serdem û Xalidîtiya Şêx Muhyedîn hatiye zelalkirin, piştre jî bi firehî li ser aliye wî yê edebî hatiye rawestan. Di çarçoveya aliye wî yê edebî de jî pêşî mexlesên wî, derdora wî ya edebî û helbestvaniya wî ya klasik hatiye pêşkêşkirin, piştre jî bi taybetî simatiyeya wî û cihê wê di tarîxa edebiyata Kurdî de hatiye destnîşankirin.

2. ŞÊX MUHYEDÎNÊ HÊNÎ: NASNAME Û JIYANA WÎ

Navê helbestvanê me yê tam Şêx Muhyedînê Hêni ye. Navê bavê wî Şêx Ehmed, navê diya wî jî Emîne ye. Texmînî di sala 1849an de hatiye dinyayê (Jêder: Şêx Cahid). Diya wî Emîne keça Ebdullah Efendiyê Karazî ye û ji ber ku li Karazê koçî dawiyê kiriye li wir li goristana malbatê hatiye veşartin. Ji diya wî berî wî du xuşkên wî û piştî wî jî xuşkeke wî çêbûye. Lêbelê van her sê xuşkan jî di zaroktiyê de koçî dawiyê kirine. Loma Şêx Muhyedîn ji diya xwe tenê ye (Maruf, r.4). Ji van agahiyân derdikeve meydânê ku cihê jidayîkbûna wî Karaz e. Çawa ku em dê li jêrê behs bikin, piştî wefata diya Şêx Muhyedîn, bavê wî mala xwe biriye Hênen. Loma jî zaroktiya wî li Hênen derbas bûye û piştre bi bal Hênen ve hatiye nisbetkirin.

Li gorî agahiyê ku ji neviyê Şêx Muhyedîn Mela Ehmed hatine berhevkirin ku wî jî ev agahî bi endamên dî yê malbatê dan piştrastkirin, Şêx Muhyedîn ji bo ku perwerdeyê bibîne çûye Mêrdînê û li wê derê wî û Şêx Ebdurehmanê Aqtepî bi hev re perwerde dîtine. Dema ku li Mêrdînê bûye ji bavê xwe re nameyeke menzûm ku bi vê beytê dest pê dike, rê kiriye:

Eya ey Şêx Ehmedê Hanî

Meded ya Qutbê Geylanî

Careke ku ji Mêrdînê ji bo serdanekê hatiye Hênenê, li ser daxwaza bavê xwe Şêx Ehmed Efendî hew vege riwayaye Mêrdînê û li wir di medreseyâ bavê xwe de ku iro jî li Hênenê wekî ‘Hicreya Şêx Ehmed Efendî’ tê naskirin, li cem birayê xwe yê mezin Şêx Me'rûf perwerdeyâ xwe domandiye. Piştî ku li wir perwerdeyâ xwe xilas kiriye, bi qasî çend salan bi malitî li gundêن Liceyê yên bi navêن Balicnê û Zobrînê maye û li her du gundan jî dersdarî kiriye. Yek ji melayêن naskirî ku li van gundan li cem wî xwendiyê Mela Mihemedê Tepecikê ye. Di navbera her duyan de tekiliyeke taybet hebûye. Şêx Muhyedîn piştre mala xwe anîye Hênenê û li wir jî di medreseyâ bavê xwe de dersdarî kiriye (Jêder: Mela Ehmed). Salih Begê Hênenî (k.d.1925) ku xwarziyê wî ye li wê medreseyê pêşî li cem Şêx Me'rûf, piştre jî li cem Şêx Muhyedîn xwendiyê (Jêder: Şêx Cahid; Adak 2008).

Xîtabeta Şêx Muhyedîn geleki bi hêz bûye. Li gorî rîwayetê dema miftiyê Liceyê Mela Ehmedê Esma ji Balicniyan re xîtabet dikir, gundiyan jê re digotin ku xîtabeta te jî wekî ya Şêx Muhyedîn xweş e (Jêder: Mela Ehmed).

Şêx Muhyedîn li dora sala 1897an de li Hênenê wefat kiriye. Gora wî li Hênenê, li cem qubbeya bavê wî ye (Jêder: Şêx Cahid).

Kurekî Şêx Muhyedîn bi navê Şêx Şewket û keçekte wî bi navê Emîne hebûne. Ji Şêx Şewket jî sê neviyêن wî çebûne: Şêx Heybet (Ji bo agahiyêن berfireh derheqê Şêx Heybet de bnr. Adak, h.g., r. 435-436), Şêx Hesîb û Xanim (Jêder: Mela Ehmed).

3. JI BERIYÊ HETA HÊNÊ SERENCAMA MALBATA WÎ

Malbata Şêx Muhyedîn ku wekî ‘Malbata Şêx Ehmedê Karazî’ tê naskirin li Kurdistana Bakur yek ji girîngtiirîn malbatêñ ilmî, tesewifî û edebî yê serdema xwe ye. Serokê malbatê Şêx Ehmedê Karazî ku bavê Şêx Muhyedîn e, di nîveka pêşî ya sed-sala XIXem de li gundekî Midyadê yê bi navê Silibînê hatiye dinyayê. Navê bavê wî Mela Umer e. Mela Umer ji ber pevçûnekê ji ví Gundî koç kiriye û li herêma Bişeriye pêşî li gundê Şêxçoban, piştre jî li gundê Girêşîra bi cih bûye. Mela Umer di zaroka-tiya Şêx Ehmed de koçî dawiyê kiriye û li goristana Şêxçoban hatiye väşartin. Ji ber

ku navê bapîrê Şêx Ehmed ê çarem Xidir e, ji wan re “Milanê Xidir” hatiye gotin. Vê malbatê berî Mela Umer jiyana xwe li deşta Mêrdînê bûrandine. Malbat ji aliyê binerih/nesebê ve bi riya Îmam Hesen digihîje Cenabê Pêxember (Maruf, r.2).¹

Şêx Ehmed di medreseyên girîng ê Kurdistanê de perwerde dîtiye. Wî li Kurdistan Başûr li cem kurê Şêx Yehyayê Mizûrî Şêx Ebdullah xwendina xwe xilas kiriye û ji wî icazet sitandiye (Maruf, r.2).

Şêx Ehmed piştî ku xwendina xwe xilas kiriye li Girêşîra bi xanimeke bi navê Helîmeyê re zewiciye. Ji wê zarokên wan ên bi navê Me'rûf û Zeyneb çêbûne. Şêx Ehmed piştre koçî Karazê kiriye ku wê demê gundekî li ser Liceyê bûye. Çawa ku çûye Karazê xanima wî Helîme li wir miriye. Li wê derê ji malbata Bokariyan bi xanimeke bi nave Fatîme re zewiciye û ji wê jî zarokên wî M. Qasim û M. Nûrî çêbûne. Fatîme jî li Diyarbekirê koçî dawiyê kiriye. Vê care Şêx Ehmed li Karazê bi diya Şêx Muhyedîn Emîneyê re zewiciye. Lîbelê wê jî li wê derê koçî dawiyê kiriye. Jiyana Şêx Ehmed a li Karazê 7 salan dom kiriye. Loma jî wekî Şêx Ehmedê Karazî hatiye naskirin. Şêx Ehmed piştre ji Karazê derketiye û li Hênen bi cih bûye û li wê derê di sala 1301/1883/1884an de 63 salî koçî dawiyê kiriye.

Şêx Ehmed bi giştî bi 7 xaniman (Helîme, Fatîme, Xedîce, Emîneya Bokarî, Emîneya Karazî, Zehra û Esma) re zewiciye û ji van xaniman 13 zarokên wî çêbûne. Nivîskarê me Şêx Muhyedîn di nav 13 zarokan de yê çarem e. Berî Şêx Muhyedîn M. Maruf, Zeyneb, M. Qasim û M. Nûrî; piştî wî jî M. Masum, M. Refî, Şehzade, Leyla, Gulsum, Sehîme, Aîşe û Umer hene (Maruf, r.4-5.).

4. WEKİ ŞAXA XALIDÎTYÊ YA HÊNÊ MALBATA ŞÊX MUHYEDÎN

Dema bi awayekî giştî li tarîxa edebiyata Kurdiya Kurmancî bê nêrîn dê bê dîtin ku berhemên edebî yên Kurdiya Kurmancî di du serdemên tarîxî de hatine dayîn: Serdema mîrektiyan û serdema piştî mîrektiyan. Taybetiya herî zêde girîng a serdema mîrektiyan ew e ku di vê serdemê de li gelek bajarên Kurdistanê desthilatdarî di destê mîrekîn Kurdan de bû û li van bajaran ji aliyê mîrekan ve medreseyên mezin hatibûn avakirin. Helbestvanên vê serdemê bi piranî ji van medreseyan derdiketin û di bin desthilatdariya van mîrekan de dijiyan. Vê rewşê heta bi nîveka sedsala

1 Li gorî agahiyênu ku Hemîd Kılıçaslan dan me, Mala Xidir li Berriya Mêrdînê axayêneşîra Miliyan bûn. Ji ber ku heft malên wan li dijî wan rabûn û di nav xwe de yekîtiyek çêkirin, Mala Xidir jî koçî herêma Amûdê kirin û li wir bi cih bûn. Piştî vê veqetînê êdî ji wan re “Milanê Xidir”, ji yên dî re ji “Milanê Zoré” hat gotin. “Milanê Xidir” niha jî li dora Amûdê dijîn ku di nav sînorên Sûriyeyê de mane û ew der ji wekî Berriya Mêrdînê tê qebûlkirin.

XIXem dom kir ku di vî wextî de dawî li desthilatdariya mîrektiyêndan hat dayîn û di encama vê de medreseyên mîrekan jî ji holê rabûn.

Tam di vî wextî de li Kurdistanê bi riya Mewlana Xalidê Şehrezorî (k.d.1826) bizaveke tesewifi derdiket meydanê. Vê bizava ku di demeke kurt de li tevahiya cîhana İslâmê belav bûbû, bi taybetî li Kurdistanê li kêleka desthilatdariya manewî desthilatdariya siyasi û civakî jî xist destê xwe. Ev jî bi riya xelifeyên Mewlana Xalid ên ku li cihêن wekî Basret, Nehrî û Tewileyê navendên girîng ava kiribûn çêbûbû (Ji bo agahiyên berfireh bnr. Adak 2009). Li deverên curbicur ên Kurdistanê jî şaxê van navandan vebûbûn. Îcar edebiyata Kurdî ya vê serdemê bi piranî di van navend û şaxê wan de derket meydanê û di vê serdema nû de jî helbesta Kurdî ya klasik hebûna xwe domand. Lêbelê cudahiya helbestvanên vê serdemê ji yên mîrektiyan ew bû ku êdî helbestvan ne di bin desthilatdariya mîrekan de, bi piranî di bin desthilatdariya şêxên Xalidiyan de dijîyan û ne ji medreseyên mîrektiyan, ji medrese û tekyayên Xalidiyan derdiketin.

Helbestvanê me Şêx Muhyedîn jî yek ji wan helbestvanan e ku di vê serdema nû de di şaxeke Xalidiyan a tesewifi de perwerde bûye. Ji wê jî wêdetir ew bi xwe kurê postnişinê vî şaxî ye. Loma jî rawestana li ser aliyê Şêx Ehmedê Karazî yê tesewifi û avakirina wî ya şaxa Karaz û Hêne ya Xalidîtiyê girîng e. Şêx Ehmedê Karazî ku li cem Şêx Ebdullahê kurê Mela Yehyayê Mizûrî icazeya medreseyê standiye, cara pêşî li cem wî intisabî tesewifê jî kiriye (Maruf, r.2). Piştre di sala 1266/1849/1850yî de ji bo ziyareta ewliyayan çûye Bexdayê û li wir ji Şêx Elî en-Neqîb destûra Qadirîtiyê standiye. Her weha li wir li cem xelifeyê Mewlana Xalid Şêx Ebdulfettah jî perwerdeya tesewifi dîtiye. Piştre li Kurdistana Başûr li cem xelifeyê Mewlana Xalid Şêx Osmanê Tewili perwerde dîtiye. Piştre hatiye navendeke dî ya Xalidîtiyê (Basret) û intisabî postnişinê wê Şêx Xalidê Cizîrî kiriye û ji wî jî xelifeftî stendiye. Lêbelê piştî mirina Şêx Xalidê Cizîrî navbera wî û postnişinê pey Şêx Xalidê Cizîrî Şêx Salihê Sîpkî xirab bûye. Lewra Şêx Salihê Sîpkî li ser xelifeyên Şêx Xalidê Cizîrî ferz kiriye ku hemû xelifeyên wî salê carekê werin Basretê û gora Şêx Xalidê Cizîrî ziyaret bikin. Şêx Ehmedê Karazî û gelek xelifeyên dî ev tiş qebûl nekirine û Muhemmed el-Xanî ku li Şamê postnişinê navenda merkezî ya Xalidîtiyê bû ji mijarê agahdar kirine. Muhemmed el-Xanî di vê mijarê de Şêx Ehmedê Karazî û hevalên wî mafdar dîtine. Şêx Ehmed li cem xelifeyê Şêx Salihê Sîpkî Şêx Hamidê Mêrdînî û kurê Mewlana Xalid Şêx Necmedîn jî perwerdeya tesewifi dîtiye. Şêx Ehmedê Karazî herî dawî çûye Şamê û di sala 1844an de ji Muhemmed el-Xanî xelifeftiya mutleq standiye û vege riyyaye Karazê (el-Xanî, r. 273-274; Korkusuz 2004, r.71-75). Bi vî awayî pêşî li Karazê û piştre jî li Hêne şaxeke girîng û naskirî ya Xalidîtiyê ava bûye ku ji aliyê Şêx Ehmed Efendî ve dihat birêvebirin.

Şêx Ehmed Efendî di jiyanâ xwe de xelîfetî daye kesên wekî Şêx Hesenê Îshaqan, Şêx Mihemedê Hêni, Hacî Mistefayê Çermîkî, Mela Arifê Surkanî û Şêx Me'rûf (kurê wî yê mezin) û kesekî xelkê Medîneyê (Maruf, r.2).

Pey wefata Şêx Ehmed Efendî re li Hênen vê şaxa Xalidîtiyê hebûna xwe zêde nedomandiye. Ji zarokên wî tenê Şêx Me'rûf û nivîskarê me Şêx Muhyedîn perwerdeya medreseyê dîtine. Piştî Şêx Ehmed Efendî kurê wî yê mezin Şêx Me'rûf li şûna wî postnişinî kiriye. Di maweya postnişinîya Şêx Me'rûf de nivîskarê me Şêx Muhyedîn jî li medreseyê muderristî kiriye. Piştî Şêx Me'rûf li Hênen xebatê tesewifî bi awayekî nîzamî nehatibin domandin jî her du kurêne wî Şêx Ebdullah û Şêx Qadir wekî nûnerên malbatê hatine qebûlkirin. Herweha kurê Şêx Qadir Şêx Mehmûd û kurê Şêx Mehmûd Şêx Cahid; neviyên Şêx Ehmed Efendî Şêx Riza û Şêx Emîn; kurê Şêx Muhyedîn Şêx Şewket û kurê Şêx Şewket Şêx Heybet jî nûnertiya malbatê kirine (Jêder: Şêx Cahid û Mela Ehmed).

Çawa ku li jorê jî hat gotin, di serdema piştî mîrektyan de edebiyata Kurdi ya klasik di bin sîwana Xalidîtiyê de pêş ketiye. Şêx Muhyedîn jî bûye yek ji nûnerên edebiyata klasik a piştî mîrektyan. Helbestvanê me hem di serdema bavê xwe Şêx Ehmed de, hem jî di serdema birayê xwe Şêx Me'rûf de di vê navenda tesewifî de jiyanâ xwe bûrandiye, zemanê xwe ji bo ilm û edebiyatê terxan kiriye û hemû berhemên xwe di wê atmosferê de dane.

5. MEXLESÊN WÎ: SA'Î Û HEQÎ

Yek ji taybetiyên girîng û jêneger ên edebiyata klasik jî di helbest û menzûmeyan de bikaranîna mexlesê ye. Dikare bê gotin ku mexles navekî dî yê helbestvan e ku di helbestên xwe de bi kar tîne. Her çiqas piraniya helbestvanan di helbest û menzûmeyen xwe de mexlesekî tenê bi kar tînin jî, carinan hinek helbestvan ji ber sedemên curbicur du yan zêdetir mexlesan jî bi kar tînin. Helbestvanê me Şêx Muhyedîn jî yek ji wan e ku di helbestên xwe de du mexles bi kar anîne: Sa'î û Heqî. Di edebiyata Kurdi ya klasik de berî Şêx Muhyedîn, kesên wekî Melayê Cizîrî (Mela, Nîşanî, Ehmed), Feqiyê Teyran (Feqî, Miksî, Mîm û Hê), Salim (Rencûrî, Bîmar û Salim) û Mewlewî (Me'dûmî û Mewlewî) jî ji yekê zêdetir mexles bi kar anîne ku Şêx Muhyedîn jî bi bikaranîna du mexlesan ketiye nav vê kategoriyê.

Her du mexlesên Şêx Muhyedîn (Sa'î û Heqî) jî di ciyêن curbicur ên simatiyeya wî de derbas dibin. Mexlesa wî ya bi şêweya Sa'î di van pênc beytan de weha hatiye bikaranîn:

Xetim oldî xamûr îşî kahîde
Çorek de yiylmez [se] **Sa'î** n'ide

Bes e **Sa'î** kînek heye te j' kund'ran
Ji ber wî bi xerez hatî van kund'ran

Tu behsê qe nakî ji heywa aşî
Bixwu roz û şeb **Sa'î** hetta xwuş î

Veşîr şorbeya şolikan bê xeber
Heta sax i **Sa'î** meke lê nezer

Evana bi şekr û qerenfil bigîr
Bi dimsê jî **Sa'î** were lê binêr

Mexlesa wî ya bi şêweya Heqî jî di sê ciyên menzûmeyê de bi vî awayî hatiye bikaranîn:

Bixwu subh û şaman ji wê tu Feqî
Eger tu b' gumanî bipirs ez **Heqî**

Bi xêr hatî ey tûtikê xurmenav
Heme dem li we bin ji **Heqî** selav

Li finc aşî naête xwarin **Heqî**
Li pey kardûwê tu mebe qet şeqî

Helbestvanê me derveyî simatiyeyê di helbestên xwe de jî ev her du mexlesên xwe bi kar anîne. Li gorî agahiyên li ber destan, wî mexlesa xwe ya bi şêweya Sa'î di xezelek û muxemmesike xwe de û mexlesa xwe ya bi şêweya Heqî jî di sê xezelên xwe de bi kar anîne ku li jêrê hatine nîşandan:

Mexmûrê seher erşed **Sa'î** derê cana
Bê mal û xerîb e ji ewan û xemzeê berqîn

Heta kengê şikayet kî evê begzadeya şêrîn
Te nîne der cîhan yarek menendê wê dileş sengîn

Tu bispêre ‘ezîzê zuntiqam ey **Sa’iyê** xemgîn
 Li min be yek şebê firqet bi naz û ‘îşwe mihman î
 Bi ser çehvê me ra hatî perîya neslê mîranî

Li van derd û xeman bigre şibak û pencer û taqan
 Derê dil **Heqîya** rade li ser wan tu bi sed xelqe

Di vê silka ku sade'n-nûr me danî lu'lu'ê mensûr
 Ku **Heqî** dil bike mesrûr ji qeyda hesretê berde

Wek tûle li dergahê te **Heqî** ku dikûze
 Hêvî me ji lutfa te ku neg'rê li me bab e

Çawa ku tê dîtin helbestvanê me Şêx Muhyedîn di sê xezelên xwe de mexlesa Heqî bi kar anîye. Lêbelê ji ber ku ihtîmala hebûna helbestvanekî dî ku mexlesa Heqî bi kar anîbe heye, li vir li ser mijara nisbeta van her sê helbestan bi bal helbestvanê me ve divê bi taybetî bê rawestan. Gelo ev her sê helbest ji aliyê helbestvanê bi mexlesa Heqî ve ku di heman demê de mexlesa Sa'î jî bi kar anîye hatine nivîsin, yan ji aliyê Heqiyekekî dî ve hatine nivîsin? Li gorî me ji ber van xalên jêrîn, ev her sê helbesten ku bi mexlesa Heqî hatine nivîsin jî helbesten Şêx Muhyedîn in.

1. Ji ber ku helbestvanê me di simatiyeya xwe de digel mexlesa Sa'î mexlesa Heqî jî bi kar anîye, guman tuneye ku Heqî jî mexleseke wî ye.
2. Li gorî encamên ku di lêkolînan de ji aliyê me ve hatine bidestxistin, heta niha di edebiyata Kurdiya Kurmancî de helbestvanekî duyem ku mexlesa Heqî bi kar anîye tuneye.
3. Di xezelek ji van xezelên ku bi mexlesa Heqî hatiye nivîsin de, beytek heye ku nivîskar tê de bi şêweya luxezekê işaretî mexlesa xwe ya duyem Sa'î dike. Ew beyt jî weha ye:

Ku tahir kî tu wê ‘Eynê ji dexma nuqteya Xeynê
 Elîf deynî li mabeynê dibînî yarê bê perde

Li vir helbestvan dibêje ku eger tu herfa ‘Eyn/ê ji nuqteya li ser Xeyn/ê paqij bikî û Elîf/ê deynî navberê, wê demê tu dê bikarî yarê rasterast bibînî. Li vir aşkerâ ye ku helbestvan işaretî peyvekê dike û dibêje ‘eger tu li gorî wateya wê peyvê

tevbigerî tu dê yarê bibînî? Dema mirov lê hûr dibe, mirov têdigihe ku helbestvan herfa ‘Eyn/عە daye û gotiye “Elif/إِلِيْف”ê bixe navbera wê û herfeke dî. Her çiqas helbestvan herfa duyem nedabe jî, bi awantaja zanîna me ya derheqê mexlesa Sa’î, em têdighin ku ew herfa duyem Sîn/س و e û dema herfa Elîf/إِلِيْف bikeve navbera Sîn/س و û ‘Eyn/عە dê peyva “Sa’î/ساعى” derkeve meydanê.

Helbestvan li vir ji aliyê wateyê ve jî dibêje ku eger tu “Sa’î” bî, yanî eger tu se’yê bikî (xeyret û cehdê xerc bikî) tu dê bikarî yarê bibînî. Bi vî awayî helbestvan li vir hem işaretî mexlesa xwe ya duyem Sa’î kiriye û hem jî şertê dîtina yarê ifade kiriye. Eger li vir ne ev yek hatibe quesdkirin, beyt dê bê wate bimîne. Loma bi rehetî dikare bê gotin ku di vê beytê de peyva Sa’î hatiye quesdkirin.

Dema mirov van xalan tevan li ber çavan bigire, bi awayekî zelal derdikeve meydanê ku ev her sê helbestên bi mexlesa Heqî jî yên Şêx Muhyedîn in û bi mexlesa wî ya duyem hatine nivîsin.

6. DERDORA WÎ YA EDEBÎ

Çawa ku berî niha jî hat ifadekirin, helbestvanê me Şêx Muhyedîn tevahiya zemanê xwe ji bo ilm û edebiyatê terxan kiriye. Lâbelê nabe ku ew di karê xwe yê edebî de bi tena serê xwe mabe. Lewra di serdema piştî mîrektiyan de di dergahêن Xalidiyan de gelek edîb û helbestvan hebûn û ne pêkan bû ku ev edîbênen han bi hev re nekevin nav têkilî û danûstandinê.

Li gorî rîwayetê di serdema Şêx Muhyedîn de li dergahê wan ji malbata wî helbestvanekî dî jî hebûye ku navê wî Şêx Ebdullah e. Şêx Ebdullah kurê Şêx Ma’ruf, neviyê Şêx Ehmedê Efendî û kurmamê Şêx Muhyedîn e. Lê mixabin helbestenê wî negihîştine roja me (Jêder: Şêx Cahid).

Di serdema Şêx Muhyedîn de li devereke dî ya Diyarbekirê (li gundê Aqtepeyê ya li ser Çinara Diyarbekirê) şaxeke dî ya Xalidiyan ava bûbû ku ev sax wekî ‘Eko-la Aqtepeyê’ tê naskirin. Damezirînerê vî şaxî Şêx Hesenê Nûranî jî wekî bavê helbestvanê me Şêx Ehmedê Karazî bi dergahê Basretê yê Xalidîtiyê ve girêdayî bû. Bi vî awayî di navbera damezirînerên her du şaxan de û bi awayekî siruştî di navbera zarokên wan de jî têkiliyeke tesewîfî hebû.

Aşkera ye ku Şêx Muhyedîn ji aliyê edebî ve jî bi ekola Aqtepê re di nav têkilî û danûstandinan de bû. Li gorî ku tê rîwayetkirin Şêx Hesenê Nûranî (1863/1864) derbareyê şiyana Şêx Muhyedîn a di helbestê de weha gotiye: “*Ez bavê sha’ira me, Sa’î jî diya wa ye.*” (Jêder: Şêx Cahid). Li gorî qeneeta me xwediyyê vê gotinê ji Şêx Hesenê Nûranî zêdetir kurê wî Şêx Ebdurehmanê Aqtepî ye. Lewra Şêx Hesenê

Nûranî wekî helbestvanekî nayê zanîn, yan jî bi qasî ku tê zanîn tu helbestên wî negîhiştine roja me û ji aliyê helbestê ve navdartirîn kesê Aqtepî jî Şêx Ebdurehmanê Aqtepî ye. Ji aliyekî dî ve tê zanîn ku Şêx Ebdurehman û Şêx Muhyedîn hevalê hev ê xwendinê bûne. Hetta Şêx Ebdurehmanê Aqtepî ji bo helbesta Şêx Muhyedîn a ku bi beyta

Her dema tê fikrê min Kerbela şahim şehîd
Sed hezar lenet dibêm ber rewanê an Yezid

dest pê dike gotiye ku ‘tenê ev beyt beramberî *Rewdu'n-Neîma* min tê’ (Jêder: Mela Ehmed)² Bi rastî jî hebûna helbesên Şêx Ebdurehman ên derheqê muhebbeta ehlê beytê û le'netlêanîna Yezid de jî ji bo hebûna têkiliyeke di navbera wan de wekî delîlekê dikare bê dîtin.

Ji Aqtepiyan kesekî dî yê ku bi Şêx Muhyedîn re di nav têkiliyê de ye Şêx Mihemed Canê birayê Şêx Ebdurehmanê Aqtepî ye. Ji ber ku Şêx Mihemed Can zavayê Hêniyan bû, derfeta têkiliyên wan zêdetir çêdibû. Çawa ku dê li jêrê bi firehî li ser bê rawestan, hebûna helbestên her duyan ên bi temaya xwarinê vê yekê piştrast dike.

Ji bo ku têkiliya di navbera Şêx Muhyedîn û malbata Aqtepiyan de nîşan bide delileke dî jî heye ku nusxyeyeke destxet a simatiyeya wî li cem malbata Aqtepiyan maye û ev nusxe digel destxetine dî yên Aqtepiyan ji bo ku îstînsax û çap bike teslimî Zeynelabdîn Amidî hatiye kirin (Jêder: Mela Birhanê Tarîni.)

Bêguman ev hemû nîşan didin ku çawa şaxên Hênenê û Aqtepeyê yên Xalidî ji aliyê tesewifi ve di nav têkiliyekê de ne, di heman demê de endamên wan şaxan ji aliyê edebî ve jî di nav têkilî û danûstandineke tam de ne. Guman tuneye ku kesayeta Şêx Muhyedîn a edebî di nav vê derdora edebî de kemiliye.

7. HELBESTÊN WÎ YÊN KLASÎK

Heta niha tenê 5 helbestên Şêx Muhyedîn hatine tesbîtkirin. Bi vî halê xwe jî be, ev helbest dikarin bingeha dîwançeyeke biçûk saz bikin. Eger siberoj çend helbestên wî derkevin meydanê wê demê dîwançeya wî, eger gelek helbestên wî derkevin meydanê wê demê jî dîwana wî dê temam bibe.

Digel vê jî qeneéta giştî ew e ku dîwanekê wî ya helbestan hebûye, lêbelê ev dîwana wî bi awayekî yekpare negîhiştîye roja me. Li gorî agahiyênu ku Şêx Cahid dan me, dîwana Şêx Muhyedîn hebûye û di sala 1975an de di erdheja Liceyê de

² Ev beyt ji aliyê Mela Ehmed ve bi awayekî zarekî ji me re hatiye gotin. Mixabin beytên dî yên helbestê nayê zanîn.

winda bûye. Bi rastî jî ji helbestên wî yên ku li ber destan e tê fêmkirin wî li gorî terzê dîwanê bi qafiyeyên curbicur helbest nivîsîne û loma jî pêwîst e ku helbestên wî yên bi qafiyeyêن dî jî hebin (Jêder: Mela Ehmed).³

Ji van pênc helbestên wî xezela yekem di dawiya simatiyeya wî de cih girtiye.⁴ Her sê xezelêن dî di mecmû'yeke destxet de cih girtine.⁵ Muxemmesa wî jî di mecmû'eya Zeynelabidîn Amidî ya bi navê "Mecme'u'l-Qesâid"ê de cih girtiye (Amidî 1995, r.45-51). Faksîmîle û latînîzeyêن van her pênc helbestan ji aliyê Mela Birhanê Tarînî ve hatine weşandin. (Hênî 2015, r. 63-72, 94-103).

Ji ber ku em ji helbestên wî yên dî ne haydar in, em dê li vê derê tenê di çarçoveya van pênc helbestan de dahûrîn û nirxandinekê bikin û cihê wî di helbestvaniya klasik de destnîşan bikin. Ji van pênc helbestan sê heb jê bi mexlesa Heqî, du heb jî bi mexlesa Sa'i hatine nivîsîn. Her sê helbestên bi mexlesa Heqî bi teşeya xezelê, ji her duyên bi mexlesa Sa'i jî yêk bi teşeya xezelê, ya dî bi teşeya muxemmesê ye.

Xezela yekem ji deh, xezela duyem ji neh, xezela sêyem ji hivde û xezela çarem ji heft beytan pêk hatine. Jimara beytên xezelan di sinorêن jérîn û jorîn de ne, lêbelê ne derveyî standarda xezelên Kurdî ne.

Xezel li gorî standardê bi şêweya aa, ba, ca... hatine serwakirin. Di xezela yekem de serwa heye, lêbelê paşserwa (redîf) tuneye. Di her sê xezelêن dî û muxemmesê de hem serwa, hem jî paşwerwa hene. Serwa, di xezela yekem û muxemmesê de murdef, di her sê xezelêن dî de mucerred e. Redîf, di her sê xezelan de dengê "e" ye ku lêkera "bûn"ê ya hevokê navdêrî ye û di muxemmesê de dengê "î" ye ku zemîra kesane ya şexsê duyem e.

Xezelêن sêyem û çarem û muxemmes ji behra hezeca salim bi qalibê *Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun*; xezelêن yekem û duyem jî ji behra muzariyê bi qalibê *Mef'ûlu mefa'îlu mefa'îlu fe'ûlun* hatine nivîsîn. Helbestvan di bikaranîna 'erûzê de serkeftî ye. Di helbestên wî de ahengeke musîkal a serdest tê dîtin.

3 Ev beyta wî ya ku bi awayê zarekî ji aliyê malbata wî ve tê veguhestin ji bo vê yekê nîşaneyeke dî ye.

Her dema tê fîkrê min [ku] Kerbela şahim şehîd

Sed hezar lenet dibêjim ber rewanê an Yezîd

Bêguman ev beyt ne bi serê xwe ye, berevajiyê wê parçeyek ji helbestekê ye. Lewra di çarçoveya teknîka helbesta klasik de ev beyt, beyta metla/destpêkê ye û pêwîst e dewama wê jî hebe. Lêbelê mixabin dewama wê li ber destan tuneye û di hafizeya malbatê de jî tenê ev beyt maye. Li gor rîwayetê Şêx Ebdurehmanê Aqtepî ji bo vê beytê weha gotive: 'Ev beyt tenê beramberî *Rewdu'n-Néima* min tê'.

4 Orjînala Simatiyeyê û ev helbesta wî di pirtûkxaneyên taybet ên Mela Zeynelabidîn Amidî de tê parastin.

5 Orjînala mecmû'yeke di pirtûkxaneyâ Taybet a Mela Birhanê Tarînî de tê parastin.

Muxemmesa wî ji 17 bendar pêk tê ku li gorî standarda muxemmesan hinekî dirêj e. Ji ber ku di hemû bendar de her du misrayên dawî hatine dubarekirin muxemmes di nav kategoriya muxemmesên mutekerrîr de ye. Lêbelê helbestvan di vê xalê de tiştekî resen kiriye. Lewra heman neqerat di hemû bendar de bi awayekî yekpare nehatiye dubarekirin. Bi gotineke dî her du beytên dawî yên benda yekem di dawiya hemû bendê dî de nehatine dubarekirin. Li vir tiştê resen ev e ku her pênc misrayên benda yekem di her du misrayên dawî yên hemû bendar de bi dorê cot cot hatine dubarekirin.

Helbestên Şêx Muhyedîn çawa ku ji aliyê ruxsarê ve di çarçoveya helbestên klasik de bin, ji aliyê naverokê ve jî di heman çarçoveyê de ne. Loma mijara sereke ya helbestên wî evîn e. Xezelên wî zêdetir “xezelên aşiqane” ne ku bi giştî derheqê kîf û izdiraba eşqê de hatine nivîsin. Di xezelên wî de xalên wekî evîndarî û şert û mercen wê, pesindayîna xweştiviyê, mezmûnên bi xweşikayıya fizikî ya rûyê xweştiviyê re têkildar, şibandina wê bi desthilatdarên maddî, naza wê, firqeta ji wê û eziyet û cefaya ku evîndar dikişîne cih digirin.

Her çiqas kêm helbestên Şêx Muhyedîn gihiştibin roja me jî, helbestên wî yên li ber destan ji bo ku asta helbestvaniya wî nîşanî me bidin têrê dikin. Jixwe çawa ku di mijara “Derdora Wî ya Edebî” de jî derbas bû, Şêx Muhyedîn, di helbestvaniya xwe de ji aliyê Şêx Ebdurehmanê Aqtepî ve ku nûnerekî gelekî girîng ê serdema piştî mîrektiyan e, bi gotina “Ez bavê şâ’ira me, Şêx Muhyedîn jî diya wa ye.” hatiye pesendkirin. Ev pesendkirin jî pileyeke bilind a asta edebî û terzê wî yê edebî nîşan dide.

Bêguman ev nirxandina di vê anekdota tarîxî de girîng e, lêbelê dîsa jî nirxandineke bisînor e. Eger mirov di çarçoveya seyra giştî ya edebiyata Kurdî ya klasik de li helbestên Şêx Muhyedîn binêre, dê bê dîtin ku ew di helbestên xwe de xeta helbesta klasik a edebiyata rojhilate dişopîne ku di edebiyata Kurdî de bi Melayê Cizîrî sembolize bûye. Şêx Muhyedîn terzê Melayê Cizîrî bi taybetî şopandiye û ketiye bin bandora wî. Eger dahûrînek bê kirin, dê bê dîtin ku piraniya mezmûn û sembolên ku Şêx Muhyedîn bi kar tîne berî wî ji aliyê Melayê Cizîrî ve hatine bikaranîn. Bo nimûne mezmûn û sembolên ku di vê benda jêrîn a muxemmesa Şêx Muhyedîn de derbas dibin, ku ev bend ji aliyê temayê ve kakila muxemmesa wî ye, di dîwana Mela de bi rehetî dikarin bêñ dîtin:

Were ey xunçeya dêr û kenişa Ermenistan î
 Di iqlîmê melahet de tu Cengizzan û Xaqan î
 Li min be yek şebê firqet bi naz û ‘işwe mihmanî
 Mesae'l-neyri ya dilber li mulkê dil Suleyman î
 Bi ser çehvê me ra hatî perîya neslê mîranî

Yek ji xezelên Şêx Muhyedîn, hem ji aliyê qafiye, hem ji aliyê weznê, hem jî ji aliyê mezmûn û sembolan ve gelekî dişibe xezeleke Melayê Cizîrî ku ev xezela Şêx Muhyedîn ji bo ya Mela wekî nezîreyekê jî dikare bê dîtin. Li jêrê ji her yekê ji wan beytek hatiye dayîn. Di van beytan de îfadeya hevbeş a bi şeweya “di husnê cewhererek ferd e” digel hevbesiyên navborî têkiliya di navbera her du helbestvanan de bi awayekî aşkera derdixe meydanê:

Melayê Cizîrî:

Ji qedd û bejn û balayê ji reng û dêm û sîmayê
Tu rengî qet xeber nayê **di husnê cewhererek ferd e**

Şêx Muhyedîn:

Bikin reqs û tewafê ew li dora ke'beya husnê
Ji şewqa wê hebîba ku **di husnê cewherê ferd e**

Ev her du beytên jêrîn ên Şêx Muhyedîn û Mela jî, pileya ku bandora Mela gihiştiyê radixin ber çavan. Lewra Şêx Muhyedîn beyta Mela bi yekpareyî tezmîn kiriye û adeta heman beyt bi uslûba xwe ji nû ve nivísiye:

Melayê Cizîrî:

Bi dînarê dinê zinhar da yarê xwe tu nefroşî
Kesê Yûsuf firotî wî di ‘alem da xesaret kir

Şêx Muhyedîn:

Nedî yarê bi dînarê dibî xasir di bazarê
Kesê Yûsuf firot karî nekir kêşa kul û derd e

8. SIMATIYEYA WÎ

Di edebiyata klasîk de ew helbest an menzûmeyên ku derheqê pênase û zewqên xwarinan de hatine nivîsin wekî “simatiyye/simatname” hatine binavkirin (Kaya 2007, r.48; Erdogan 2003, r.32-33) û ev helbest, menzûme û berhemên bi vê temayê yek ji cureyên edebî hatiye qebûlkirin. “Simat” peyveke Erebî ye ku tê wateya sifre û xwarinên ku tê ser sifreyê. Ev peyv bi vê wateyê di simatiyeya Şêx Muhyedîn de jî sê caran hatiye bikaranîn:

Xwuş e bûqçe boregî bîne **simat**
Çûnîn te salih esehhê ruwat

Werin hûn digel kîpeê nam(i)dar

Simata murovê kibarê kibar

Kereng jî bi hêkan ra tête **simat**

Kezalîk gûriza ku ‘eynu’l-heyat

8. 1. Berî Şêx Muhyedîn Rewşa Simatiyeyan

Mijara xwarinê, bi awayekî giştî di edebiyata klasik a rojhilate de de zêde bala hel-bestvanan nekişandiye û di vî warî de kêm berhem hatine dayîn. Di edebiyata Farisî de ji aliyê Ebû İshaq Hellacê Şîrazî (k.d. 1427) ve bi navê *Dîwanî Et’ime* dîwaneneke ku ji helbestên curbicur ên bi xwarinan re têkildar hatiye nivîsin û berhem di sala 1302/1844-1888an de li Stenbolê hatiye çapkîrin (Şîrazî 1302) Dikare bê gotin ku ev berhem hem ji aliyê qewareya xwe ve, hem jî ji aliyê dewlemendiya helbestên xwe ve di vî warî de popularîteya xwe heta niha jî didomîne. Di dawiya sedsala XVIIem de ji aliyê Ahmed Cavid ve ferhenga peyvîn wê hatiye amadekirin û peyv bi Tirkî hatine ravekirin (Gökyay 1997, r.244-245).

Vê mijarê ji edebiyata Tirkî ya klasik zêdetir, di ya gelêri de rexbet dîtiye û bi navê “destanên xwarinê” hatiye binavkirin. Di edebiyata Tirkî de yekem kesê ku di vê mijarê helbest nivîsîne Kaygusuz Abdal (sedsal XV-XVI) e (Kaya, h.c.; Erdogan, h. c.). Piştî wî jî gelek kesên dî di vê mijarê de helbestên Tirkî nivîsîne. Lîbelê di vî warî de berhemên ku hatine nivîsin ne menzûm in, pexşan in (Kaya, h.c.; Erdogan, h. c.; Güldemir 2010, r.3-6).

Bi qasî ku tê zanîn, di çarçoveya edebiyata Kurdî de li ser mijara xwarinê, bi gotineke dî di cureya simatiyeyê de kêm nimûne hatine dayîn. Lê digel vê jî di vî warî de bi şêweyêni curbicur hinek nimûne tên dîtin. Ji bo ku cihê simatiyeya Şêx Muhyedîn di nav simatiyeyen Kurdî de bi awayekî zelal derkeve meydanê, pêwîst e ku bi lêkolîneke arkeolojîk û bi awayekî giştî li ser nimûneyen vê cureyê yên di edebiyata Kurdî ya klasik de çavek bê gerandin. Bi qasî ku tê dîtin nimûneyen beriya berhema Şêx Muhyedîn ne berhemên serbixwe ne. Dikare bê gotin ku navê hin xwarin û vexwarinan di piraniya dîwan û mesnewiyan de di nav hin beytan de cih digirin. (Ji bo teswîreke berfireh a vê mijarê bnr. Ergün 2014, r.190-192; Yıldırım 2011, r.197-199).⁶ Lîbelê carinan jî di dîwanan de helbest (Şîrazî 1302, r. 20-21).⁷

6 Bo nimûne, Ehmedê Xanî, di *Mem û Zînê* de di beşa daweta Sitî û Tacdînê de, dema sifreya mîrê Botan teswîr dike navê hin xwarin û vexwarinan dide.

7 Dîwana Ebû İshaq Hellacê Şîrazî (sedsala XVem) ya bi navê *Dîwanî Et’ime* ku bi zimanê Farisî dîwaneneke bi temaya xwarinê ye wisa ye. Dikare bê gotin ku Ebû İshaqê

û di mesnewiyan de jî beş ji bo vê mijarê hatine terxankirin (Sêrtî 2002, r.42-444; Aqtepî 1986, r.124-125).⁸ Bêguman eger di çarçoveya dîwan û mesnewiyên klasik ên Kurdi de xebatek li ser mijara xwarinê bê kirin, dê encamên girîng derkevin meydanê. Lêbelê di çarçoveya agahiyê berdest de, berî Şêx Muhyedîn di vî warî de berhemên serbixwe nehatine nivîsin.

8. 2. Di Serdema Şêx Muhyedîn de Rewşa Simatiyeyan û Bizava Helbestnivîsîna bi Temaya Xwarinê

Serdema Şêx Muhyedîn, ji aliyê helbestnivîsîna bi temaya xwarinê ve gelekî girîng e. Dema em têkilî û danûstandina şaxên tesewifî yên Hênelê û Aqtepeyê li ber çavan digirin, derdikeve meydanê ku di dawiya sedsala XIXem de li van her du şaxan di çarçoveya nivîsîna helbestên bi temaya xwarinê de bizaveke edebî jî derketiye meydanê. Lewra di encama lêkolînên me de derket meydanê ku kurên Şêx Hesenê Nûranî Şêx Mihemed Canê Aqtepî (k.d. 1909) û Şêx Ebdurehamanê Aqtepî jî bi temaya xwarinê helbest nivîsîne. Bêguman tiştekî gelekî balkêş e ku di heman maweyê de Şêx Muhyedîn li Hênelê, Şêx Mihemed Can û Şêx Ebdurehamanê jî li Aqtepeyê di vê mijarê de helbest nivîsîne. Dema mirov têkiliyên di navbera her du şaxan de li ber çavan bigire ku me behsa wê kiribû, dê derkeve meydanê ku ev ne tewarud, yan rasthatinek e, berevajiyê wê ev helwesta cihgirtina di heman bizava edebî de ye.

ku eslê xwe Kurd e di vê dîwana xwe de bi hemû teşeyêne nezmê, helbestên bi xwarinê re têkildar nivîsîne. Xaleke balkêş e ku di dîwana wî de bi Kurdiya Lorî jî helbestek cih dire. Di destpêka helbestê de bi şêweya “We lehû fi'l-Kurdiyyat we'l-Lûriyat” sernavek heye. Di vê sernavê de hatiye ifadekirin ku ev helbesta wî bi zimanê Kurdi û Lorî hatiye nivîsin. Ebû Îshaq di vê helbesta xwe de ku ji 22 beytan pêk tê bi tevahî behsa xwarinan kiriye. Ev helbesta Ebû Îshaq hem bi awayekî giştî ji bo tarîxa edebiyata Kurdi, hem jî bi taybetî di tarîxa helbestên bi temaya xwarinê de gelekî girîng e. Di serî de divê ev li ber çavan bê girtin ku helbestvanê ku di edebiyata Farisi de helbesta bi temaya xwarinê damezirandiye ku Ebû Îshaq e, kesekî Kurd e û vî kesî di bi heman temayê helbesteke Kurdi jî nivîsiye. Ev jî nîşan dide ku helbestên bi temaya xwarinê di zimanê Kurdi de bi qasî yên Farisi kevn in. Loma bi awayekî aşkera derdikeve meydanê ku Ebû Îshaqê Şîrazi di tarîxa edebiyata Kurdi de yekemin kes e ku bi temaya xwarinê helbest nivîsiye û di edebiyata Kurdi de nivîsîna bi vê temayê vedigere heta bi sedsala XVem.

- 8 Bo nimûne di *Nehcu'l-Enama* Mela Xelîlê Sêrtî de beşa bi sernavê “Mebhesu Adabi'l-Ekl”, ji bo şêwaz û adabêx xwarinê hatiye terxankirin. Herweha di *Rewdu'n-Ne'îma* Şêx Evdirehmanê Aqtepî de beşeke serbixwe ya ku bi sernavê “Der Sifetê nan û we çîzi kî be nan mîxford” (Ravekirina Nan û Tiştên ku bi nan Dixwar) ji bo xwarina Cenabê Pêxember hatiye terxankirin.

Di çarçoveya agahiyêن li ber destan de, di vê mijarê de Şêx Mihemed Can li pêşîya Şêx Ebdurehman e. Lewra ji Şêx Mihemed Can helbestek, lê ji Şêx Ebdurehman tenê beytek gihîştiye me. Hem ji ber ku têkiliyeke xurt a helbesta Şêx Mihemed Can bi mijarê re heye, hem jî ji ber ku ev helbesta wî têkiliya di navbera şaxên Hêne û Aqtepeyê dupat dike, em dixwazin li jêrê cih bidin metna vê helbesta wî (Hesbî, r.111-113)⁹:

Ey Musulmanan bibêjim ez kelam
 Çê bitin da bo we te'sîr û eser
 Dê beyan kim lezzeta cumle te'am
 Derkevit ez qelbê we cumle keder

Ah ez destê birinca nazenîn
 Derkevit rahet mîzacê akilîn
 Goştê pez bo wê bikin ger hemnişîn
 Her ew e nav cumle xwarin mu'teber

Lê tu nakî behsê tirşa bamiya
 Têxî nav çend parça goştê hindîya
 Laîq e ew bête sufra waliya
 Şêxê cumle tirşika sahib huner

Ez ci bêjim wesfê qeymaxê delal
 Ger tu hunguv berdî ser wê ey heval
 'Eqlê insanan ew e tîne kemal
 Hûn bixwun hetta di çav re tête der

Sed selamê min li ser peqlawa bin
 Lê me'a'l-gullac û südlî pê re bin
 Mehlebî w xoşab(i) ew jî vê re bin
 Wernê ey yar û bira mednê mefer

Sed bela l' wan kutilkê tê de piyaz
 Bu wê ekla wan qe ez nadim cewaz
 Bulgura rijî meke ez kes niyaz
 Ne bixwe wan ne tu qet lê de nezer

9 Ev helbest di dawiya dîwana Şêx Hesib a destxet de cih digire û di sala 1943yan de ji aliyê Şêx Eskerî ve hatiye îstinsaxkirin.

Bo çi qet meftûneê nakî meqal
Bêguman sufran ew e tîne fesal
Vê ji dest xwe bermede ey bêmecal
Qenc e meftûne ku bulxur deynî ser

Berxekî qenc ger biheşşinî temam
Deynî dora wî hinek new'ê te'am
Bu wê (wî) vî idî qe naxwaze kelam
Kî bibîne dê li ser bêtin keser

Şorbenîsk tehqîq(i) şubhê qehwe ye
Lê digel qawurme lezzet zêde ye
Goştê karî pîrê cumle tuxme ye
Ez ji ekla wî bi daim ber cezer

...
Merheba ey şîşikê 'alî meqam
Lê digel nanê heqel ni'me't-te'am
Deynî ser wî bexdenûs pîvazê xam
Nadim ez ba mulkê Tacîk û Qeçer

Şorbexav û danê hêrê ser bi zêr
Rojê xelqa rûh ji wan ez bûme têr
Van û şorba şolika yekcar venêr
Laîq e bo xwarina kîlab û ker

Ehlen ey qeyxaneê gozileme
Bo birînê birçiyân ev melhem e
Ger hinek mastê miyan deynî cem e
Ew dibin derman ji bo êşa ciger

Tu bi ser çavê mi ra bê ey kebab
Goştê pez goştê mirîşka nû şebab
Kî bixwe nabîne der heşrê 'ezab
Xwarina wê xeyr(i) jê tê nayê şer

Mustensîxê vê helbestê Şêx Eskerî li kêleka beyta "Lê tu nakî behsê tirşa bamiya / Têxî nav çend parce goştê hindîya" de têbîniyek nivîsiye ku ev têbînî hebûna biza-veke bi ví rengî piştrast dike. Şêx Eskerî weha nivîsiye: "Ev beyta a Şêx Ebdurehmanê

birayê mezinê Şêx Mihemed Can e. Quddise Sirruhuma.” (Hesbî, h.c.)¹⁰ Vê kêliyê em nizanin ka gelo Şêx Ebdurehmanê Aqtepî derheqê xwarinê de ji bili vê beytê tiştekî dî nivisiye yan na. Lêbelê ev têbînî bi me dide zanîn ku li Aqtepeyê ji bili Şêx Mihemed Can, birayê wî yê mezin Şêx Ebdurehman jî bi mijara xwarinê re têkildar bûye. Ji ber ku Şêx Ebdurehman birayê mezin ê Şêx Mihemed Can e maqûltir e ku ku wî berî Şêx Mihemed Can ev beyt nivîsibe. Herweha li gorî ku Şêx Mihemed Can beyteke birayê xwe yê mezin xistiye nav helbesta xwe, pêwîst e ku Şêx Ebdurehman ev beyta xwe berî wî nivîsibe. Loma bi rehetî dikare bê gotin ku ne ihtiâmaleke dûr e ku ev beyt parçeyek ji helbesteke serbixwe ya Şêx Ebdurehman a derheqê xwarinê de be.

Mixabin ji helbesta jorîn Şêx Mihemed Canê Aqtepî tenê 13 bend gîhîstine roja me. Di vî warî de mustensîxê helbestê Şêx Eskerî di serê helbestê de têbîniyeke weha nivisiye: “*Ev qewl xayet mu’teber [e]. Hem jî hewes û me’rifeteke pur tê da heye ku apê minî Şêx Mihemed Can lawê Şêx Hesenê Nûraniyê Aqtepî gotiye. Heyf û yazux ku ne temam e.*” (Hesbî, h.c.). Di dawiyê de jî weha nivisiye: “*Ev temam nebû. Hew me peyda kir, yazux.*” (Hesbî, h.c.). Di çarçoveya van têbîniyên Şêx Eskerî de dikare bê gotin ku ji aliyê qewareyê ve helbesta Şêx Mihemed Can jî di binemaya xwe de menzûmeyeke serbixwe ye, lê bele tevahiya wê negîhîstiye me. Aşkera ye ku bendêne wê yên kêm jî ne hindik in. Lewra mijareke wekî xwarinê ku cureyên wê nayêñ jimartin, hebûna gelek bendêne dî dixwaze. Şêx Mihemed Can bixwe jî di benda yekem a helbestê de ev yek weha ifade kiriye: “Dê beyan kim lezzeta cumle te’am (Ez ê lezzeta hemû xwarinan vebêjîm.) Di her halî de ev helbesta Şêx Mihemed Can kêm jî be, dîsa ji bo tarîxa edebiyata Kurdî û îsbatkirina hizra hebûna vê bizava helbestnivisiya bi temaya xwarinê metnekî gelekî binirx e.

Eger em muqayeseyekê di navbera her du helbestan de bikin, ji aliyê teşeya nezmê ve menzûmeye Şêx Muhyedîn bi teşeya mesnewiyê ye, lê helbesta Şêx Mihemed Can bi teşeya murebbayê ye. Ji aliyê kêşê ve menzûmeye Şêx Muhyedîn ji behra muteqaribê bi qalibê “*Fe’ûlun fe’ûlun fe’ûlun fe’ûl*”, lêbelê helbesta Şêx Mihemed Can ji behra remelê bi qalibê “*Fa’îlatun, fa’îlatun fa’îlun*” hatiye hûnandin. Her çiqas ji aliyê teşeya nezmê û kêşê ve di navbera wan de cudahiye hebe jî, her du jî di heman mijarê de hatine nivîsin ku ya girîng jî ev e. Her weha dema em li hûrgiliyên mijarê, uslûb û bikaranîna peyvan jî dinêrin, têkiliya di navbera her du helbestan de zêtetir derdikeve meydanê ku li jêrê çend nimûneyên vê têkiliyê hatine pêşkêşkirin:

Di her du helbestan de jî formên “sed silav” û “merheba” hatine bikaranîn:

10 Ev helbest di dawiya dîwana Şêx Hesîb a destxet de cih digire ku di sala 1943yan de ji aliyê Şêx Eskerî ve hatiye îstinsaxkirin.

Şêx Muhyedîn:

Ji ber min hezar[an] selamek li wî

Ji min sed selam her bi roj û [bi] şeb

Hezar merheba mumbarê qeddiraz

Şêx Mihemed Can:

Sed selamê min li ser peqlawa bin

Merheba ey şîşikê 'alî meqam

Li gorî her du helbestvanan jî meftûne digel bulxurê tê xwarin:

Şêx Muhyedîn:

Çira behsê nakî ji meftûneê

Beyan ke hinek ne'tê mesnûneê

Di ber de hinde goştê xurt ê temîz

Digel bulxurê zêde xweş e lezîz

Şêx Mihemed Can:

Bo çi qet meftûneê nakî meqal

Bêguman sufran ew e tîne fesal

Vê ji dest xwe bermede ey bêmecal

Qenc e meftûne ku bulxur deynî ser

Li gorî her du helbestvanan jî şorbenîsk digel qeliyê xweş e:

Şêx Muhyedîn:

Çi reng şorbeya nîskê sahib kemal

Digel hinde qelyê xwuş e ey delal

Şêx Mihemed Can:

Şorbenîsk tehqîq(i) şubhê qehwe ye

Lê digel qawurme lezzet zêde ye

Li gorî her du helbestvanan jî şorbeya şolika divê neyê xwarin:

Şêx Muhyedîn:

Veşêr şorbeya şolikan bê xeber
Heta sax î Şêx Muhyedîn meke lê nezer

Şêx Mihemed Can:

Şorbexav û danê hêrê ser bi zêr
Rojê xelqa rûh ji wan ez bûme têr
Van û şorba şolika yekcar venêr
Laîq e bo xwarina kîlab û ker

Her du helbestvanan jî xîtabeke xweş li şîraniyan kirine û bi taybetî ifadeya “sûdlî yû mehlebî” bi heman şêweyê bi kar anîne:

Şêx Muhyedîn:

Hezar merheba sûdlî yû mehlebî
Şeb û roj selamê di min li we bî

Şêx Mihemed Can:

Sed selamê min li ser peqlawa bin
Lê meâ'l-gullac û sûdlî pê re bin
Mehlebî w xoşab(i) ew jî vê re bin
Wernê ey yar û bira mednê mefer

Her çiqas ne bi heman perspektîf jî be, her du helbestvanan jî behsa xwarina bamiyan kirine ku ev xal derheqê têkiliya di navbera her du helbestvanan de fikreke bihêz dide mirov:

Şêx Muhyedîn:

Îlahî meke qismetê min tu car
Evan bamiyeê mirarê mirar

Welêkîn çekim Şeyx(i) Nûrî divê
Newêrim bibêjim qeda lê kevê

Şêx Mihemed Can:

Lê tu nakî behsê tirşa bamiya
Têxî nav çend parça goştê hindiya

Laîq e ew bête sufra waliya
Şêx cumle tîrşika sahib huner

Çawa ku tê dîtin, ji her du beytên Şêx Muhyedîn tê fêmkirin ku ew bixwe qet ji bamiyan hes nake, lêbelê kesekî dî yê bi navê Şêx Nûrî ji bamiyan gelekî hes dike û ev di wê astê de ye ku Şêx Muhyedîn ji wî kesî newêre dev bavêje bamiyan. Ji beyta Şêx Mihemed Can jî tê fêmkirin ku ew ji bamiyan gelekî hes dike. Çawa ku li jorê hat gotin ku li gorî ifadeya Şêx Eskerî ev beyta Şêx Mihemed Can di binemaya xwe de ya Şêx Ebdurehmanê Aqteqî bû. Bi qeneeta me dibe ku ev beyt berî Şêx Ebdurehman ji aliyê bavê wî Şêx Hesenê Nûranî ve hatibe gotin. Bi rastî jî tiştekî ne dûr e ku Şêx Ebdurehman beyteke bavê xwe bi kar anîbe. Eger em vê beytê ya Şêx Hesenê Nûranî qebûl bikin, wê demê dê derkeve holê ku mebesta Şêx Muhyedîn bi Şêx Nûrî Şêx Hesenê Nûranî ye. Bi rastî jî ji ber pêdiviyêne wezna ‘erûzê ne dûr e ku di helbestê de bi şêweya “Şêx Nûrî” behsa Şêx Hesenê Nûranî hatibe kirin.

Di encamê de tê dîtin ku li Aqtepeyê Şêx Ebdurehman û Şêx Mihemed Can û li Hênen jî Şêx Muhyedîn sê helbestvan in ku bi temaya xwarinê helbest nivîsîne û bi vî awayî di tarîxa edebiyata Kurdî de bûne nûnerê bizaveke nû. Divê neyê jibirkirin ku di vê derdorê de derketina nimûne û helbestvanen nû yêni bi xwarinê re têkildar her dem pêkan e.

Li vir ji bo ku mijar baştir zelal bibe divê li ser bersiva pirsa “Gelo sedem û faktorên ku di derketina vê bizavê de diyarker in ci ne?” hinekî bê rawestan. Bêguman her bizavek bivînevê bi rewşa serdema xwe ve girêdayî derdikeve meydanê. Dema em bi vî çavî li serdema Şêx Muhyedîn û Şêx Mihemed Can dinêrin, em dibînin ku di sahaya Osmaniyan de berhemên derheqê xwarinê de cara pêşî di heman serdemê de li Stenbolê hatine çapkiran. Ji van berheman du heb jê gelekî girîng in: *Melceii't-Tabbâhîna* Mehmet Kâmil û *Dîwanî Et'imeya* Ebû İshaq Hellacê Şirazî. *Melceii't-Tabbâhîn* yekem berhem e ku di serdema Osmaniyan de derheqê xwarinê de hatiye nivîsin û di navbera salên 1844-1888an de neh caran hatiye çapkiran (Güldemir 2010, r.8). *Dîwanî Et'ime* jî di sala 1302/1884/1885an de hatiye çapkiran.

Aşkera ye ku van her du pirtûkan di serdema xwe de sansasyoneke mezin çê kirine ku ji çapên zêde yêni *Melceii't-Tabbâhîn* ev yek baş tê fêmkirin. Bêguman ne pêkan e ku du rewşenbîrên wekî Şêx Muhyedîn û Şêx Mihemed Can ku bi edebiyat û çandê re têkildar in ji van berheman ne haydar bin û ew nexwendibin. Loma li gorî qeneeta me bi rehetî dikare bê gotin ku ev her du helbestvan di bin bandora vê bizava rojane ya serdema xwe de mane û wan jî ev terz di Kurdî de bi cih kirine.

Ji bilî vê em dibînin ku di serdema piştî bizava helbestnivîsiya bi temaya xwarinê de jî ku beramberi sedsala XXem tê, di edebiyata Kurdî ya klasîk de nûneren

helbestnivîsîna bi temaya xwarinê derketine meydanê. Bo nimûne Mela Ehmedê Nalbend (k. d. 1963), Mela Ehmedê Zinarexî û Abdulkadir Bingöl di helbestên xwe de li ser cureyên ciyawaz ên xwarinan rawestiyane. Seyîd Eliyê Findikî (k. d. 1968) û Dilbirînê Botî jî helbestên xwe ji bo cureyek tenê terxan kirine (Nalbend 1998, r.512-513, 521-522; Findikî 2011, r.291; Bingöl 2007, r.85-87; Botî 2007, r.89). Bêguman eger lêkolîn bêñ kirin, çi di edebiyata gelêrî de be, çi di ya klasîk de be, dê nimûneyên mijara xwarinê bi şêweyên curbicur bêñ dîtin û ji niha şûn de derketina gelek nimûneyên dî guncaw e. Lêbelê di çarçoveya van nimûneyan tenê de jî be dikare bê gotin ku di vê serdemê de li gorî serdemên berî xwe jimara helbestên rasterast bi temaya xwarinê re têkildar zêde bûye û di vî warî de bi şêweyên curbicur helbest hatine nivîsin.

Dema mirov li van helbestan dinêre tê dîtin ku yan derheqê cureyekî tenê de ne, yan jî jimara xwarinênu ku behsa wan tê kirin ne di pileyeke gelekî bilind de ne. Loma jî yek ji van helbestan ji aliyê qewareyê ve nagihîje simatiyeya Şêx Muhyedîn a derheqê xwarinê de ku tê de ji 130î zêdetir xwarin cih digirin. Ev jî dide nîşandan ku Şêx Muhyedîn di vî warî de bê hemta ye û heta niha kesek ji wî derbas nebûye.

Dikare bê gotin ku ji aliyê mijar û naverokê ve di edebiyata Kurdî ya klasîk de mijarêni bi evîn, dîn û tesewifê ve girêdayî mijarêni herî zêde zal û serdest in. Eger mijarêni evînî jî wekî parçeyek ji tesewifê bêñ qebûlkirin ku di encamê de termînolojiya evînê jî wateyeke tesewifî bi dest dixe, wê demê ev jimar dê dakeve duduyan. Loma her çiqas di mijarêni ladînî/beşerî yêñ wekî ferheng û tarîxê de hinek berhem hatine dayîn jî, rêjeya wê li gorî yêñ dînî û tesewifî gelekî kêm e. Di rewşike weha de Şêx Muhyedîn ne di çarçoveya serdema piştî mîrektiyan tenê de, di çarçoveya serdema mîrektiyan de jî ji girîngtirîn nûnerên edebiyata Kurdî ya ladînî/beşerî divê bê hesibandin.

Bêguman dema paşxana Şêx Muhyedîn ya medrese û tekyayê li ber çavan bê girtin ku ew bixwe kurê damezîrînerekî şaxeke tesewifî ye, nivîsîna wî ya di mijareke beşerî de zêdetir balê dikişîne ser xwe. Lêbelê divê neyê jibîrkirin ku di mijarêni ladînî de jî be, di serdema klasîk de cihê derketina berhemên edebî dîsa medrese û tekyayêni tesewifî bûn. Lewra ew der di heman demê de cihêñ huner, edebiyat, siyaset û rewşenbîriya serdema xwe bûn.

Berhema Şêx Muhyedîn, ne di çarçoveya edebiyata Kurdî ya klasîk tenê de, di warê çanda Kurdan a xwarinê de jî di erkê berhema yekem de ye. Çawa ku ji aliyê Cemşid Bender ve jî hatiye gotin, herçiqas heta niha berhema wî ya bi navê *Kürt Mutfak Kültürü ve Kürt Yemeekleri* (Bender 2003) wekî berhema yekem a ku derheqê xwarinêni Kurdan de hatiye weşandin tê qebûlkirin jî, bi awayekî giştî berhema yekem a ku di sahaya xwarinêni Kurdan de hatiye nivîsin menzûmeya Şêx Muhyedîn e.

Lewra di navbera nivîsîna her du berheman de nêzî sed salî ferq heye. Ev jî girîngiya berhema Şêx Muhyedîn zêdetir dike.

8. 3. Simatiyeya Şêx Muhyedîn

Vê kêliyê tenê nusxeyeke destxet a simatiyeya Şêx Muhyedîn li ber destan heye. Ev nusxe ne ya nivîskarê berhemê Şêx Muhyedîn e. Nusxeya ku beşek ji keşkûlekê ye, di nav pirtûkên malbata Aqtepiyan de hatiye parastin. Loma bi ihtimaleke mezin ev nusxe ji aliyê endamekî malbata Aqtepiyan ve hatiye istinsaxkirin. Li gorî qeneetê ev kes dê Şêx Evdirrehmanê Aqtepî, yan jî Şêx Mihemed Canê Aqtepî be. Loma ev nusxe wekî nusxeya Aqtepeyê dikare bê binavkirin. Orjînalâ vê nusxeyê niha di pirtûkxaneya taybet a Mela Zeynelabidîn Amidî de tê parastin (Hêni 2015, r16-17). Simatiyeya Şêx Muhyedîn li ber vê nusxeyê du caran jî hatiye çapkiran. Cara yekem ji aliyê Zeynelabidîn Amidî ve di dawiya Dîwana Şêx Ebdurehmanê Aqtepî de bi alfabeşa Erebî (Weş. Diyarbakır Söz, Diyarbekir 1997; cara duyem jî ji aliye Mela Birhanê Tarînî ve bi alfabeşa latînî hatiye çapkiran (Weş. Peywend, Stenbol 2015).

Taybetiyê ruxsarî yên simatiyeya Şêx Muhyedîn weha dikarin bêr rêzkiran: Menzûme li ser esasê beytan û bi terzê mesnewîyê hatiye nivîsîn. Di menzûmeyê de bi giştî 186 beyt cih digirin. Hemû beytên wê di nav xwe de hemserwa ne. Şemaya serwaya wê bi şêweya aa, bb, cc... ye. Menzûme bi kêşa erûzê ji behra muteqaribê li ser qalibê “fe’ûlun fe’ûlun fe’ûlun fe’ûl” hatiye nivîsîn.

Simatiyeya Şêx Muhyedîn, bi Kurdiya Kurmancî hatiye nivîsîn. Wekî ku di hemû berhemên edebiyata klasîk de diyardeyeke jîneger e, metnê vê menzûmeyê jî para xwe ji bandora zimanê serdest girtiye. Di vê berhemê de li gorî giraniyê bi rêzê bandora sê zimanân çê bûye: Tirkî, Erebî û Farisi.

Di berhemê de zimanê Tirkî bi awayekî berbiçav ji aliyê nivîskar ve hatiye bikaranîn. Zimanê Tirkî bi giştî bi du şêweyan rengê xwe daye berhemê. Hebûna beytên Tirkî û bikaranîna navên Tirkî ji bo xwarinan. Di berhemê de neh beyt bi tevahî bi Tirkî hatine nivîsîn. Bêguman di nav 186 beytan de rêjeya neh beytan hindik e, lêbelê li cihê ku ne bi Erebî û ne bi Farisi yek beyt tenê jî nehatibe nivîsîn, hebûna neh beytên Tirkî di xwe de wateyekê dihewîne ku li jêrê dê li ser bê rawestan. Li jêrê wekî nimûne ji berhemê çend beytên Tirkî cih digirin:

Sûboregî îkî qisimdir bîrî
Penîrle we qîme ile digerî

Yemek qitlixinden bizirkan aşî
Yenîr pîlaw ile bîlin bu işî

Nişa helwasî de yiylûr îmîş
Welê sewmiyem ben ecaîb bîr iş

Dîsa di menzûmeyê de navê 25 xwarinan bi Tirkî ne. Dema 133 xwarinênu ku di menzûmeyê de derbas dibin li ber çavan bêñ girtin, dê bê dîtin ku ev rêje ne hindik e. Lewra ev jimar teqrîbî beramberî pêncyeke tevahiya xwarinanênu di berhemê de tê ku ev jî rîjeyeke bilind e. Yanî di berhemê de bandoreke mezin a Tirkî li ser zimanê Şêx Muhyedîn heye. Li gorî qeneeta me ev bandor di çarçoveya sê sedeman de dikare bê ravekirin:

1. Şêx Muhyedîn helbestvanê Kurdistana Osmaniyan e. Bi awayekî siruştî li ser Kurdên Osmanî rengê Tirkî xwe nîşan dide.

2. Şêx Muhyedîn piştî mîrektiyan di dawiya sedsala XIXem de jiyaye. Di wê serdemê de di çarçoveya politikaya Îttihad û Tereqqiyê de li Kurdistanê gelek xwendingehênu ku bi Tirkî perwerde didan vebûne. Loma jî helbestvanênu piştî mîrektiyan li gorî yên serdema mîrektiyan zêdetir di bin bandora Tirkî de mane ku Şêx Muhyedîn jî yek ji wan e.

3. Şêx Muhyedîn xelkê Hênen ye û Hênen jî li ser Diyarbekirê ye. Di serdema Osmaniyan de bajarênu wekî Diyarbekir û Hênen ku ne di bin desthilatdariya mîrektiyanen Kurdish de bûn, ketibûn bin bandora zimanê tirkî. Bi taybetî bajarê Diyarbekirê di serdemênu Artukî, Akkoyunî û Osmaniyan de demeke dirêj di bin desthilatdariya tirkan de maye. Loma jî çi di warê xwarinê de, çi di warênu dî de, li wê derê bi awayekî siruştî ziman û kultura Tirkî bûye serdest. Ne pêkan e ku helbestvan û rewşenbirekî wekî Şêx Muhyedîn ji vê kultura serdest a Osmaniyan bêpar mabe. Ji xwe ji van beytên jérîn ên Şêx Muhyedîn tê fêmkirin ku Hênen be, yan Diyarbekir be ferq nake, ew li bajarekî jiyaye û loma jî behsa xwarinênu bajarî dike:

Ew e xwarina paşan, mîr û temam
Di bajêr de meşhûrê ehlê kîram

Çunîn kuvte **muxtarê çarşû** bizan
Eger we nebe ez bibêjim ‘eyan

Di bajêr de meşhûrê xas û ‘ewam
Ji ber wê ye cumle merîd in dewam

Di berhemê de bandora Erebî ne di asta bandora Tirkî de ye. Erebî tenê di çarçoveya bikaranîna hin peyvan de rengê xwe daye berhemê. Ev jî ji bo serdema klasik

tiştekî siruştî ye û wê demê piraniya wan peyvan ji aliyê xwendevanên berhemê ve dihatin fêmkirin. Ji van peyvan çend hebên ku ji nifşen iroyîn re biyanî ne ev in (li gorî rêza alfabeyê): “Akil, bê xefa, bab, bedî, be’id, besel, besel, bi’d-delîl, bîla şubhe, cinsi'l-lehm, cunûn, cuses sexîr, eriz, et’ime, ‘edîd, ‘eynê heram, festemi, kesîr, lewiz, lezaiz, merîd, meşwî, seqîl, simat, şahu’t-te’am, tecerub ke, wa hesreta, we illa, zuxel.” Li jêrê wekî nimûne du beytên ku hin peyvên Erebî di wan der derbas dibin cih digirin:

Fesûlî be têzetî tête **ekil**
Heye wî [di] **babê lezaiz fedil**

Tu sukre kebabî qe nakî **‘edîd**
Ji **new’ê lezaiz** me kir wê **be’id**

Li ser zimanê berhemê herî kêm bandora Farisî heye. Lewra di berhemê de rengê Farisî ji bikaranîna çend peyv û formên Farisî ne wêdetir e. Wekî “în mekan (ev mekan), çunîn (weha), nameş (navê wî), bedekil (bêçej), merdum (zilam), qeddiraz (bejndirêj) û namê dîger (navê dî).” Çawa ku tê dîtin hem jîmara peyv û formên Farisî kêm e, hem jî ji ber ku piraniya wan di Kurdiya Kurmancî, yan jî Zazakî de bi awayekî têbikaranîn, iro jî bi rehetî dikarin bêfêmkirin.

8. 3. 1. Şêwaza Vegotinê

Ji ber ku berhem derheqê mijareke taybet de hatiye nivîsîn, di vegotinê de ji şêwazeke taybet hatiye bikaranîn. Şêwazên edebî yên ku di berhemê de cih digirin curbicur in û ji taybetiyên mijarê neşet dikin. Xalêن sereke yên ku di şêwaza vegotina berhemê de balê dikişînin zimanekî bicoş, mîzah, tekrîr, hizra sabit, nifir û heqaret, teşbîhên giran, zimanê bêperde û teşxîs e ku li jêrê dê li ser van şêwazan bê rawestan.

Nivîskar dema behsa çej û lezzeta hin xwarinan kiriye şêwazeke bicoş bi kar anîye. Ev coş bi peyv û ifadeyên wekî “selamun ‘eleykum”, “hezar[an] selam”, “Ji min sed selam her bi roj û [bi] şeb”, “heme dem li we bin selav”, “eleykum selam”, “hezar merheba”, “bi ser çehvê min ra hatî merheba” “bi xêr hatî”, “were zû”, hatiye ziman. Xuya ye ku çej û lezzeta wan xwarinan li cem nivîskar di asta herî bilind de ye:

Hezar merheba tirşıya lehanan
Were zû bizan sufre hate meyan

Bi xêr hatî ey tûtikê xurmenav
Heme dem li we bin ji Heqî selav

Mîzah şêwazeke sereke ye ku di vegotina simatiyeyan de sûd jê tê wergirtin. Nivîskarê me jî di simatiyeya xwe de carinan serî li şêwaza mîzahê daye. Bêguman dema ku mijar mijareke wekî xwarinê be ku aliyê wê yê kîfî jî heye, ne pêkan e ku serî li şêwaza mîzahê neyê dayîn. Di van beytên jêrîn de ev rîbaz tê dîtin:

Eger nakî bawer ku patile xweş
Bipirse ji şiblî efendiyê les

Îlahî meke qismetê min tu car
Evan bamiyeê mirarê mirar

Helawa ji arvanê bulxûr îmam
Ji min dûr bê hetta bi Roja Qiyam

Nivîskar, di berhemê de bi giştî girîngî daye aheng û melodiyê. Di vê çarçoveyê de di hinek beytan de serî li hunera tekrîrê jî daye. Di tekrîrê de bi mebesta balkışandinê peyvek yan îfadeyek tê dubarekirin. Di van beytên jêrîn de ev huner dikare bê dîtin:

Bi bîber û buxdenûs û ey ‘ezîz
Di nêva te’aman lezîz e lezîz

Hesenkêv jî pak e welêkîn neçar
Wuha reng sûborek kibarê kibar

...

Hevîr e hevîr e hevîr e hevîr
Tu guh dêre vê bendê min ey emîr

Nivîskar di hin mijaran de xwediye hizreke sabit e. Ji xwarinan bi taybetî derheqê rexneya kundiran de hizra wî ya sabit di asteke gelekî dijwar de ye. Tenê di cihekî de 10 beyt ji bo rexneya kundiran terxan kiriye. Emê jê çar beytan pêşkêş bikin:

Qebaqden nîçûn soylemez kelam
Peyxember yemaxî ‘elehi’s-selam

Bizan ev rîwayet betal e Hemed

Ne rawî ne naqil tunîne sened

We illa nema şeyekî el-eman

Nebî jî bixwu ji [ewan] kundiran

Bes e Sa'î kinek heye te j' kund'ran

Ji ber wî bi xerez hatî van kund'ran

Nivîskar carinan dema ku ji xwarinekî hes nekiriye serî li uslûba nifir û heqaretê jî daye. Wekî;

Îlahî helîne ji beyna 'îbad

Bibe kor bi kor ê ku anî îcad

Tu behsê qe nakî ji qatqatê qenc

Qeda lê keve 'eynê emrad û renc

Xusûsa ku dimsê lêkin el-eman

Dibe xwarina kûçikan bê guman

Li min bû bela tırşıya kundiran

Te navêm here tu tewîla keran

Nivîskar carinan serî li teşbihên giran daye û xwarinên ku ji wan hes nekiriye, bi tiştên kirêt şibandine:

Ji ku derketî ey şî'ira şepal

Wekî kurmê pişta keran ey heval

Rîçala ji balcan bi dimsa xebîs

Wekî şorbeya têkevê mişkê pîs

We kuvtê ji kuncî qeda lê keve

Wekî rêxa taze ku kurm têkeve

Nivîskar, di derbirîna hizra xwe ya neyînî ya derheqê hin xwarinan de ji mîzahê jî wêdetir serî li rîbaza zimanê bêperde daye. Bo nimûne:

Qeda bê li dolmê pîvaza gelek
Wekî hêlikê kûçikan e felek

Nivîskar, bi riya silavdayîna li ser xwarinênu ku ji wan hes kiriye an nekiriye serî li hunera teşxîsê daye. Divê bê gotin ku di van ciyan de şêwaza zimanekî bicos jî bikaraniye. Bo nimûne:

Hezar merheba tirşıya lehanan
Were zû bizan sufre hate meyan

Bi xêr hatî ey tûtikê xurmenav
Heme dem li we bin ji Heqî selav

...
Di rojek ewan kundirê bedekil
Li halê xwu giryan me nîne fedil

8. 3. 2. Avahî û Tertîb

Simatiyeya Şêx Muhyedîn, ji aliyê avahî û tertîbê ve ji du beşan pêk tê: Beşa destpêkê û beşa mijara sereke. Di dawiya menzûmeyê de ber'eksê kevneşopiyê, beşa xatîmeyê cih negirtiye ku ev jî ji aliyê avahiya menzûmeyê ve wekî kîmasiyekê dikare bê dîtin.

Beşa destpêkê ji sê beytên pêşî yên menzûmeyê pêk tê. Di beyta yekem de nivîskar mexlesa xwe anije ziman û xwe wekî xwedîyê mîzaceke xerîb daye naskirin:

Feke Sa'iyê zû mîzaca xerîb
Herçî new'ê [xwarinê ye] pur 'ecîb

Bêguman ew mîzaca wî ya xerîb e ku berê wî daye mijareke wekî xwarinê ku di wê serdemê de nivîsîna di vî warî de tiştekî nadir e û lewra jî xerîb e.

Nivîskar di her du beytên peyrew de jî mijara menzûmeya xwe û rîbaza xwe ya di vegotinê de aniyê zimên:

Bi cins û bi new' û bi feslê ewan
Bi ci tête xwarin bikêşne beyan

Heçî ku lezîz in û xeyrî lezîz
Beyan ke û îlhamê bigre temîz

Di van beytan de nivîskar rêbaza xwe ya ku di menzûmeyê de dê bişopîne di sê xalan de aşkera kiriye: 1. Cins, new' û feslên xwarinê, 2. Tiştên ku bi xwarinan re têx xwarin, 3. Lezzet û tama wan. Bêguman di destpêka berhemê de diyarkirina rêbâzê ji aliyê zanistî ve xaleke erênî û girîng e.

Nivîskar piştî beşa destpêkê dest bi beşa mijara sereke kiriye û heta bi dawiya menzûmeyê ev mijar domandiye. Ev beş ji 183 beytan pêk tê.

8. 3. 3. Naverok

Mijara simatiyeya Şêx Muhyedînê Hêni, bi awayekî giştî danasîna kom û cureyên xwarinan e. Nivîskar di berhemê de cih daye nav û taybetiyên gelek xwarinan û derheqê gelekan ji wan de nêrînên xwe yên erênî û nerênî ifade kirine.

Emê jî di çarçoveya rêbaza ku di destpêkê de ji aliyê nivîskar bixwe ve hatiye diyarkirin çend tiştan bibêjin. Bi vî awayî hem rêbaza wî ya ku şopandiye baştir dê bê fêmkirin, hem dê asta serkeftina wî ya di vê rêbâzê de bê pîvan, hem jî na-veroka berhemê dê li ber çavan bê raxistin. Li jêrê dê ‘cins, new’ û feslên xwarinê’ bi sernavê ‘senifandina xwarinan’, ‘tiştên ku bi xwarinan re têx xwarin’ bi sernavê ‘formulasyonên xwarinañ’ û ‘lezzet û tama wan’ jî bi sernavê ‘çeja xwarinan’ bêñ ifadekirin.

Bi ifadeyên nivîskar wî berhema xwe li gorî cins, new’ û feslên xwarinan amade kiriye ku ev jî rêbaza wî ya di senifandina mijarê de ifade dike. Nivîskar ji peyva “fesl”ê bi awayekî sistematik dabeşkirina berhemê bi bal beşan ve, ji peyva “cins”ê komên xwarinan (wekî koma şorbeyan û hwd.) û ji peyva “new”ê jî cureyên xwarinêñ ku dikevin bin van koman de (wekî şorbeya nîskê û şorbeya şolikan û hwd.) qesd kiriye.

Bi rastî jî nivîskar ev rêbaz çawa ku gotiye şopandiye. Wî di dabeşkirina mijarê de bi awayekî giştî li gorî sistemekê hereket kiriye, ne bi awayekî tevlihev û belawela mijar pêşkêş kiriye. Lêbelê eger wekî kêmasiyekê bê dîtin, wî carinan hinek xwarin ne di beşa xwe de bi cih kirine. Wisa xuya ye ku nivîskar carinan piştî ku beş xilas kiriye, navêñ hin xwarinan hatiye bîra wî û navê wan xwarinan li wir zêde kiriye û piştre jî cihê wê neguherandîye. Bo nimûne ev rewş di van her du beytên jêrin de baş tê dîtin. Lewra li pey derbirîna kutabûna beşa xamûran ji nû ve behsa cureyeke dî ya xamûran hatiye kîrin ku ew jî şamboregî ye:

Xetim oldî xamûr îşî kahîde
Çorek de yiylmez [se] Sa'î n'ide

Înan ke ku şamboregî jî nevis
Di bezma ku ew tê de bin kin celîs

Di berhemê de fesl/beşen ku sînorên wan aşkera ne şeş heb in: Beşa xamûran, beşa zerzewatan, beşa goşt, beşa pincaran, beşa rîçalan û beşa tirşîyan. Nivîskar bi rèzê cih daye van beşan û wekî rîbaz ji bo wan sernav bi kar neanîne, lêbelê di destpêka wan de bi beyteke destpêkê koma xwarinê ya ku di wê beşê de dê behsa wê bê kirin daye nasandin. Dikare bê gotin ku ev beyt erka sernavan tînin cih. Ji bo ku ev rîbaza wî jî bê dîtin, li jêrê em cih didin van şeş beytên destpêkê:

Beşa Xamûran:

Herçi cinsê xamûr îşî ke beyan
Ji rê ve li ser min nebit da nihan

Beşa Zerzewatan:

Safa geldiniz zerzevatlar beta
Sizin akiliz çekmeye hiç cefa

Beşa Goşt:

Were mebhesa goştê şahu't-te'am
Heçî sufreya bê wê 'eynê heram

Beşa Pincaran:

Ji pincar xweş e serbimastikeya
Qeda bê li pirparê ey dilruba

Beşa Rîçalan:

Rîçala ji uşnan [e] şahu'r-rîçal
Rîçala sêvan jî xwuş e bê mecal

Beşa Tirşîyan:

Selamun 'eleykum eya tirşîya
Ji îsot kerem ke tu vê sêniya

Çawa ku li jorê jî hat gotin, komên xwarinê yên ku di berhemê de cih girtine ne ev tenê ne. Dema mirov ji vî aliyî ve li naveroka berhemê dinêre tê dîtin ku di

berhemê de behsa gelek komên dî jî hatiye kirin. Her çiqas senifandinên cihê jî pêkan bin, em dê xwarinên ku di berhemê de cih digirin li ser 20 koman dabeş bikin ku ew jî ev in: Nan, şorbe, borek, dolme, pincar û giya, zerzewat, goşt, kebab, kuvte, seqetat, dan, savar, xoşav, şeranî, helaw, rîçal, tırşî, fêkî, pêxwarin û vexwarin. Li jêrê listeya van koman û cureyên xwarinan ên ku dikevin bin wan cih digire:

1. Koma Nan

Nanê genim/nanê buxde

Taş ekmegî

Ekmek balixî

Hevrîsika Nanê Germ

2. Koma Şorbeyan

Şorbeya Nîskê

Şorbeya Şolikan

Qulaq Şorbesî

Mixil Torbesî

Ezme Şorbesî

Şî'ir

3. Koma Borekan

Patîle

Boreka Hesenkêfê

Sûboregî

Penîr borekî

Bûqçe boregî

Mafîş

Zerabet (Zerfet)

Qatqat

Zengil

Bûşkelen

Yûxeê irtebê

Borek

Fincan Boregî

Şamboregî

4. Koma Dolmeyan

Dolmê balîcanan

Dolmê xiyar

Dolmê pîvaza

Sarme

5. Koma Pincar û Giyayan

Serbimastik

Pirpar

Kereng

Gûriz

Sîrim

Yonca

Pincara sipî

Sarmeya pincara sipî

6. Koma Zerzewatan

Bilî baxleya

Musaqa

Guweç

Çertme

Beqle

Fesûlî

Kundir

Bamiye

Heywa aşî

Meftûna kengerê îspenaq

Boranî

Mesaq

Fincaşî

Kardû

Mûsilaşî

7. Koma Goşt

Qelî

Qelîsêl

Pasdîrme

Qîma meşwî

Tawûq gogsî

8. Koma Kebaban

Tebeq Kebabî

Lûle kebabî

Sukre kebabî

Qaşiq kebabî

Tencere kebabî

Musaqe

9. Koma Kuvteyan

Kuvteê navtijî

Kuvtê ji kuncî

Dawûdpâşa Kuvtesî

Kuvteê tîrş

Xatûnbûdî

10. Koma Seqetatan

Kellepaç

Mumbar

Kîpe

Kîbeê turunc

Kîbe qudûr

Eşkena goşt

Helîsa ji goşt

Zerşik

Yexnî

Qapulme (Qapilme)

11. Koma Xwarinê ji Dan

Keşke

Mehîr

Mastewa

12. Koma Xwarinê ji Savarê

Savar

Gebol (çavbelek)

13. Koma Xoşavan

Alma sawuqlıxi

Helawa erûnga

Xwoşaba erûnga

Xwoşaba ji încazê

Xwoşaba hêjîran

14. Koma Şêraniyan

a) Şêraniyên Xamûran

Peqlewa

Qalib

Sarox burmesî

Penîr peqlewasî

Qedaîf

Tûtikê xurmenav

Gulac

b) Şêraniyanêن Şîr

Sûdlî

Mehlebî

Qeraş

Almastî

c) Şêraniyanê Dimsê

Esîda sipî ya bi dimis

'Eqîda şikeftan

Serbidims

Vizik Çizik

d) Meşlûl

Meşlûlê hêjîran

15. Koma Helawan

Helawa ji hingiv

Helawa penîr

Nişa helwasî

Esîd	Penîrê Qerecdaxê
Helawa ji arvan	Mîxlî međem
16. Koma Rîçalan	Hêk
Rîçala uşnan	Dims
Rîçala sêvan	20. Koma Vexwarinan
Rîçala şufteliyan	Dewê sar
Rîçala buyokan	Navên Hin Alavên Xwarinê
Rîçala qarpûz	Balîcan
Rîçala qawûnan	Bîber
Rîçala balcanan	Birinca Qerecdaxê
17. Koma Tirşiyân	Edes tuxmî
Ísot	Hêk
Tirşiya Lehanan	Hingiv
Tirşiya Kundiran	Qerenfil
Tirşiya Balîcan	Qîme
18. Koma Fékiyan	Pûng
Zebeşê çem	Rûn
19. Koma Pêxwarinan	Şekir
Toraq	Tîrpê sipî
Zeytûn	

Rêbaza duyem a ku nivîskar di vegetina xwarinan de şopandiye, behskirina wan tiştan e ku bi hev re têñ xwarin. Nivîskar ev rêbaza xwe weha ifade kiriye: “Bi çi tête xwarin bikêşne beyan”. Ev yek ji aliye me ve dê wekî “formulasyona xwarinan” bê ifadekirin. Nivîskar di berhemê de li ser bersiva pirsa “çî bi çi tête xwarin” rawestiyaye û bi vî awayî zewqa xwe ya xwarinê aniye ziman. Dema mirov di tevahiya berhemê bi baldarî li van formulasyonan dinêre derdikeve meydanê ku nivîskar ev xal kiriye du beş: Formulasyonê di çêkirin û amadekirina xwarinê de û yên di menûya ser sifreyê de.

Nivîskar di van formulasyonê jêrîn de, bi şêweya ku di çêkirin û amadekirina xwarinê de, yan jî di nav xwarinê de be, bersiva “çî bi çi xweş e” daye. Ev rêbaz ji ber ku ji aliye kî ve alavên xwarinê, ji aliye kî ve şêweya çêkirina wê, ji aliye kî ve jî zewqa helbestvan nîşan dide girîng e.

Patîle digel rûnê teze, toraq û zehter.

Sarmeya pelên pincara spî ya di nav hêkan de hatî qelandin.

Dolmeê balicanan ên bi birinc, qîme, don û pîvazan hatî çêkirin.

Dolmê xiyaran bi qîme û birincê.

Sarmeya bi hêk, rûnê zêde, tirşî, qîme û birincê hatî çêkirin.

Zerabeta bi mast, rûn û sîr.

Kufteê navtijî ku bi pîvaz, qîme, birinc, hinar û gûzan hatî çêkirin.

Qapulmeya ku di nav bîrîca wê de bîber, qîme û behîv û di fesla biharê de jî berxê miyan hebe.

Tûtikê xurmenav ku di nav hevîrê wê de hêk û rûn hebe.

Yûxeê Irtebê ku di nav de hinarê tirş û pîvaz hebe.

Zengilê ku bi ava xûliyê hatî hilatin û hêk tê hebin.

Borekê ku digel rûn û pîvaz û qîmeya zêde hatî çêkirin.

Helisa ku digel hêk û rûn û sîrê hatî çêkirin.

Rîçala şufteliyan û ya buyokan ku bi şekir û qerenfilê yan jî bi dimsê hatî çêkirin.

Peqlewa digel badem û rûn û hingiv.

Wekî nimûne nivîskar li jêrê ji bo patîleyê wiha dibêje:

Tu behsê ji **patîleê** qenc bike

Çi reng tête xwarin zebanî veke

Digel rûnê teze û toraqa pak

Bi zehter welê qenc tenik be jî çak

Eger bête pehtin bi sêlê bixwu

We ger bi firinê ye esla mexwu

Eger nakî bawer ku **patîle** xweş

Bipirse ji şiblî efendiyê leş

Eger çend ji firnê dixwun daîma

Bi sêlê nizanin bipêjin Mela

Nivîskar di van formulasyonê jêrîn de jî, bi şêweya ku di menûya ser sifreyê de li kêleka hev bêñ xwarin bersiva “çî bi çi xweş e” daye. Ev rîbaz jî ji ber ku hem zewqa

nivîskar û tama devê wî nîşan dide, hem jî ji ber ku çanda wê serdemê ya xwarinê nîşan dide girîng e.

Eşkena goştê xurt ê ciwan û nanê germ ê genim.
Meftûne, goştê xurt û bulxur yan jî birinc
Bizirkan aşî û pîlaw (ji neyîniyê)
Toraq, rûnê taze yê biharan, nanê buxde û dewê sar
Hêkê taze, pîvaz û nergûz.
Penîrê Qerecdaxê, nanê genim û zebeşê çem.
Qelî û pîvaz.
Qelîsêl û yûxê ji nan.
Sîrima biav û bulxur.
Lûle kebabî, buxdenûs, bîber û pîvaz.
Kufteê navtijî û bîber.
'Eqîda şikeftan û rûnê taze yê biharan.

Wekî nimûne li jêrê formulasyona "meftûne, goştê xurt û bulxur yan jî birinc"ê hatiye dayîn ku ev di çanda Kurdan de menûyeke binirx tê qebûlkirin:

Çira behsê nakî ji **meftûneê**
Beyan ke hinek ne'tê mesnûneê

Di ber de hinde goştê xurt ê temîz
Digel **bulxurê** zêde xweş e lezîz

Eger ba **birinc** bit didit lezzetê
Didit merdumanê deîf quwwetê

Nivîskar her weha behsa tiştên ku bi hev re nayêñ xwarin jî kiriye. Bo nimûne;
Penîr peqlewasi bi şekir û hingiv re nayê xwarin
Penîr borekî bi germî xweş e, lêbelê eger bi hingiv û sar be nexweş e.
Qedaif bi gûz û penîr xweş e, lêbelê eger bi hingiv û bi dimsê be nexweş e.

Rêbaza sêyem a ku nivîskar di vegotina xwarinan de şopandiye, derbirîna çêj, tam û lezzeta xwarinan e. Nivîskar ev yek bi peyvîn wekî "nevîs, xweş, lezîz, keleş,

qûtê dilê min, zî huner (xwedî huner), benimdir benim, seza ye, el-eman” ifade kiriye. Her çiqas piraniya xwarinên ku wî behsa wan kiriye, li gorî çej û zewqa wî ne jî, lêbelê hin xwarin hene ku nivîskar bi taybetî bi ifadeyên çejê ew anîne ziman. Xwarinên bi vî rengî jî ev in (li gorî rêza alfabetê): Balîcanê siyah û diraz, bîlî baxleya, borek, bûşkelen, dolmê xiyar, dolmeeê balîcanan, ‘eqîda şikeftan, fincan boregî, qelî, mafîş, musaqa, patîle, qalib, Şamboregî, tütikê xurmenav. Li jêrê di vê babetê de nimûneya “fincan boregî” cih digire:

Kezalîke fincan boregî imam
Dixwazim di sufrê ewê ez mudam

Penîr(i) lê ke hêj xweş e bêguman
Seza ye ku bê sufreya hakiman

Nivîskar, xwarinên herî zêde xweş şibandine şah, wezîr û mîran. Di van beytêن jêrîn de “qalib” şibandiye şah, “musaqa” jî şibandiye wezîr:

Wuha reng e **qalib** ku şahu'l-hevîr
Digel hingiv û hêk û rûnê kesîr
--
Wezîr e di sufra emîran bizan
Musaqa ji wan jî leziz e çunan

Nivîskar di berhemê de behsa xwarinên ku ji lezzeta wan hes nekiriye jî kiriye û di vê mijarê de peyvîn wekî “tolaz, el-eman, bedekil, ‘eynê emrad (nexweşî bi xwe)” û bi taybetî ifadeya “qedâ lê kevê”, yan jî “qedâ be” gelekî bi kar anîye. Di vê çarçoveyê de xwarinên ku nivîskar ji wan hes nekiriye ev in: Bamiya, beqle, ekmek balixî, mafîşa virîk, rîçala kundiran, tîrsîya kundiran, qatqat. Bo nimûne:

Mafîş jî xwuş e lê bi rûnê şirîk
Qeda lê kevê ger bixwî wê virîk
...
Tu behsê ji **patîle**ê qenc bike
Çi reng tête xwarin zebanî veke

Digel rûnê teze û toraqa pak
Bi zehter welê qenc tenik be jî çak

Eger bête pehtin bi sêlê bixwu
We ger bi firinê ye esla mexwu

8. 3. 4. Çanda Xwecihî

Di simatiyeya Şêx Muhyedîn de behsa gelek xwarinên xwecihî yên Kurdan jî hatiye kirin. Dikare bê gotin ev xwarin vedigerin demên berê yên civaka Kurdan û ji wan deman jî gîhîstine heta roja me. Xwarinên wekî “boranî, gebol, gûriz, helîse, hevrîşika nanê germ, kardû, kereng, keşke, kuvteê navtijî, mehîr, meşlûlê hêjîran, qelîsêl, serbi-mastik, sîrim, zengil, zerabet (zerfet).” di vê çarçoveyê de dikarin bêñ nirxandin.

Hin xwarin jî bi taybetî bi herêma Diyarbekirê têkildar in. Dema nivîskar behsa zebeşê çem dike, em dizanin ku ew, zebeşê Diyarbekirê yê navdar e ku bi awayekî taybet li ber çemê Dîcleyê dihat gihadîn. Penîrê Qerecdaxê jî yek ji wan pêxwarinan e ku bi taybetî herêma Qerecdaxê ku nêzî Diyarbekirê ye nîşan dide:

Penîrê Qerecdaxê nanê genim
Digel **zebeşê çem** benimdir benim

Herweha nivîskar behsa xwarinên Kurdan ên jiyana gundewariyê jî dike ku ev jî parçeyekî girîng ê çanda Kurdan e. Qeliya ku koçer ji pezê xwe yê ku li zozanan qelew dîbin çêdîkin û pîvazên wan ji bo vê yekê nimûneyeke xweş e:

Xwuş e qel' yû pîvaza van koçeran
Digel **qelîsêlê** bi yûxê ji nan

Dîsa korelasyona toraqa bi rûn, nanê genim û dewê sar jî çandeke xwecihî ya jiyana gundewariyê nîşan dide.

Wuha reng e **toraq** li ser deyne rûn
Digel **nanê buxde** qe nadî cunûn

We tasek **dewê sar** jî deyne li ber
Bixwu û mekêşe tu esla keder

Bêguman ne tesaduf e ku Qedri Cemîl Paşa (k.d.1973) jî di çarçoveya çanda Kurdan de ji bavê xwe Ehmed Cemîl Paşa (k.d.1902) weha neqil dike: “*Heçî em Kurd in, em dew weha vedixwin.*” û dibêje ku dema bavê wî ev gotin digit hissiyatêñ

wî bilind dibûn û bi vî awayî hizrên neteweyî pê re çêbûn (Malmîsanij 2004, r.94). Naxwe eger di heman serdemê de yek ji burokratan, ê dî jî ji şexan du rewşenbîrên Kurdan bi taybetî behsa vexwarina dew kiribin, ji vê derdikeve meydanê ku vexwarina dew li herêma Diyarbekirê ku cihêkî geleki germ e, wekî meziyeteke neteweyî ya Kurdan dikare bê hesibandin.

9. ENCAM

Şêx Muhyedîn yek ji girîngtirin helbestvanê serdemâ piştî mîrektiyan e. Di medrese û tekyayê Xalidiyan de ku saziyên perwerdeyê yên serdemâ wî ne, perwerde bûye û di nav derdoreke edebî de cih girtiye. Nivîskar di berhemê xwe yên edebî de du mexles bi kar anîne: Sa'î û Heqî. Bi vî awayî di edebiyata Kurdî ya klasik de ketiye nav kategoriya helbestvanê dumexlesî.

Nivîskar di du şaxê edebiyata klasik de berhem dane: Helbestên klasik û edebiyata ladînî/beşerî. Bi qasî ku dîwançeyeke biçük bînin meydanê çend helbestên wî gihiştine roja me. Di van helbestan de li pey xeta Melayê Cizîrî performanseke girîng nîşan daye û serkeftî ye. Berhema wî ya bi temaya xwarinê ku dikeve cureya simatiyeyê bi awayekî giştî di sahaya xwarinê Kurdan de û bi awayekî taybet jî di edebiyata Kurdî ya klasik de yekem berhem e ku bi temaya xwarinê hatiye nivîsin. Herweha, di edebiyata Kurdî ya klasik de, pişt wî re jî berhemeke wekî wê nehatiye nivîsin. Divê ev ji bê ifadekirin ku di dawiya sedsala XIXem de li Hênenê Şêx Muhyedîn û li Aqtepeyê jî Şêx Ebdurehman û Şêx Mihemed Can bûne nûnerên bizava helbestnivisiya bi temaya xwarinê.

Simatiyeya Şêx Muhyedîn ji aliyê ziman ve ji ber rewşa serdem û herêma ku nivîskar tê de jiyaye, ji Erebî û Farişî zêdetir di bin bandora Tirkî de maye. Lewra di berhemê de digel hin navê xwarinan ên tirkî, hin beytên Tirkî jî hene. Di berhemê de şêwazên edebî yên ku ji mijarê neşet dikan hatine bikaranîn. Wekî zimanekî bicos, mîzah, tekrîr, hizra sabit, nifir û heqaret, teşbîhên giran, zimanê bêperde û teşxîsê.

Berhem bi qasî 20 kom û 130 cureyên xwarinê di xwe de dihewîne ku ev ji aliyê jimara xwarinan ve asteke ne kêm e. Nivîskarê berhemê ji ber ku xelkê herêma Diyarbekirê ye bi awayekî siruştî zêdetir behsa xwarinê wê herêmê kiriye. Loma berhem ji bo çanda xwarinê ya herêma Diyarbekirê çavkaniyeke girîng e. Di berhemê de hin xwarinê Kurdan ku îro navê wan hatine jibîkirin jî cih digirin.

Her çiqas berhem ne di formata pirtûkên popûler ên pênameya xwarinan de hatiye amadekirin jî, di berhemê de hem derheqê pênameyê gelek xwarinan de, hem jî derheqê menûya ser sifreyê de gelek agahî cih digirin. Loma berhem ji aliyekevî ve

wekî yekem berhema pênaseyêñ xwarinan ku bi zimanê Kurdî hatiye nivîsîn dikare bê qebûlkirin. Berhem, ji bo sedsala modern ku ji gelek aliyan ve li ser çanda Kurdan lêkolîn têñ kirin wekî çavkaniyeke pêşserdemî dikare bê hesibandin.

Dema mirov van xalan tevan hizir dike, bi awayekî aşkera derdikeve meydanê ku cihê Şêx Muhyedîn di nav edebiyat û çanda Kurdan de û cihê berhema wî ya bi temaya xwarinê jî di nav lîteratura xwarinêñ Kurdan de gelekî taybet e.

10. REFERANS

- Adak**, A. (2012), "Liceli Şairlere Genel Bir Bakış", *Dünden Bugüne Lice Sempozyumu Bildirileri*, 05-06 Eylül 2008, (amd.) Ahmet Erkol-Abdurrahman Adak, Mardin: Mardin Üniversitesi.
- Adak**, A. (2009) "Malbata Zêbariyan û Basreta "Paytexta Neqşebendiyan"-I -Heta bi Serdema Postnişîniya Malbata Zêbariyan li Dergahê Basretê." *Nûbihar*, j. 107, Stenbol.
- Amidi**, Z. (1995). *Mecma'u'l-Kasâid*, (Nusxeya destxet a neçapkiri), Diyarbekir.
- Aqtepî**, Ş. E. (1986). *Rewdu'n-Ne'im*, (amd. Mela Zeynelabidin Amidi), Diyarbekir.
- Bender**, C. (2003). *Kürt Mutfaq Kültürü ve Kürt Yemekleri*, İstanbul: Berfin.
- Bingöl** A. (2007). "Xwarinêñ Cizirê" *Nûbihar*, sal:2007, jimar 103, Stenbol.
- Botî**, M. M. D. (2007). "Fistiqên Sêrtê", *Nûbihar*, sal:2007, jimar 103, Stenbol.
- Erdoğan**, K. (2003). "Zâtî Divanında Yiyerekler", *Atatürk Ünv. Türkiyat Araştırmaları Dergisi*, jimar:22, Erzurum.
- Ergün**, Z. (2014), *Bajar-Edebiyat û Cizîra Botan*, Stenbol: Nûbihar.
- Findikî**, S. E. (2011). *Dîwan*, (çapa pêncem), Stenbol: Nûbihar.
- Gökyay**, O. Ş. (1997). "Divan-ı Et'ime", *Kim Etti Sana Bu Kari Teklif*, İstanbul: İletişim
- Güldemir**, O. (2010) *Osmanlı YemeK Yazması Kitabüt Tabbâhîn'in Günüümüze Uyarlanması*, Teza Lîsansa Bilind ya Neçapbûyî, Zanîngeha Selçukê Enstituya Zanistêñ Sosyal, Konya.
- Hesbî**, *Dîwan*, nusxeya destxet, pirtûkxaneya taybet a Abdurrahman Adak.
- Hêni**, Ş. M. (2015). *Beyana Xwarinan û Zewqêñ Wan*, (amd. Mela Birhanê Tarîni), Stenbol: Peywend.
- Kaya**, D., "Halk Edebiyatında Yemek Destanları", *Motif*, Ocak-Şubat-Mart 2007, s. 48, s. 4-11. http://dogankaya.com/fotograf/halk_edebiyatinda_yemek_destanları.pdf (20.11.2014).
- Korkusuz**, Ş. (2004). *Tezkire-i Meşayîh-i Amid*, İstanbul: Kent.
- Malmisanij**, (2004). *Diyarbekirli Cemilpaşazadeler ve Kürt Milliyetçiliği*, İstanbul: Avesta
- Maruf**, H. Ş. bê tarîx, *Diyarbakır İlinin Hani İlçesinde Medfun Şeyh Ahmed Efendinin Tarihçeyi Hayattı*, (wer. Heybet Kanhan), nusxeya daktîloyê, pirtûkxaneya A. Adak a taybet.
- Nalbend**, E. (1998). *Baxê Kurda* (Amd. Teha Mayî), Dihok: Çapxana Xebat.
- Sêrtî**, M. X. (2002), *Nehcu'l-Enam* (amd. Osman Akdağ-Kerem Soylu), İstanbul: Enstitûya Kurdî.
- Şirazi**, E. İ. H. (1302). *Dîwanî Et'ime*, İstanbul: Çapxaneî Ebuzziya
- el-Xanî**, E. b. M. (-). *el-Hedaiqu'l-Werdiyye fî Heqaiq Ecilai'n-Neqşebendiyye*, (Belavker: Ebdulwekîl ed-Derûnî), Dimeşq.
- Yıldırım**, K. (2011). *Ehmedê Xanî'nin Fikir Dünyası*, İstanbul: Ağrı Kültür Yardımlaşma ve Dayanışma Derneği.

Extended Abstract

Sheikh Muhyeddin Heni is from Hani, a town of Diyarbakır district. He lived in the second half of XIXth century and he is one of the most prominent representatives of Kurdish (kurmanci) classical literature. In his lifetime, the Kurdish Principalities had not survived any more, hence he is among the poets of the period of after principalities in terms of the history of Kurdish literature. In that period, the Khalidy branch of the classical Nakshibedi sect had spread and opened dervish lodges and madrasah nearly every corner of Kurdistan, and Kurdish literature improved in those lodge and madrasahs. Sheikh Muhyeddin's father, Sheikh Ahmad-i Karazi had studied by side of Sheikh Salih-i Sipki in Basret, one of main lodges of Khalidy; afterwards he opened Khalidy lodge and madrasah firstly in Karaz, then in town of Heni. Sheikh Muhyeddin took first part of his education in Mardin, but he took majority of his education by side of his elder brother Sheikh Maruf, the mudarris(lecturer) of their madrasah in Hêni. Like other poets of that period, Sheikh Muhyeddin Heni was a man of letters of Khalidy lodge and madrasahs which were represented by his father and elder brother. Sheikh Muhyeddin-i Hêni also had literary exchanges with the member of Aqtepe family (Sheikh Abdurrahman-i Aqtepî and Sheikh Mihemed Can-i Aqtepî) who opened a Khalidy lodge in Aqtepe village of town of Çinar of Diyarbakir district.

Sheikh Muhyeddin who used Sa'i and Heqî as pen names, wrote his literary works in two types. In one hand he continued the type of classical poem, on the other hand he wrote a poem on the food theme (or with its classical name, *simatiye*). As we learn from the members of his family, Sheikh Muhyeddin's diwan of classical poems was lost during the earthquake of Lice in 1975. Only 5 of his classical poems could survive till today. What makes Sheikh Muhyeddin Heni prominent in the history of Kurdish literature is his poem on food which is of *simatiye* type. In Kurdish literature, classical poem and lodge/sufist poem is very advanced, however the secular literature or social/humanist area is not as advanced as sufist poem, therefore that artifact has high prominence.

As far as is known, before Sheikh Muhyeddin Heni, no work or poems were written directly on the theme of food in the Kurdish literature. Only in some parts of some artifacts that written in different purposes, such as Mem û Zin of Ehmed Xani and Nehcû'l-Enam of Mela Khalil Serti, the theme of food is handled. However, during the period of Sheikh Muhyeddin, along with him, two members of Aqtepî family, Sheikh Abdurrahman Aqtepî and Sheikh Mihemed Can Aqtepî also interested in that theme. Hence, it is possible to speak of a movement of writing poem on food in two lodges of Khalidy around Diyarbakir. Yet, Sheikh Muhyedin must be seen the major representative of this type as he wrote an independent artifact on the food theme. Our argument is that, as some artifacts were written on food in Ottoman during that period, their effects could be seen in Kurdish literature.

The original manuscripts of that artifact is by side of Mela Zeynelabidin Amidi. The artifact published firstly in Arabic alphabet by Mela Zeynelabidin Amidi in Diyarbakir, then in Latin alphabet by Mela Birhan Tarini in Istanbul. Because of the long-drawn out dominance of Turkish culture in Diyarbakir, the effects of Turkish on the language of the artifact is greater than the effects of Arabic and Persian. Among the leading aspects of the style of the artifact are a vivid language, humour, repetitions, personification, fixed ideas, insultations, sharp comparisons and an obscene language.

Nearly 20 groups of foods and 130 types of dish of those groups are being narrated in the artifact. The palatal delight of the writer is the main frame of the artifact, however as the ingredients and menu

of the dishes are being presented, that artifact could be seen as a cookbook. Moreover, this artifact is prominent as it shows the oblivion kitchen of both Diyarbakir and Kurdistan. With this artifact, the history of the books of the Kurdish kitchen retrace minimum 100 years, formerly the *The Kurdish Kitchen Culture* of Cemşid Bender which was written in 2003 was accepted the first book on the Kurdish kitchen. As the works on Kurdish culture are relatively written in modern period, that work of Sheikh Muhyeddin is a futuristic one.

زمانی ستاندەر، فۆنۆلۆژی و ریئوس

Standard Language, Phonology and Alphabet

Bakir O. Ali*
Abdulwahab Kh. Mosa**

پوختە

ھۆکاریێن میزۆویی رۆلەکی مەزن گیرایە کو ھەتا نەو کورد نەبوینە خۆدان
ئەلفابییەکا خۆسەر و بى ئاریشە، يان ھەر ج نەبیت ئەو ئاریشین ھەین ب ساناھى
خۆ بەدن دەستى لیکۆلەران بۆ ل دويشچوون و ب دەستقەھینانا چەند ئەنجامیێن
کەتوارى و ل دوماهیي ژى ببنە شەنگستەکی زانستى کو فۆناغ بۆ فۆناغی
ئافاھیي نفییسین و راستنفییسا کوردى ب ریئك و پیئك ل سەر بھیتە ئافاکرن.

* Prof. of Linguistics (Phd) University
of Sulaimani Sulaimani. Kurdistan
Region- IRAQ
e-mail: bakromar15@yahoo.com

** Assist. Prof. of Linguistics (Phd)
University of Zako
Duhok. Kurdistan Region- IRAQ
e-mail: abdilwahabm@yahoo.com

ژی هەبۇونا قى دىياردا ل سەرى ب شىۋەكى گشتى ئەف دوو خالىن ھەرە نەرىنى ل دويىق خۇ ھىلائىنە:

ئىك - كورد نە خۆدان ئىك كولتۇرلى ئەقىسىنىنە.

دوو - زمانى كوردى نەو خۆدان كۆمەكا دىاليكت و دەشكۈن ژىكجودايە و كوردستان ژى يا دابەشكىريە د نافبەرا چەندىن دەولەتىن فەنۋەزەد و فەتكەلتۈر خۆدان زمانىن خۆيىن جودا ژ زمانى كوردى، قى چەندى ژى ب ھەر رەنگەكى ھەبىت كارتىكىرنا خۇ ل سەر بىركىرنا مروفى كورد و زمانى كوردى كريە و مە بقى و نەقى ژى ئەفرو د مەيدانا نەقىسىنا كوردىدا ئەم يېن بويىنە خۆدان دوو ئەلفابىيەن نەقىسىنا ب زمانى كوردى.

سەبارەت ئەو ھەردۇو ئەلفابىيەن نەو كوردان ھەين بۇ نەقىسىنى، قىچىجا چ ئەلفەبىيَا تىپىن عەربى بىت بۇ نەقىسىنا زمانى كوردى يان ئەلفابىيَا تىپىن لاتىنى بىت بۇ نەقىسىنا زمانى كوردى، ھەرئىكى ژ وان ئارىشە و كىماسىيەن خۇ ھەنە و د شىاندaiە ل دويىق پىقەرىن زانستى و تىكەھە ئەلفابىي لىكۆلىنە كا زانستى بۇ قى دىياردى بەھىتەكرن و وەكى پىدەقى ، رەخسانىن و گونجانا وى ل كەل تايىبەتمەندىيەن زمانى كوردى بەھىتە بەنەجەكرن.

(كلىلا لىكۆلىنى: زمانى كوردى، زمانى ستاندر، ئەلفابىيَا ستاندر، فۇنۇلۇزى)

ABSTRACT:

Historical events played a big role in the fact that the Kurds still do not have an own alphabet without obstacles. If those obstacles are known to researchers and if they investigate in them and obtain cultural results, the latter can become a scientific fundament so that step by step the formal Kurdish writing can be built on. Each of both alphabets the Kurds have for writing, whether the Arabic or the Latin letters of the alphabet are used, has its obstacles and shortcomings. It is possible to resolve this issue with scientific measurements and understanding of the alphabet in order to adjust and conform those with the unique needs of the Kurdish language.

This thesis called "Standard Language, Phonology and Alphabet" is about the stan-

dardization of the language and its relation to phonology and writing. In addition, the attempt to identify the number of phonemes by vowels and consonants is made. There are some notes registered about writing, as well. The research is a branch of phonology and has taken advantage of the other branches of linguistic methods whenever needed. This thesis is a descriptive analysis and has not been influenced by any historical events.

Keywords: Kurdish language, standard language, standard alphabet, phonology.

- ناویشانی باسەکە:

ئەم تویزینەودىھە بە پىّ ناویشانەکە ئايىھەتە بە زمانى ستاندەر و پەيەندى ئەم زمانە بە فۇنۇلۇزى و رېنوسى كوردىيەوە.

ب- گرنگى بابەتكە:

لەم تویزینەودىھەدا ھەولۇراوە ژمارە ئۆنۈمىھەكەن بە كۆنسنانت و ۋاولەوە دىارييىكىت و سەبارەت بە رېنوسى كوردى چەند سەرنجىك تۆماركراروە.

ج- سنورى باس:

سنورى باسەكەمان لە چوارچىوهى ئاستى فۇنۇلۇزىدايە و لە ھەمان كاتىشدا سود لە ئاستەكانى ترى زمانىش و درگىراوە.

د- رېبازى لىكۈلىنەوەكە:

لەم باسەدا بە تىۋىرى وەسىنى شىكارى كاركراروە و ھىچ گەرانەودىھەكى تىدا نىيە بۇ مىزۇ.

2- كورد و زمانى ستاندەر

أ- زمانى ستاندەر:

زمانى ستاندەر بە زمانە فەرمى يە دەناسرى كە لە دام و دەزگا فەرمى يەكان و راگەياندەكان و خويىندن و نوسىندا بەكاردى.

ئەزمونى مىللەتان و مىزۇ، چۈنیەتى دىارييىكى زمانى ستاندەر روندەكەنەوە ، ئەوهى كە ئاشكرايە ئەوەيە كە دىالىكتىپ بە بېرىارىكى سىاسى بى يان لە پىيەتەنەنەوە كە ئاشكرايە ئەوەيە كە دىالىكتىپ بە بېرىارىكى سىاسى بى يان لە پىيەتەنەوە، ھەلگەوتى هەندى بارودۇخەوە (ئايىنى - ئەدەب - دىالىكتى پايتەخت ...) ئەبيتە

له ئىيستا و رۆزگارى ئەمپۇماندا، قسە و كۆر و سىيمىنار و توپۇزىنەوە لەسەر ئەم بابەتە له ئارادايە و بە رادىيەك سىاسىيەكانىش چونەتە ناو ئەم مەسىلەيەوە باس له دىالىكتى يان دوان دەكرى كە بىنە ستاندەرى كوردى، مەبەست لە (دىالىكتى ناوهراست و دىالىكتى باكورە).

ئەو بۇچونەش له ئارادايە كە رۆزگارەكانى سەددە نۆزدە بەسەرچۈن و نابى بە زۆر دىالىكتى بىسەپىتىرى بەسەر ئەۋانى تردا.

ب- كورد و زمانى ستاندەر:

سەرەتا دەبىت ئەوە بىزىن كە زمانى ستاندەر، زمانىك نىيە جياواز بى لە دىالىكتەكانى، يان زمانىك بالا و بەرزتر بى لە دىالىكتەكانى، ئەمە بۇ كورد زۆر راست و دروستە، چونكە زمانى ئاخاوتنى كوردى و زمانى نوسىينى وەك مىللەتانا تر نىيە و لە يەك جياواز نىن و بۇشايىيەك لە نىوانىياندا نى يە.

دىيارە ئاگادارى ئەمەشىن كە زمانى فيزىيا و كيميا و بوارە زانستىيەكانى تر لەگەن ئاخاوتنى ئاسايىدا، زاراوهى جياوازىيان هەيە، ئەمانە شىۋەزارى پېشەيىن و واتە هەر پېشەيەك زاراوهى تايىبەتى بە خۇي ھەيە، كەواتە ئەمانە پەيوەندىيان بە زمانى ستاندەرەوە لەو جۆرە نىيە كە بلىيىن لەيەك دوركەوتونەتەوە، كەواتە ئەمە بەستى ئىيمەيە كە زمانى رۆژنامەكانى سىيەكانى و چەكان و رۆژنامەكانى ئەمپۇ ئاخاوتنى ئاسايى خەلگى لەيەك جىابونەتەوە و دورنىن لەيەكەوە.

ھەموو مىللەتىك خاوهنى زمانى ستاندەر و كوردىش بەھەمان شىۋەديە بەو واتايىيە كە زمانى ستاندەر دروست ناکرى، بەلگۇ خۇي يەكىك لە دىالىكتەكان و بە بىيارىتكى سىاسى دىاريىدەكرى، كەواتە ئىيمەش تەننیا بىيارەكەمان ماوە كە ناوى ئەم زمانە ستاندەر بىنېيىن و زمانەكە خۇي ھەيە.

ئىيستا باسى دىالىكتىك و دوان دەكريت، كرمانجى ناوهراست بەو پىيەي خزمەتىكى زۆرى كراوه لە روى فەرھەنگەوە و سەرددەمانىكى زۆر زمانى ئەدبى بۇوە و زمانى فەرمى جىومەتى شىيخ محمود بۇوە و زمانى فەرمى حىكومەتى كوردىستان (مەبادى) بۇوە و زمانى فەرمى دواى (11) ئازارى (70) بۇوە، ژمارەيەك لايەنگرى ئەم دىالىكتە دەكەن، ژمارەيەكى تريش لايەنگرى دىالىكتى باكورە، كە ئاشكرايە لەم سالانە دوايىدا بزوتنەوە كوردايەتى لەو پارچەيەدا ھەلسانەوەيەكى مەزنى بە خۇيەوە بىنیوە و ژمارەيەكى گەورە نەتەوەكەمان بەو دىالىكتە دەدھوين و .. هەتىد. لە ھەمو حالەتىكدا

هەمو راستی يە زمانییەکان لە فەرھەنگ و پیزمان، ئەوەیان چەسپاندوووه کە ئەم دو دیالیکتە يەك زمان.

ئىمە له و بپروايەداین ئىستای نەتهوەكەمان ئەوەي سەپاندوووه بەسەرماندا كە بە دو دیالیکت يان بە جۇرىكى تر بە دو ستابندر بپۇين بە رېۋە، ئەوەي لە راگەياندىنەكىاندا بەدىدكىرىت (تەلەفزيون، راديو، روژنامە، گۆفار،...) دروستى ئەو بۇچونەي سەرەممەنە، لە راستىشدا لەم كرانەوەيە ئەمپۇدا و لە پال ئەو گەشە تەكىنەلۈزىيائى پەيوەندىيەكان بە خۆيەو بىنیوە، كارەكەمان بۇ ئاسان دەكەن و ئەنجامەكەي ئەوەيە كە هەمو كوردىيەك لە ماوەيەكى تردا بتوانى ھەر دو دیالیکتەكە بەكار بەيىن.

ج- يەكخىستنى دیالیکتەكان:

زۆر جار ئەو باسە دىيە ئاراوه كە دیالیکتەكان يەكبىخرين، لە راستىدا ئەمە بۇچۇونىتىكى نازانسى يە چونكە لە زماندا بە بپىار گۆپان رونادات، بەلكو بە پېي تىپەربۇنى كات گۆپانكارى دىيە كايەوە، مەبەستمان ئەوەيە كە جياوازى (نىير و مى) لە كرمانچى ياكوردا بە بپىار لاناچى، ھەر وەك چۈن بە بپىاريش ناهىنرىتەوە ناو كرمانچى ناواھەراست، كەواتە بۇ ديارىيەكىدىنە ستابندر ئەبى لەگەل ئەو بۇچونەدا يەكىگىرنەوە كە ئاسايى بى دو ستابندر بېكەوە ھەبن.

لىيەدا ئەكرى دیالیکتەكان لە بوارى وشە و زاراوددا لەيەك نزىك بکەينەوە، كەواتە زمانى ستابندر چىيە و چۈن ديارىيدەكىرىت، بىروراي خۆمان لەسەر دەربىر، ھەروەها زمانى ستابندر دیالیکتى يان دوان بى.

لەمە گىرنگەر ئەوەيە كە ئەبى پېشەكى وەلامى ھەندى پرسىيار بەدەينەوە لەوانە ئايا ژمارەي فۇنيمەكاني كوردى چەندە و ئايا لە نوسىيندا وەك ئاخاوتىن بنوسىين يان وەك مىڭو .. .

3- فۇنيمەكاني زمانى كوردى

ا- دەستنىشانكىرىدىنە فۇنيمەكاني زمانى كوردى:

فۇنيم: بەو دەنگانە دەوتىرى كە لە زمانىكى ديارىيەكىدا بەھايىان ھەبى، واتە بتوانى واتاي وشە بگۇرن، بۇ نموونە (ج) لە كورىدا واتاي وشەمان بۇ ناگۇرى لەبەر ئەوە

لەم پیوودره زیاتر پیوودریکی ترمان نییە بۆ دیاریکردنی فۆنیم، لەم روانگەیە وە هەولەددەین ژمارەی فۆنیمە کانى زمانى كوردى دیاري بکەين. وەك هەر زمانىکى تر فۆنیمە کانى زمانى كوردى لە دو دەستە پیکدین کە بريتىن لە كۆنسنانت و ۋاولەكان.

ئاشكرايە كە زمانناسان و نوسەرانى كورد، بۇچونى جياوازىيان دەربارە ژمارە فۆنیمە کان (كۆنسنانت و ۋاولەكان) (فەتاح 1982 ، ل 238، 243، 242) ھەيە، وەك ئىمەيش بۆى دەچىن، هەولەددەین ژمارەي فۆنیمە کان دیاري بکەين.

ۋاولەكان (V)

كۆنسنانتەكان (C)

ب	1
پ	2
ت	3
د	4
ج	5
چ	6
خ	7
غ	8
س	9
ش	10
ز	11
ڙ	12
ف	13
ڻ	14
ق	15
ك	16
گ	17
ل	18
ن	19
ـ	20

بە پىيى ئەم توېزىنە وەيە ، ئىمە لەو بىروايە دايىن كە ژمارە فۆنیمە کانى زمانى كوردى (31) فۆنیمە، واتە لە (25) كۆنسنانت و (6) ۋاول پىكدىت، بە واتايەكى تر (ھمزە ، ع) لە كوردىدا پلەي فۆنیمیان نییە و ھەروەها (و ، ئ) نابى لە ناو كۆنسنانت و ۋاولەكانىشدا حسابىيان بۇ بىرىت، (وو) واوى درېزىش پلەي فۆنیمى لە ناو ۋاولەكاندا نییە (عەلى 2005، ل 15) (ا) بىزۈكەش وەك (غازى) دەلى ئەلە فۆنی فۆنیمى (ى) (ئەمەين 1982، ل 448، 447) يىيە و بۇ پىداويىستى بىرگە كردن روڭلى ۋاول ئەمبىنى، ئەگىنا خۇي فۆنیم نى يە.

-21 ر

-22 ر

-23 ن

-24 م

-25 ه

ب- لایه‌نه کیشداره‌کانی فونولوژی کوردی:

فونولوژی کوردی ههندی لایه‌نه تیایه و له کاتی خویدا کوپری زانیاری کورد له به‌غدا، نامیلکه‌یه‌کیان به‌مو ناویشانه دهرکرد که تیایدا باسی واوی دریژ و (وهیس 1984، ل 78) هه‌مزه و ههندی دهنگی تریشی تیایه، ئیمەش لای خۆمانه‌وه له‌سهر ئەو فونیمانه بچونی خۆمان دەخهینه‌رو.

1- هه‌مزه (ء):

دیاره که هه‌مزه سهر کورسی لایه‌نیکی کیشداره و زمانه‌وانه کورده‌کان بیرپرای جیاوازیان له‌سهری هه‌یه، ههندیک به فونیمی دهزانن و ههندیکش به فونیمی نازانن (عهلى 2014، ل 195)، ئیمەيش له‌گەل ئەو بچونه‌داین که هه‌مزه له کورديدا پله‌ی فونیمی ودرنه‌گرتووه.

له زمانی عهربیدا (ء) هه‌مزه له‌سهر دتا و ناوه‌راست و کوتایي وشهدا دېت، هه‌ر بچونه له ناوه‌راسته‌وه ودک وشهی (بئر)، بەلام له کورديدا جگه له وشهی (نه) که هه‌مزه‌که که‌وتۆته کوتایي وشه‌کەوه، له وشه‌یه‌کى تردا به‌دیناکریت. پیشەکى و به بى گومان (هه‌مزه) له ناوه‌راستى هیچ وشه و برگەیه‌کى کورديدا نابینریت، که‌واته، با بزانین له‌سهر دتاوه چۆنە؟.

به هه‌لە نوسین واي لیکردوين که وا بزانین هه‌مزه له‌سهر دتاوه‌هه‌یه، واته ئەوهى پیشەکى و به بى گومان (هه‌مزه) له ناوه‌راستى هیچ وشه و برگەیه‌کى کورديدا نابینریت، که‌واته، با بزانین له‌سهر دتاوه چۆنە؟.

پیشەکى و به بى گومان (هه‌مزه) له ناوه‌راستى هیچ وشه و برگەیه‌کى کورديدا نابینریت، که‌واته، با بزانین له‌سهر دتاوه چۆنە؟.

ئەنوم	،	أ- ئەرۇم
enum		eřom

تىبىينى ئەوه دەكەين که به لاتىنى دەنوسرىن، حساب بچونه‌داین کە ئەوه ناکریت.

بـ وشهیهکی ودک: فور + ئاو ← قوراو
کهواته هەمزەکەی حسابى بۇ نەکراوه

جـ وشهیهکی ودک (ئازاد) ، لەم وشهیهدا دو هەمزەتىيادىه:
ء

1ـ سەرتاي وشهکە (ئا).

2ـ دواى فۆنيمى (ز) ، كەچى لە خويىندەوددا يان لە گۆكىردىدا،
ھەمزەکەی دواى (ز) حسابى بۇ نەکراوه.

بـ پىيى ئەم بۇچونە هاتنى ۋاول لە سەرتاوه دەرىپىنى ئاسان نىيە، ھەر بۆيە دەنگىك دەردەكەۋى كە گۆكىردىنى ودک ھەمزەتىيە بۇ يارمەتىيادى دركاندىنى ۋاولەكە، ئەمە ئەو دەنگەتىيە كە بە ھەلە لېمان بۇوه بە ھەمزە داشمان ناوه بە فۆنيم و خستومانەتە رىزى كۆنسنانتەكانەوە، كەواته ھەمزە دەنگىكى فۆنەتىكى يە و تا ئىستا نەبۇوه بە فۆنيم ، لىرەدە پرسىيارى سەرەتەددات، كە ئايا ۋاول لەسەرتاوه دېت:
ئىيمە واى بۇ دەچىن كە وشهىيەك يان بېگەيەك كە سەرتاكە ۋاول بى، لە بەرئەوەدى دركاندىنى ۋاول لەسەرتاوه گرانە، ئەوا دەنگىكى فۆنەتىكى دەكەۋىتە پېشىيەوە و ئەو دەنگە حسابى كۆنسنانتى بۇ دەكىرى كە ئەو دەنگەش ھەمزەتىيە و ئەمەش لە بېگەكەرنى كوردىدا ئاسانكارىيامان بۇ دەكەت ئىت ئەمە لە ھەموو ئەو وشانەتى لە جۇرە ھەر ئەو رۆلە دەبىنى:

ئىستا
ۋاول
دركاندىنى فۆنەتىكى رۆلى كۆنسنانت دەبىنى

ئىمشەۋ
ۋاول
دركاندىنى فۆنەتىكى رۆلى كۆنسنانت دەبىنى

2- بزرگه (i):

ئەم دەنگە لە کوردىدا واتاي وشە ناگۇرئ و لەسەرهەتا و كۆتايى وشە و بېرىگەي
کوردىدا نايەت.

(غازى) لە نامەي ماستەركەيدا، ئەم دەنگەي (i) بزرگە، بە ئەلەفونىيىكى، فۇنييمى (ى)
دانادە. (فەتاح 1982، ل 250، 251) ياسايدەكى گشتى ھەيء، بە پىيى ئەو ياسايدە، بېرىگە
بە بىي ۋاول نابى، كەچى لە چەندان وشەي وەك (من، كچ، ڙن) جىڭە لە كۆنسنانت، ۋاول
بەدیناكارىت، لىرەدا دو بۆچۈن دىيەتە كايەوە، يان ئەوهەتا بېرىگە لە کوردىدا دەشى بە بىي
ۋاول دروست بېيت يان نابىت، ئىيمە لەگەل ئەوهەدەين كە بېرىگە بە بىي ۋاول نابى، ھەر
بۇيىە لەگەل بۆچۈنەكە (غازى) دا يەكىدەگەرینەوە و دەلىيەن:

لە نىيوان ئەو دو كۆنسنانتەدا (م - ن (من) ئەو ئەلەفونە بونى ھەيء و رۆلى ۋاولى
بېرىگەكە دەبىنى، بەلام پلهى فۇنييمى نى يە، بەم شىيەدە:

min
 ↙
ئەلەفونى (ى) رۆلى ۋاولى ئەبىنى.

تىيىبىنى: لە ئەلەفوبى عەربىيەكەدا وىنەي بۆ دانراود، بەلام لە ئەلەفوبى لاتىنى يەكەدا
(i) ئەم وىنەيەي بۆ دانراود، ئەگەرچى ئەلەفون وىنەي بۆ دانانرەت، جىڭە لەمە لەبەر
ھەندى ھۆكاري ترىيش كە دواتر لىيى دەدويىين، لە راستىدا لە ئەلەفوبىي لاتىنىيىشدا
پىويسىت ناكا وىنەي بۆ دابنرى.

3- (ع):

ئەم دەنگە لە کوردىدا فۇنييم نى يە، بە بەلگەي ئەوهەي وشەيەكى كوردىمان نىيە ئەم
دەنگەي تىيىدا بىي، ئەمە لە لايەك و لە لايەكى ترىيشەوە لەگەل دەنگى ھەمزەشدا جىيى
يەكتەر دەگرنەوە وەك: (ئاسمان - عاسمان - قورئان - قورغان) ھەرئەم جىيگەرنەوەي
يەكتەر بەلگەي ئەوهەن كە (ھمزە و ع) ھىچيان پلهى فۇنيمىيان لە کوردىدا نىيە.

4- (و) ii:

ئەم فۇنيمه شىيەدە دركالدىنى ھەمان ۋاولەكانى ترى ھەيء، بەو پىيى يە ناكىرى
كۆنسنانت بىي، كەواتە لە رىزى ۋاولەكانى زمانى كوردىدايە. بۆ وەلامى ئەو پرسىيارەش


که زۆر جاریش رۆلی کۆنسنانت ئەبىنى، بۇ نمونه، لە وشانەدا يان لەو بىرگانەدا كە فاولىكى تريان تىيا بى:



ئەمە راستە لە بەرئەودى لە بىرگەيەكدا نابى دو فاولى تىيدا بى بهو پىيە فۆنيمى (و) لەويىدا رۆلی کۆنسنانت ئەبىنى، ئەمە بهو جۆرە ليكىددىرىتەوە كە ئەم فۆنيمە فەرە ئەركە (خۆشناو 2014، ل 51، 52، 53) واتە ئەتوانى ئەركى کۆنسنانتىش بىبىنى، بەلام کۆنسنانت نىيە، بەلكو لە رىزى فاولەكاندىايە.

: (i) 5

ھەمان ئەو بۇچونە سەرەوە دەربارە (و) بۇ ئەمېش دروستە، واتە لە رىزى فاولەكانە و بەلام فەرە ئەركە بۇ نمونە:



بە پىي ئەم بۇچونە بۇ رىنوسە لاتىنى يەكە دو ئەگەرمان لەبەردەستدایە :

- 1- پىويىست ناكات بە دو وىنەسى جىاواز بىوسىرىن { واوى فاول (u)، واوى كۆنسنانت (W)، هەروەھا (i) فاول (î)، (ى) كۆنسنانت (y) } .
- 2- ئەو دو وىنە جىاوازە بەمىنېتەوە وەك ئىستا جارىك وەك فاول و جارىك وەك كۆنسنانت.

ئىمە لەگەل ئەوەداین كە وەك رىنوسە عەرەبى يەكە يەك وىنەيان ھەبى، چونكە يەكىك لە كىشەكانى رىنوسى كوردى بە لاتىنى لەو دو وىنەيەدا كە بە دلىيائەوە جەڭە لە پىسپۇرانى زمان، خەلکانى تر (پىزىش، ئەندازىيار، پارىزەر، فەرمانبەر، نوسەر، كاسب، ...) لە نوسىندا ھەلەى تىيدا دەكەن، بەلام لە رىنوسە عەرەبى يەكەدا چونكە يەك وىنەيان

ههیه، ئهوه كهس ههلهی تىدا ناكات، له راستيشا جياكردنوه و ناسينهوه كونسنانت و فاول، ئهمه پيشه پسپورانه و ئهگينا ئهمه ئيشى خهلكاني تر نى يه.

6- (وو) - ّ :

ئهـم دـنـگـهـ لـهـ كـورـدـيـداـ بـهـ واـوىـ درـيـزـ نـاـوـبـراـوـهـ،ـ بـهـ بـرـوـايـ ئـيـمـهـ ئـهـمـ دـنـگـهـ لـهـ كـورـدـيـداـ پـلـهـيـ فـوـنـيـمـيـ نـيـيـهـ،ـ بـوـ ئـهـوهـيـ بـوـجـونـهـ كـانـمـانـ سـهـبـارـهـتـ بـهـمـ دـنـگـهـ لـيـرـهـداـ دـوـبـارـهـ نـهـكـاهـيـنـهـوهـ،ـ پـيـشـنـيـازـ دـهـكـهـيـنـ كـهـ سـهـيـرـيـ ئـهـوـ توـيـزـيـنـهـوهـيـهـ مـانـ بـكـريـتـ كـهـ لـهـ گـوـفـارـيـ ئـهـكـادـيـمـيـ زـانـكـوـيـ سـلـيـمـانـيـداـ بـلـاـوـكـراـوـهـوهـ.

7- (نـكـ) :

ئـهـمـ دـنـگـهـ لـهـسـهـرـهـتاـوهـ زـمانـهـوانـهـكـانـ رـايـ جـيـاـواـزـيـانـ دـهـبـارـهـ هـهـبـوـوهـ،ـ هـهـنـديـكـيـ تـريـشـ بـهـ فـوـنـيـمـيـانـ دـانـاـوهـ وـ لـهـ رـيـنـوـسـهـ لـاتـيـنـيـ يـهـكـهـشـداـ وـيـنـهـيـانـ بـوـ دـانـاـوهـ وـ هـهـنـديـكـيـ تـريـشـ بـهـ فـوـنـيـمـيـ دـانـانـيـتـ.

ئـيـمـهـ لـهـ سـالـانـهـ رـابـورـدـوـداـ توـيـزـيـنـهـوهـيـهـكـامـانـ سـهـبـارـهـتـ بـهـمـ دـنـگـهـ لـهـ گـوـفـارـيـ ئـهـكـادـيـمـيـ زـانـكـوـيـ سـلـيـمـانـيـداـ بـلـاـوـكـراـوـهـوهـ وـ لـهـوـيـداـ وـامـانـ لـهـقـهـلـهـ دـاوـهـ كـهـ ئـهـمـ دـنـگـهـ بـهـ تـهـنـيـاـ لـهـ شـيـوـهـزـارـيـ سـلـيـمـانـيـداـ فـوـنـيـمـيـهـ،ـ بـهـلـامـ كـهـ قـسـهـ لـهـسـهـرـ زـمانـيـ ستـانـدـهـرـ بـيـ،ـ ئـهـواـ ئـهـگـهـرجـيـ لـهـ شـيـوـهـزـارـيـ سـلـيـمـانـيـداـ فـوـنـيـمـيـشـ بـيـ،ـ بـهـلـامـ نـابـيـ لـهـ زـمانـيـ ستـانـدـهـرـداـ،ـ حـسـابـيـ بـوـ بـكـريـ،ـ هـهـرـ بـوـيـهـ ئـاسـايـيـهـ كـهـ وـهـكـ هـهـموـ دـنـگـهـكـانـيـ تـرـ،ـ ئـهـمـيـشـ دـوـ دـنـگـهـ وـ (ـنـ -ـ گـ)ـ بـهـ دـوـايـ يـهـكـداـ دـيـنـ،ـ زـمانـهـوانـهـكـانـيـشـ *ـ هـهـمـانـ بـوـجـونـيـانـ هـهـيـهـ.

جـ - بـرـگـهـ :

نـاسـيـنـهـوهـ وـ دـيـارـيـكـرـدـنـىـ سـنـورـىـ بـرـگـهـ لـهـ كـورـدـيـداـ زـوـرـ ئـاسـانـهـ وـ زـوـرـبـهـيـ زـمانـهـوانـهـ كـورـدـهـكـانـ لـهـسـهـرـ ئـهـوهـ كـوـكـنـ كـهـ شـهـشـ جـوـرـ بـرـگـهـمانـ لـهـ كـورـدـيـداـ هـهـيـهـ:

1- بـجـوكـتـرـينـ بـرـگـهـ :

پـيـكـدـيـتـ لـهـ كـونـسـنـانـتـيـكـ وـ فـاـوـلـيـكـ:

no	نو	şə	شا	ba	با	dê	دى
↓		↓		↓		↓	
CV		CV		CV		CV	

2- بـرـگـهـيـ CVC : وـاتـهـ كـونـسـنـانـتـيـكـ وـ فـاـوـلـيـكـ وـ كـونـسـنـانـتـيـكـ وـهـكـ:

m o r
 ↓ ↓ ↓
 C V C

مور

ş a r
 ↓ ↓ ↓
 C V C

شار

3- بِرْگَهَى CVCC: واته کۆنسنانت، ڤاول، کۆنسنانت، کۆنسنانت واته کۆتاييەكەی دو کۆنسنانت بى وەك:

d e s t
 ↓ ↓ ↓ ↓
 C V C C

دەست

b e r d
 ↓ ↓ ↓ ↓
 C V C C

بەرد

4- بِرْگَهَى CCV: واته دو کۆنسنانت لە سەرتاوه و ڤاولىك لە کۆتاييەود، وەك:

k w a
 ↓ ↓ ↓
 C C V

كوا

x w a r
 ↓ ↓ ↓ ↓
 C C V C

خوار

Ç w a r
 ↓ ↓ ↓ ↓
 C C V C

چوار

5- گەورەترين بِرْگَهَى كوردى: دو کۆنسنانت، ڤاولىك، دوکۆنسنانت (فەتاح 1982 ، ل : (232,233

x w a r d
 ↓ ↓ | | |
 C C V C C

خوارد

لېرەدا دەبى ئاگادارى ئەوەبىن، كە ھەندىيەك رايان وايە كە لە سەرتاوه ھەرگىز دو کۆنسنانت لە كوردىدا نىيە و ھەر بۇيە بە لاتىنى بهم جۇرە دەنۇسنى:

birdim	بردم
pişt	پشت
kiwa	کوا
şıwan	شوان

ئەم بۇچونەش زانستى نى يە، چۈنكە ئەگەر ئەو بۇچونەھەلەيە پەسند بى كە گوايىد دو كۆنسنانتى سەرتامان نى يە، ئەوا جۆرەكاني بېرىگە لە كوردىدا، سى جۆريان لەو شەشەي دىيارىمانكىد دەمىنېتەود، چۈنكە ئەم سى جۆريان نامىنى:

CCV	گيا	CCV	كوا
CCVC	گيان	CCVC	چوار
CCVCC			خوارد

كەواتە لە كوردىدا دو كۆنسنانتى سەرتامان ھەيە بە مەرجىيەك دەنگى دو وەمييان يان (و) بى، يان (ى) بى، بهم جۆرە:

g y a n	گيان	ş w a n	شوان
↓ ↓ ↓		↓ ↓ ↓	
c c v c		c c v c	

بۇ زياتر رونكىرنەودى ئەم لايەنە، با وشەيەكى ودك (شوان) بېرىگە، بېرىگە بىكەين كە بۇ بېرىگەكىنى ئەم ئەگەرانەمان ھەيە:

دو بېرىگە	şı wan	ش وان	1-
دو بېرىگە	şw an	شو ان	—2
دو بېرىگە	şwa n	شوا ن	—3
يەك بېرىگە	şwan	شوان	—4

ئاشكرايىه كە جىگە لە ئەگەرى چوارەمييان ، سيانەكەى تر پەسەند نىن و ھەرگىز هيچ كوردىيەك بەو جۆرە قىسىنەكەت و بەو جۆرانە وشەكە نادركىيىن و گۆي ناكات، كەواتە

تهنیا ئەگەری چوارەمیان دروستە و زانستى يە، واتە وشەكە يەگ بېرىگەيە و لە دو كۆنسنانتى سەرتەندا و قاولىك و كۆنسنانتى كۆتاىي پىكھاتووه.

لەم دوايىيەدا لاي هەندى لە زمانناسان (ئەمین 2009 ، ل 16) ئەم بۆچونە
هاتوتە كايەوە كە قالبەكانى بېرىگە لە كوردىدا ، شەش قالب نىيە، بەلكۇ نۇ قالبمان
ھەيە، وەك:

A	برىگەيە يەك قاولن	←	<u>ZAD</u>	ئازاد
VC	برىگەي	←	<u>AW</u>	ئاو
VCC	برىگەي	←	<u>ARD</u>	ئارد

ھەلەي ئەم بۆچونە لەوددایە كە ياسايىك لە ياسا فۇنۇلۇزىيەكانى زمانى كوردىيان
لە بىركدووه، بە پىي ئەم ياسايى:

دوا دەنگى بېرىگە لە كاتى گەورە بونى بېرىگەكەدا، دەپەرىيەتەوە و لەگەن دەنگەكانى
تردا بېرىگەي نۇي دروست دەكتات (موسى 2009 ، ل 15 - 18) بۇ رونكردنەوە:

دار ← ئەم وشەيە يەك بېرىگەيە و (ر) دوا دەنگى بېرىگەكەيە، هەر كاتى
كەرسەي

تربۇ وشەكە زىابىكەين، ئەوا دوا دەنگ كە (ر) دەپەرىيەتەوە و

بېرىگەيەكى نۇي دروست دەكتات:

دار + ا	←	دا را
da ra	←	a + dar

بەلام لە وشەكانى وەكىو: {نۇي / گۈي} دوادەنگ كە (ى) كەيە، ناپەرىيەتەوە و لە
بېرىگەكەي خۇي نابىيەتەوە، لەبەر ئەمەد (ى) قاولە، چونكە ئەگەر بېپەرىيەتەوە دەبىي بە
دەنگى يەكەم و بەو پىي يە بېرىگە نوييەكە بە قاول دەستپىيدەكتات.
بۇ نموونە:

گۈي + ز ← بېرىگەيە نۇي دروست نەبو
گۈي - زان ← كەواتە (ى) لە بېرىگەكەي خۇي
جيانەبۇوه.

ئه و ياسا فۇنۇلۇزىيە باشتىن بەلگەيە و پېيمان دەلىٽ كە بىرگە لە كوردىدا بە قاولۇ دەستپىئناكتا، كەواتە ئه و سى قالىبەي زىادكراوه دروست نىيە، ژمارەي قالىبەكانى بىرگەي كوردى لە شەش تىيناپەرى.

لىرەدا جىي خۆيەتى ئامازە بە پېنىسىپېيکى زانستى زمان بىدىن كە لە لايىھەندى كەس بە هەلە واي دەبىن كە تا ژمارەي فۇنۇمەكان زۆر بى ئەوه بۇ زمان باشە، ئەمە بۇچۇنىيکى ھەلەيە، چونكە زمان ھەيە ژمارەي فۇنۇمەكانى لە كورد كەمترە و كەچى فەرھەنگەكەشيان دەولەمەندىرە.

لە راستىدا، چالاکى زمان لە ژمارەي فۇنۇمەكاندا نى يە، بەلگۇ چالاکى زمان لە لېكدانەكاندایە، بە واتاي ئەوهى چەندە دەتوانى بە لېكدانى فۇنۇم و مۇرفىمەكان، وشه و زاراوه دارپىزى، ھەر وايشە كە بە ژمارەيەكى كەم لە فۇنۇمەكان، ھەزاران وشه و مۇرفىم دادهپىزى و ھەروەها بە پىزىبۇونى ئەمانىش، ھەزاران ھەزار رىستە دادهپىزى.

4 - رېنوسى كوردى

ا - رېنوسى كوردى:

ئاشكرايە كە لە ئىيىستادا دو رېنوس لە ئارادايە: (نوسىنى كوردى بە ئەلفوبيى عەربى، نوسىنى كوردى بە ئەلفوبيى لاتىنى) كە لە باشور و رۆزھەلاتى كوردستان بە ئەلفوبيى عەربى دەنۋىسىن و لە رۆزئاوا و باكۇرى كوردستانىش بە ئەلفوبيى لاتىنى دەنۋىسىن.

ھەر يەكى لەم دو رېنوسە لايەنگىرى خۆيىھەيە، بە واتاي ئەوهى ھەندىيەك رېنوسە عەربىيەكەيان پى باشه و ھەندىيەكى تىريش لاتىنى يەكە و ھەر لايەش كۆمەللى پاساو بۇ دروستى بۇچونەكەيان دەھىيىنەوە.

لە راستىدا ئەوهى زۆر گرنگە ئەوهەيە كە رېنوس ئەوهندە گرنگ نىيە، بە و جۈرەي كە گەورە كراوه، چونكە ئەلفوبيى واتە ويىنەي دەنگەكان، ھەر كاتىيەك بىمانەۋى زۆر بەئاسانى دەتوانىن بىانگۇرىن و ھەندى ويىنە دابىنلىكىن كە لە ھى كەسى تر نەچى و ھى خۆمان بى، بەلام ئەمە پېيوىست ناكات و مىللەتانى تىريش خۆيان بەمەوه خەرىك نەكىردووه، ئەو چەند ئەلفوبيى يەي لە ئارادايە، مىللەتان و دەريانگەرتىووه و ھەندى گۆرانكارىييان تىيدا كردووه و لەگەل زمانەكانى خۆياندا گونجاندويانە و ئىيمەش ھەر وامان كردووه.

خالیکی تریش که گرنگه و دروستی ئهو بوجونه مان دەسەلینى، ئەودىيە كە يەكى لە جىاوازىيە ھەرە گرنگە كانى نىوان زمان و نوسىن لە وەدایە، كە زمان بە بېيار گۆرانى بە سەردا نايەت، بە پىچەوانە وە بە بېيارىك دەتوانىن رىئوس بگۈرىن، ھەروەك چۈن لە كات خۇيدا (توركىيا) رىئوسە عەرەبىيە كە گۆرى بە ئەلفوبي لاتىنى.

بە بىرواي ئىيمە لەمەشدا دىسانە وە دەتوانىن بە ھەردو ئەلفوبي يەكە بنوسىن و لە ماوەيە كى زۆر كەميشدا دەتوانىن ھەردو كىان فيردىن، خۇ ئەگەر يەكىكىشيان ھەلبىزىرىن ئاسايىيە و كىشەيە كى گەورە نى يە، بەلام جىي خوشىتى لە روپ زانسى يە وە گرفته كانى ھەر دو رىئوسە كە بزانىن.

ب- كىشەكانى نوسىنى كوردى بە ھەر دو ئەلفوبي يەكە وبەراوردىكنىان:

1- نىڭارى دەنگەكان:

يەكى لەو كىشانە ئەوەيە كە لە ئەلفوبي عەرەبىيە كەدا وىنە بۇ بىزروكە دانەنراوه، بەلام لە ئەلفوبي لاتىنى يەكەدا وىنە بۇ دانراوه، بەم جۆرە (1).

بە بىرواي ئىيمە ئەمە كىشە نىيە، چونكە وەك پىشتر باسکرا ئەم دەنگە ئەلەفونە و وىنە بۇ دانانرى، ئەمە لە لايەك و لە لايەكى ترىشە وە بون و نەبۇنى وەك پىداويىستى بۇ پىكھاتە بىرگە، ئەمە كارى پىپۇرانى زمانى كوردىيە، ئەگىنا كەسانى تر بە خويندەوار و نەخويىندەوار وە (فەرمانبەر، كارگوزار، كاسب، پىزىشك، پارىزەر، ئەندازىيار، مامۆستا...) نە دەزانىن بىزروكە چىيە و نە ئىشيان پىيەتى، ھەروەها بونى وىنە كە لە لاتىنىدا نەك كىشە چارسەرنە كردووە، بەلكو كىشە گەورە كردووە، كىشە زۆر گەورەش بۇ رىئوسى كوردى دەنیتە وە، چونكە جگە لە پىپۇرانى زمانى كوردى، خەلگانى تر لە نوسىنىدا ھەلە دەكەن كە كەسىكى ناپىپۇر چۈن دەنگىك بنسى كە نەدركىنلى، لە بەر ئەوە پىشنىيازى ئەم باسە ئەوەيە وىنە بۇ دانەنرى و لە لاتىنى يەكەشدا لا بىرى.

2- بۇ ھەردو فۇنيمى (و - ئى):

لە ئەلفوبي عەرەبىيە كەدا وىنە يان بە كۆنسنانى و بە قاولى وەك يەكە و لە لاتىنى يەكەدا ئەمە جىاكارا وەتە وە:

<u>V</u>	<u>فَاوْن</u>	<u>C</u>	<u>كۆنسنانٰت</u>
U	و	W	و
Î	ى	y	ى

دیسان لهمه‌شدا ئیمە به باشى ده‌زانین که هەریەك وینەيان هەبى لەھەرئەوهى تەنیا پسپۇرانى زمانى كوردى كۆنسنانت و قاول دەناسن و ئەمە پېشەيانە، ئەگىنا كەسانى ترى ناپسپۇر، نازانن كۆنسنانت و قاول چى يە؟ ئىت چۆن بە دو وینەي جياواز بىاننوسن، بە بى گومان دەبىتە مايەي ھەلەيەكى زۆر لە رېنوسى كوردىدا، لە بەر ئەمە ھەریەك وینە گونجاو و دروستە، ئەمە لە كاتىكدا ئەوهش دەزانین کە لەم توپۋىزىنەوهىدا ئەم دو فۇنىمە تەنیا بە قاول ناسىئنراون و فەرە ئەركن، واتە دەنگىك نى يە ھەم قاول بى و ھەم كۆنسنانت، تا دو وینەي جياوازى ھەبى.

بە پىي ئەم باسە ئەوانەي باسکران، بە پېچەوانەوه لە جىاتى ئەوهى لايەنى كەموكورتى ئەلفوبى عەربىيەكە بى، بەلكو لايەنى باشەي ئەو ئەلفوبى يەيە.

3- لە راستىدا ئەوهى كېشەيە لە ئەلفوبى عەربىيەكەدا ئەوهى كە وینە بۇ ھەمزە دانراوه و ئەوهشمان زانى کە ئەم دەنگە فۇنىم نى يە، كەواتە لېرەدا لايەنى باشى ئەلفوبى لاتىنى يەكە ئەوهى كە ئەم دەنگە وینە بۇ دانەنراوه.

4- لايەنىكى ترى كېشەي ئەلفوبى عەربىيەكە ئەوهى كە وشە دارىژرا و لېكدرابەكان چۆن بنوسىن بە جىا يان بەسىرىيەكە و بۇ نمونە:

يارى كرد ← يارىكىرد

سروشتى پىتە عەربىيەكان بە و جۇرەيە، بەلام كە بە پىتە لاتىنى يەكان دەياننوسىن
 ئەم كېشەيەمان نامىنىن ← يارىكىرد

تىپبىنى:

لەگەل ئەوهشدا دەبى ئەوه بزاڭىن کە ئەمەش دەبى زۆر بە ئاگادارى و وريابىيەوه مامەلەي لەگەلدا بەكەين، چونكە ھەندى جار باس لەوه دەكرى كە لە نوسىندا دەبى وشە لېكدرابەكان و فرىز لەيەك جىابكەنەوه، بۇ نمونە: (كشت و كال) دەبى بە سەرىيەكە و بىنوسىن چونكە يەك وشەيە لە فەرەھەنگدا (كشتوكان)، بەلام (ئەدەب و ھونەر) نابى بەم جۇرە بنوسىر (ئەدەب و ھونەر) چونكە دو وشەن.

لە راستىشدا ئەمەش كېشەيەكى دروستىراوه، چونكە ئەوانەي پسپۇر نىن نازانن وشەي لېكدرابەكان و فرىز چى يە؟ تا لەيەكىيان جىابكەنەوه، لەبەر ئەوه ھەر ھەلەي تىا دەكەن، خەلکانى ناپسپۇر نازانن (بەكەر، بەركار، ئاودلۇا، ئاودلۇكار) چى يە و زمانىشيان پاراوه.

ههه لىرەدا دەبى ئەوهش تۆمار بکەين كە لە ئەلفوبي لاتىنى يەكەدا ئەمە
چارەسەركراوه، چونكە سروشتى پىتەكان بە وجۇردىيە:

Kştukal
Edebuhaner

5- ئەنجام:

- 1- ل دويىف قى لىكولىنى ھزما را فۆنيمىن زمانى كوردى (31) فۆنيمە و
پىكەتىيەن ژ (25) كۆنسنانت و (6) ۋاولان.
- 2- هەردوو ئەلفوبيين كوردى ب تىپىن عەرەبى و لاتىنى، ئارىشىن
تايىبەتىيەن ھەين و ھندەك ژ وان ئارىشان يېن ھاتىنە دروستىرن.
- 3- د دەنگسازى و كريارا ن菲سىنىدا يا ديارە كو ئەڭ هەردوو بىاڤە د
وارى زمانناسىيىدا دوو تشتىن ژ ھەقدوو جودانە و دەنگسازى ب
ھەردوو لقىن خۇ يېن فۆنهتىك و فۆنۈلۈزىيە يَا تەرخانكىرىيە بۇ
لىكولىنا دەنگىن بەھادارىن زمانى ل دەڭ مەرۆفان ب رەنگەكى گشتى و
دياركىن و دەستنىشانكىندا فۆنيم و ياسىيىن دەنگى د زمانەكى
دياركىridا ، ھەمبەر قى ژى كريارا ن菲سىنى دياردەكە د مىزۈوپا
مەرۆفايەتىيىدا زۆر درەنگز ب دەستقەھاتىيە، وەكو ھەولدانەكا مەرۆفى
بۇ تۆماركىندا چالاکى و پشكەكى ژ ئاخىقىتنا خۇ.
- 4- ئەرى ئەو ئەلفاپىيىن ل بەرددىستى مە، ئەلفاپىيىن فۆنهتىكىنە يان
فۆنۈلۈزىنە؟ و ج جۇرە ئەلفاپى ژ وان د گۆنجاي ترن بۇ ن菲سىنى و
زېھر ج؟ ھەلبەت ئەفە ھەمى پسياران و د شىياندايە كۆمەكا پسيارىن
دىتەر ژى بەھىنەكىنى و ئەفان پسياران ژى ھەميان بەرسقىن زانسى
دەقىن. بۇ ۋى چەندى ھندەك ن菲سىر بەرەڭ وى ھەزىزى دەچن كو بۇ
ھەر دەنگەكى بەھادارى زمانى (فۆنيمەكى) ھىمایەك (تىپەك) بەھىتە

دانان کو ئەفه ئالىگىرىن ئەلبابىيىا فۇنۇلۇزىنىھ و ھندەكىن دى بەرەڤ
ۋى ھزرى دچن کو بەرامبەر ھەر(ئەلۇفۇنەكى) کو ئەلۇفۇن بخۇ بخۇ
ئاوايىھەكى جودا جودايى دەربېرىنا ئېڭ دەنگى زمانىيە واتە
فۇنۇمەكىيە تىپەك بھېتە دانان کو ئەفه ڙى ئالىگىرىن ئەلبابىيىا
فۇنۇلۇزىنىھ. ل ۋىرى ئەوا ڙەھىزى دىاركىرنىيە بۇ ھەردوو ئەلبابىيىن
مەھەين يَا (عەرەبى) و يَا (لاتىنى) مە ھەردوو پەيرەوېن فۇنەتىكى
و فۇنۇلۇزى تىكەل كرينه.

5- راستىنۋىس، د ھەردوو ئەلبابىيىن عەرەبى و لاتىنىدا بۇ نفىيىسينا
كوردى ھەتا نەھو راستىنۋىسەكا ئېڭگىرتى نىنە. نموونە ڙى بۇ ۋى
چەندى ھندەك نفىيىسەر پىشگەر و پاشگەر و نافگەر و ئامراز و
ئەسپېيكتىن کارى ب پەيقيە د نفىيىس و ھندەك ڙى جوداى پەيقيە
دنفىيىس، دىسان ڙى ھندەك پەيقيەن دارىتى و لېكداي پېكە دنۋىيىس
ھندەك جودا دنۋىيىس، ڙ بلى نە پېيگەرەكىرنى ب خالبەندىي. ھەلبەت
ئەف چەندە ئارىشەكا زۆرا مەزنە ج بۇ وارى پەروەردە و فيرکرنا
نفىيىسينا زمانى ل دەف قوتابىيان يان بۇ فيرخازىن بىيانى دەمى دەقىت
فيرى نفىيىسينا كوردى بىن و ج ڙى بۇ كرييارا وەرگىرەنلى يان جەڭرتنا
پەيغان د فەرەنگىن لېكسيكىدا و .. هەت.

6- دەقى قوناغىيدا ھەردوو ئەلبابىيىن عەرەبى و لاتىنى بۇ نفىيىسينا
كوردى يىن كەفتىنە ژىر كارتىكىرنا دەقۇكىن نافخۇيى، ئەقەرۇ
ھەزمارەكا نفىيىسەران ھەرەوەكى مالا خۇ يان ھۆز و بازىرەكى خۇ
دنۋىيىس، ھەلبەت زالبوون ل سەر ۋى دىياردى نەھو يَا بۆيە كارەكى
گران ئەفه ڙى بۇ وى چەندى دزفرىت كو ۋان ئەلبابىيىن ھەين
سەنتەرە خۇ يى ڙ دەستدای و ئەقەرۇ ل كوردىستانى ج دەزگەھ و
دەسەلاتىن باوەرپېيکرىيەن زمانى نىن کو ھزەكە زانستى و لۇزىكى

بەدنه نفیسەری کورد کو ئەخلاقيانه هەر ئىك ژ لايى خۆ فە
پىگىرىنى ب شىرىت و راسپاردىن وى دەزگەھى بکەت.

6 - سەرچاوهكان:

ئەمین، وريما عومەر. (2009). ئاسوئىيەكى ترى زمانەوانى. چاپخانەي ئاراسن.
ھەولىير.

ئەمین، وريما عومەر. (1982). گۇفارى كۆرى زانيارى عىراق - دەستەي کورد،
ژ (9). بەغداد.

خۇشناو، نەريمان عبدالله. (2014). دەنگسازى. ناودندى ئاودىر بۇ چاپ و
بلاوكىرىدنهوە. ھەولىير.

رسول، عەبدوللە حوسىن. (2006). رېزەد بەكارھىيانى ھەندى فۆنيم لە
نیوان كوردىي ناودراست و باكوردا. گۇفارى زانكۆ- گۇفارى زانكۆي
سەلاحەدين، ژ (27). ھەولىير.

على، بكر عمر. (2014). چەند لايەنېكى زمانەوانى. چاپخانەي هيقى.
ھەولىير.

على، بكر عمر. (2005). گۇفارى زانكۆي سلىيمانى، ژ (15). سلىيمانى.
فتاح، محمد معروف. (1982). گۇفارى كۆرى زانيارى عىراق - دەستەي کورد، ژ
(9). بەغداد.

مارف، ئەورەھمانى حاجى. (1976). زمانى كوردى لە بەر رۆشنىايى فۆنەتىكدا.
چاپخانەي كۆرى زانيارى كورد. بەغدا.

محەممەد، كسر ياسين. (2009). جياوازىيى باكارھىيىانا فۆنيمان د كوردىيى سەرى
و نافەراستدا. ناما ماستەرى. زانكۆيى دەھۆك.

موسا، عەبدولوھاب خالد. (2009). ھىز و ئاوازە لە دىيالىكتى كوردى
ژووروودا. چاپخانەي حاجى هاشم. ھەولىير.

موسا، عهبدولوهاب خالد. (2010). رەخسانىدا زىنۋىسى زمانى كوردى ب تىپىن عەرەبى. گۇفارا زانكۆيا دەھۆك، پەربەندىا (13)، ژ (2).

وديس، غازى فاتح. (1984). فۇنەتىك. چاپخانەي الادىب. بەغداد.

- Crystal, D. (2003). A Dictionary of Linguistics & Phonetics. Fifth edition.
- Roach, P. (2000). English Phonology and Phonetics. Third edition.
- Alkhuli, Muhammad Ali. (2002). English Phonology and Phonetics. Nine edition.
- Carr, P. (1993). Phonology. First published. London.
- MacKenzie, D.N. (1961). Kurdish Dialects Studies-1. Oxford Uni- Press. London.

Extended Abstract

Historical events played a big role in the fact that the Kurds still do not have an own alphabet without obstacles. If those obstacles are known to researchers and if they investigate in them and obtain cultural results, the latter can become a scientific fundament so that step by step the formal Kurdish writing can be built on.

The Kurdish language could save itself from dying and not being, but because of the circumstances the Kurds and Kurdistan had to go through it could not manage to become a general written language in Kurdistan and its regions and a language having its own culture with its own written alphabet. The result of this problem leaves the following two negative points:

Firstly, Kurds do not have a common writing culture.

Secondly, the Kurdish language has several dialects and different accents and Kurdistan is divided among multiethnic and multicultural countries that have their own native languages separate from Kurdish. All these factors lead to the loss of the identity of Kurdish people and the Kurdish language. Nowadays, in the field of Kurdish writing, whether we want it or not, we have two Kurdish alphabets. Each one of those has been used for writing for a good period of time and each one of those has its own supporters.

Each of both alphabets the Kurds have for writing, whether the Arabic or the Latin letters of the alphabet are used, has its obstacles and shortcomings that are to be shown in the following points:

1. Researches in the fields philosophy, civilization or religion with respect to the formation of an alphabet did not become the fundament that nowadays those can be used as a standard and general alphabet in the Kurdish language without obstacles. Till now, there are still contrary discussions among Kurds depending on which of both alphabets they support.

2. People speaking the southern Kurmanci dialect tried to adjust the Arabic alphabet for the Kurdish writing. Opposed to that, people speaking the northern Kurmanci dialect tried to adjust the Latin alphabet for the Kurdish language. The result was that two separate alphabets were used in two different regions; one adapted by people speaking the Sorani dialect, the other by people speaking the Kurmanci dialect. Others, like Lur, Kalhur, Hawraman or Zaza each of them joined the first or second group depending on their geographical situation or politics.

3. Most of the writers and scholars that worked in that field were under the influence of enthusiasm for their homeland, regional or personal issues when developing ideas. Opposed to that hypotheses, methods and exemplary researches were neglected when looking for a scientific solution for that problem.

4. A scientific approach to that issue:

a. Those alphabets that are given nowadays are a kind of mixture of the basic understanding of phonetic and phonology and the writing itself in it shows that both of these things are to be differentiated in linguistics.

b. Are those alphabets that are used nowadays phonetical or phonological? And which kind of those alphabets is the most suitable one for writing and why? Without a doubt those are all questions and there are lots of more questions to be asked and those questions all need to be answered scientifically. Here it is important to show that in both alphabets, being the Arabic and Latin one, we mixed the fields of phonetics and phonology.

c. Rules: In both alphabets, the Arabic and Latin one, for the Kurdish writing there are still no common rules. Examples for those are some words containing prefixes, suffixes, infixes, prepositions and some aspects of verbs that are added to a word when written but some write them separately. Another example is that some write compound and complex words together, others write them separately; there is no importance given to guidelines.

5. In this section both alphabets, the Arabic and Latin one, for the Kurdish writing are influenced by internal regions. Nowadays, several writers write like they speak in their stem or little villages. Of course, control in this field has become something very difficult and that is due to the cause that the alphabets used have given up their centers in Kurdistan.

Analîza Strana Ez Xelef im li ser Şopa Dîroka Kurdan ya Sedsala XIXem The Analysis Of Ez Xelef im Song In The Footsteps Of Ninetenth Century Of Kurdish History

Nurdan ŞARMAN**

PUXTE:

Ji ber ku di dîroka Kurdan de zargotina Kurdî, nemaze muzîka Kurdî, çavkanîyeke girîng e, xebatêni di vî warî de dikarin di gelek xalêni dîrokî de bibin rênîşaner. Li ser vê xetê strana *Ez Xelef im* a bi nav û deng -herçiqas derheqê jêderâ stranê de em ne xwediyê agahdariyên dorpêc û eseh bin jî- dikare di gelek waran de sedsala XIXem ronî bike û derfeta lêpirsînên taybet bide destê me. Nirxandina vê stranê dê di nav şert û mercen sedsala XIXem de nerînên me fireh, asoyêni me geş bike û çend versiyonên vê stranê dê deriyê xwendinên cuda li ber me veke. Lewre ev stran xwediyê rîtim û naveroke-ke wisan e ku dikare atmosfera sedsala 19mîn a Kurdistanê ya şeran, ya geşandinên politîk ku di dîroka Kurdan de bûne sedemên geşandinên girîng bide ber çavan. Ku bi nîrinez din mirov vê stranê bide ber xwe ev yek hem dê derfet bide ku mirov li geşandinên Kurdistanê yên ku din nav dîroka nivîskî

Ez ji Abdulhekîm Kartal û Mirza Baran re spas dikim ku di sererastkirina nivîsa Kurdî de ji min re bûn alîkar.

**** Wanebêj, Zanîngeha Şîrnexê,
Dibistana Bilind a Tûrîzm û
Kargeriya Otelkariyê, Şîrnex,
Turkiye.**

Lecturer, University of Sirnak, School
of Tourism & Hotel Management,
Sirnak, Turkey.

e-mail: nurdanurek@gmail.com

Bêjeyêne sereke: “Ez Xelef im”, sedsala XIXem, serhildan, berxwedana Êzdînşêr, Şêx Ubeydullah.

ABSTRACT:

Kurdish oral culture especially Kurdish traditional music has a great of importance as being a source of Kurdish history. In this sense, *Ez Xelef im* song as being one of the popular representative of Kurdish folk song is a oral source to clear and examine the nineteenth century of Kurdish history although there isn't any certain information about its meaning. To handle this song with developments of nineteenth century of Kurdish history will provide both having a new historical outlook about that said times and having various evaluations about the meaning of song. *Ez Xelef im* song which has a epic meaning in Kurdish verbal memory is a reflection of that moving period of nineteenth century Kurdish history. Because this song almost has a rhythm and content that reflect the wars, political and politics development in Kurdistan during nineteenth century. From another angle this song also has a lot of hints which provide thinking about developments never handled by written history of Kurdistan and provide evaluating some events and persons which registered to written history by a non-objective way with a new perspective.

Keywords: "Ez Xelef im", nineteenth century, uprising, resistance Êzdînşêr, Shaykh Ubeydullah.

1. DESTPEK

Bi sedem ku Kurd li ser dînamîkên xwe di merheleyê neteweyê din re derbas nebûbûn, piştî şerê cîhanê yê yekem zêdetir mehkûmî rewşike parçebûyî bûn. Dema înkarkirina nasname, pişaftin, zilm û koçberiyê jî bêñ hesibandin, "folklo-ra Kurdi" an jî "çanda devkî" bi taybetî jî muzîka Kurdi, di parastina nasnameya Kurdan a neteweyî de, bû xwediyyê roleke sereke. Şêweya jiyana Kurdi, guherînê civakî û zaravayê cuda tev jî şewqa xwe dane vê çanda dewlemend û cure bi cure, nifş bi nifş hatine neqilkirin. Bi saya zargotinê ev yek nifş bi nifş gîhiştiye heta roja me; em ji vê çanda dewlemend û qedîm bêpar nemane. Tiştên qewimîne gelek ji wan bi riya muzîkê di hafizeya hevpar de cih girtine. Bi vê yekê em dikarin bibêjin muzîka Kurdi bi tena serê xwe kevneşopî, mîrateya bav û kalan, talan û bûyerên dîrokê tomar kirine; ragihandine ber destê me (Çelebi û yên din, 2006). Strana *Ez Xelef im* jî li ser van asasan nimûneyeke xurt û populer a zargotina Kurdi ye. Kê ci wextî, bi ci awayî, bi ci sedemê ev stran gotiye em nizanin. Li ser vê yekê şîroveyê cuda hene, lêbelê dîsa jî mirov bi hêsanî dikare bibêje ku ev stran gelek şopên xurt ji sedsala XIXem di nav xwe de dihewîne. Sedem vê yekê beriya şîrovekirin û analîza vê stranê hewce ye nerînê rûniştî yên derbarê sedsala XIXem bêñ veçirandin. Ev demajo di heman demê de, di warê hin kêmasî û şaşiyê di berhemê nivîskî yên

derbarê dîroka Kurdan a sedsala XIXem de û di warê nêrînên cuda li bûyer, qewimîn û şexsiyetê serdemê de lêpirsînekê jî bi xwe re tîne. Ev yek girîngiya strana *Ez Xelef im* bi awayekî dîrokî zêdetir dike.

Di navbera sedsala XVIIIem û XIXem de li dinyayê gelek bûyerên ku rasterast an bi navgînî, bandorên xurt li çarenûsa gelê Kurd kirine qewimîne (Lazarev û Mihoyan, 2013: 105). Strana *Ez Xelef im* wek berhemeke dîroka devkî bi me dide xuyakirin ku di seranserê sedsala XIXem de atmosfera Kurdistanê dibe warê serhildan û berxwedanan¹.

- 1 Li hemberî van kesan ku dibêjin piraniya tevgerên Kurd ên sedsala XIXem netewî û serxwebûnxwaz bûn, hinek angaştên din jî hene. Li gorî van angaştan serhildanê Kurd ên sedsala 19emîn ji hişmendiyek xwerû netewî bêpar bûn û ya rastî tevgerên vê pêvajoyê xwedan daxwazên otonomiyê bûn. Ji ber ku di vê xebatê de armance se-reke ew bû ku derbarê dîroka stranê û wateya wê de çend angaştan pêşniyaz bikim, ez bixwe qet neketim nav nîqaşen kûr ên derheqê netewîbûn an ne-netewîbûna tevgerên Kurd ên sedsala 19emîn. Lîbelê tezên ku min ev stran bi tevgerên wê serdemê re dan ber têkiliyê, bi saya hin angaştan hatin qewînkirin ku wan angaştan jî tevgerên Kurd ên sedsala 19emîn wek tevgerên netewî qebûl dikirin. Wadie Jwaideh di xebata xwe ya “Dîroka Neteweperweriya Kurdi” de destnîşan dike ku serhildanê Kurd ên curbecur ên di sedsala 19emîn û di destpêka sedsala 20emîn de dest pê kirin, ne bûyerên munferît bûn ku bi tenê jî ber têkçûneke aborî an jî bêmemnûniyeteke siyasi çêbûn (Jwaideh, 2014). Hassanpour dibêje, “Şeran û parçekirina Kurdistanê li ser gesedana netewî ya Kurdan du bandorên sereke, lê dijber derxistin holê. Wan ji hêlekê ve rê li ber Kurdistanê yekbûyî digirtin. Ji hêleke din ve jî rê didan ku ligel herifandin û zilman wek encama serdestiya biyaniyan, hişmendiyek netewî ava bibe di nav civatekê feodal de ku endamên wê li hemberî malbat, eşîr û warê bav û kalan dilsoz bûn. Xuya ye, netewe û neteweperwerî ku di sedsala 17emîn de li wan deverên dinyayê anakronîzm bûn, di nav şert û mercên taybet ên li Kurdistanê de geş bûn. Hestên neteweperweriyê ku bi eslê xwe ji bendên eşîr û herêmî cuda bûn hem ji hêla takekesan û hem jî ji girseyên civatê hatin derbirîn. Bêguman gelek serhildanê mîrîn Kurd ên li dij serdestiya biyaniyan xwedan armanceke tenê bûn: Parastina desthilatiya xwe ya xweserî ku ji bav û kalan ve ji wan re maye. Qasî ku em ji kêm çavkaniyan dizanin, “Kesên ku rêberiya van serhildanê li dijî serdestiya biyanî kirine mîr û beg bûn ku ji dêvla tevahiya Kurdistanê an jî hin beşên wê hema tenê axa xwe diparastin.” (Hassanpour, 2005: 127,128, 129). Hassanpour, ji ber ku di navbera neteweperweriya çîna navîn ya serdema me û neteweperweriya wê demê de tevlîheviyek çênebe vêya wek neteweperweriyek feodal bi nav kiriye. Veguhastina neteweperweriya Kurdi bo neteweperweriya çîna navîn di îdeolojiya netewî ya Hacı Qadîrî Koyî (1817-1897) de xuya dibe. Koyî li ber rêberên arîstokrat ên kevneşopî û çîna ruhbanê radibû û bo avakirina dewleta Kurd bangî xelkê dikir û ji bo wê armancê jî propagandaya karanîna wêjê û zimanê Kurdi jî dikir (Hassanpour, 2005: 131). Pêvajoya ku cara duyem bi parçekirina Kurdistanê dest pê kir (1918) -Kurdistan di nav pênc dewletan de tê dabeskirin û desthilatiya dewletê di her deverê herêmê de belav dibe- rê li ber yekitiya etnik a gelê Kurd girt (Hassanpour, 2005: 135).

Em ê di vê xebatê de strana *Ez Xelef im* li ser pênc xalên cuda rave bikin. Şiroveyên li ser naveroka stranê hemî subjektîv in û hinek ji wan li ser şopa îhtimalan dimeşin. Jixwe armanca min ew e ku ev strana ku hinekî atmosfera sedsala 19mîn dide der, li ser nêrinê seksiyetên girîng ên wê demê hin qenaetên berdest biguherîne. Di şirove û nirxandina stranê de me hem ji kelepora nivîskî, hem jî ji ya devkî û rîwayetên nav gel sûd girtiye (bi gelempêri riwayetên li herêma Botan)². Beriya ku em derbasî dahûrandina stranê bibin divê bi gelempêri em li ser şert û mercen sedsala XIX'em bisekinin.

2. DI SEDSALA XIX'EM DE REWŞA KURDISTANÊ YA GELEMPERÎ

Kurdistana ku cara yekem bi Şerê Çaldiranê (1514) ketibû bin deshilatdariya dewleta Osmanî, bi peymana Qesrê Şîrînê (1639) ku sînorênen dewleta Osmanî û Îranê diyar dikir, hema bêje bi tevahî daxilî erdê Osmanî bû. Kurdistan wek berê –digel peymana navborî jî- salêni pey jî di navbera Osmanî û Îranê de ji ber şerê tixûban bû qada şer. Herçiqas tixûbênen fermî yêni di navbera van dewletên mezîn ên navborî de li cem Kurdistaniyan ne xwedî hikmekî resen bû jî, her du dewletan jî baca uşirê bi darê zorê ji Kurdistaniyan hildigirt, bi kotekî Kurdistanî ji xwe re dikirin leşker. Bi ser vê yekê jî, Kurdistaniyan heya sedsala XIXem karîbûn bi awayekî xweser bijîn.

Rojhilata Nêzik û ya Navîn ji dawiya sedsala XVIIIem heta serê sedsala XI-Xem pê ve dibû qada şerînen dewletên mêtînger. Dewleten mêtînger wek Rûsyâ, Almanya, Brîtanya, Frensa û piştre Awistirya di navbera xwe de plana parvekirina dewleta Osmanî dikirin ku roj bi roj lawaz dibû, hilwedişa. Ji aliyekî din, têkoşînênet rizgariyê yêni neteweyî -ji bilî neteweya tirkân- yêni gelên din ji bo van berjewendiyêni xwe bi kar dianîn, her diçû tehekuma xwe xurt dikirin (Lazarev û Mihoyan, 2013: 107). Rûsyâ di sedsala 19an de çar caran li hemberî dewleta Osmanî, du caran li hemberî dewleta Îranê şer kiribû û di destpêka van şeran de Kurd li dijî Rûsyayê derketibûn, piştre bi piranî xwe dabûn pişt Rûsyayê.³

-
- 2 Ji ber dîroka nivîskî ya Kurdan hatiye manîpulekirin û sedem vê yekê ku Kurd şexsiyetên xwe yêni dîrokî û dîroka xwe di çarçoveyeke “emîk” de dinirxînin ev riwayet girîng in.
- 3 “Didema seferên artêşa Rûsan ên bi ser Tirkiyeya rojhilat û Îrana rojava de, fermandarêni Rûsyayê bi Kurdan re têkiliyeke wisa danîne ku Kurd tenê bibin hevalbendê wan an jî qet nebe bêalî bimînin. Nikare bê gotin ku Rûsyayê piştgirî dida Kurdistaneke serbixe, lê digel her tiştî, wekî encama siyaseta Rûsyayê ya li ser rojhilata-nêz a di sedsala 19mîn û destpêka sedsala 20mîn de, hilwesîna leşkerî û siyasî ya Osmanî û Îranê leztir kiriye, ev bûye alîkarî ji bo çêbûn û hêzdarbûna tevgera rizgarî û netewî ya Kurd” (Lazarev ve Mihoyan, 2013: 107).

Di vê serdemê de ji bo Kurdan xaleke girîng jî ew e ku di salêن 40 û 60î ên sedsala XIXem de şah û paşayên hikûmeta Îran û Osmanî dezgehêن idarî û politîk yên kevn li ser şopa dewletêن ewrûpî guhaztine, yeknavendî xurt kirine, bi reformêن jako-ben tevgeriyane heyâ ev yek di nav Kurdan de bûye sedema gengeşî û nexweşîyan (Lazarev û Mihoyan, 2013: 136).

Wek encam ji sedsala XIXem pê ve dewleta Osmanî û Îran ku hem bi hev re hem jî bi Rûsyayê rê di nav şer de bûn, li aliyekî jî dixwestin û hewl didan ku mîrektiyêن Kurdan yê ber bi rizgariyê ve diçûn kontrol bikin. Di vê qada şerê giran de li ser axa Kurdistanê ji çaryeka pêşîn ya sedsala XIXem heyâ ya dawî, Kurdêñ ku hem dixwestin rizgar bibin, hem jî dixwestin ji bandorêñ neyînî yên van reformêñ dawî xilas bibin û ji ber vê mebestê jî li ser hev gelek caran serî rakirine, ji teref dewleta Osmanî bi awayekî hovane hatine tepisandin. Ev serhildan roj bi roj ber bi tevger û fikreke neteweyî ve diçû, her yek ji ya pêşîn berfirehtir, mezintir dibû (Lazarev û Mihoyan, 2013; Kutschera, 2013; Hassanpour, 2005).

3. STRANA EZ XELEF IM Û ANALÎZA WÊ

Mirov dikare strana *Ez Xelef im*, ku yek ji stranêñ Kurdi yên navdar e, wek straneke epik û anonîm binirxîne. Strana *Ez Xelef im* ku hema bêje li hemû herêmêñ Kurdistanê hem ji aliyê Kurdêñ sunnî hem ji aliyê yên din tê zanîn -wek minak Êzidî, hwd.- xwedîyê govendeke taybet e ku li gorî herêman versiyonêñ vê govendê jî hene. Herçiqas cara yekem kê gotiye, sedema gotina vê stranê çi ye, em xwedî agahdariyêñ teqez nebin jî ev stran ji paletiyê bigire heyâ cejn û rojêñ taybet bi aweyekî coş hatiye gotin.

Strana *Ez Xelef im* ku bi ihtiimal ji helbesteke dûrûdirêj hatiye girtin, gelek rêzikêñ wê ne berdest in û çend hevok û rêzikêñ wê jî di stranê de nayêñ xwendin. Lewma em hay ji halê wê yê resen nînîn.⁴ Di rêzik û fonetîka stranê de li ser şîroveyêñ dengbêj û stranbêjan li gorî herêman hin cudatiyêñ piçûk hene. Li jêr çend versiyonêñ stranê hatine rêzkirin.

4 Gorî riwayetêñ mirovekî ji Botan ku ji pîr û kalê xwe bihîstiye, ev stran di rastiya xwe de 25 çarîn bûye, piştre 17 çarîn ji teref hin kesan hatiye nivîsîn, çar pênc çarînêñ stranê jî, ji teref dengbêj û stranbêjan hatine bestekirin. Derbasbûna helbestê li bal stranê ve di navbera salêن 1840 û 1847an de ye. (Ev riwayet ji navnîşana vê malperê û ji belgefîlma *Ez Xelef im* hatiye girtin. <http://www.cizremedy.com/cizira-botan-ez-xelefim-xelefim--120v.htm> (Cizîra Botan - *Ez Xelef im Xelef im*)).

EZ XELEF IM(1)

Ez xelef im
 Hawar e Mîr hawar e Mîr
 Hawar e lo!
 Ez xelef im xelef im
 Êzdînşêr begê Botan e
 Xweyê şûrê sedef im
 Hawar e Mîr hawar e Mîr
 Hawar e lo!
 Xweyê şûrê sedef im
 Êzdînşêr begê Botan e
 Gel eşîra bixwendeme
 Hawar e Mîr hawar e Mîr
 Hawar e lo!
 Gel eşîra bixwendeme
 Êzdînşêr begê Botan e
 Ez xelefê bi şîvî me
 Hawar e Mîr hawar e Mîr
 Hawar e lo!
 Ez xelefê bi şîvî me
 Êzdînşêr begê Botan e
 Xweyê şûrê bi zîvî me
 Hawar e Mîr hawar e Mîr
 Hawar e lo!
 Xweyê şûrê bi zîvî me
 Êzdînşêr begê Botan e
 Gel eşîra bi hêvî me
 Hawar e Mîr hawar e Mîr
 Hawar e lo!
 Gel eşîra bi hêvî me
 Êzdînşêr begê Botan e
 Herbolê xweş Herbolê
 Hawar e Mîr hawar e Mîr

Hawar e lo!

Herbolê xweş Herbolê
 Êzdînşêr begê Botan e.
 Bi gumguma daholê
 Hawar e Mîr hawar e Mîr
 Hawar e lo!
 Bi gumguma daholê
 Êzdînşêr begê Botan e.
 Xweş şer e li qeleqolê
 Hawar e Mîr hawar e Mîr
 Hawar e lo!
 Xweş şer e li qeleqolê
 Êzdînşêr begê Botan e.
 Hewrexê xweş Hewrexê
 Hawar e Mîr hawar e Mîr
 Hawar e lo!
 Hewrexê xweş Hewrexê
 Êzdînşêr begê Botan e.
 Bumba bavên Gemrexê
 Hawar e Mîr hawar e Mîr
 Hawar e lo!
 Bumba bavên Gemrexê
 Êzdînşêr begê Botan e.
 Meş em herin ser Şernexê
 Hawar e Mîr hawar e Mîr
 Hawar e lo! (Bafi, 2005: 170-172)

EZ XELEF IM(2)

Ez xelef im, xelef im
 Hewar e mîro hewar e,
 Ez xelef im xelef im
 Ezdînşêr mîrê Botan e
 Xwedîyê şûrê bî sedef im

Hewar e mîro hewar e
 Xwedîyê şûrê sedef im
 Ezdînşer mîrê Botan e
 Li nav eşiran bi gef im
 Hewar e mîro hewar e
 Li nav eşiran bi gef im
 Ezdînşer mîrê Botan e
 Ez xelefê kinik im
 Hewar e mîro hewar e
 Ez xelefê kinik im
 Ezdînşer mîrê Botan e
 Xwedyê şûrê bi şîrik im
 Hewar e mîro hewar e
 Xwedyê şûrê bi şîrik im
 Ezdînşer mîrê Botan e
 Li nav eşiran bi rik im
 Hewar e mîro hewar e
 Li nav eşiran bi rik im
 Ezdînşer mîrê Botan e
 Ez xelefê şûvî me
 Hewar e mîro hewar e
 Ez xelefê şûvî me
 Ezdînşer mîrê Botan e
 Xwedîyê şûrê Misrî me
 Hewar e mîro hewar e
 Li nav eşiran bengî me
 Ezdînşer bege Botan e
 (Cigerxwîn, 1988: 22-23).

Êzdînşer mîrê Botan e
 Xwedîyê şûrê bisedef im
 Hawar e mîr hawar e mîr
 Xwedîyê şûrê bisedef im
 Êzdînşer mîrê Botan e
 Nav eşiran bigef im
 Hawar e mîr, hawar e mîr
 Nav eşiran bigef im
 Êzdînşer mîrê Botan e
 Ez xelef im xelef im
 Hawar e mîr, hawar e mîr
 Ez xelef im xelef im
 Êzdînşer mîrê Botan e
 Ez xelefê kinik im
 Hawar e mîr, hawar e mîr
 Ez xelefê kinik im
 Êzdînşer mîrê Botan e
 Xwedîyê şûrê bişirik im
 Hawar e mîr, hawar e mîr
 Xwedîyê şûrê bişirik im
 Êzdînşer mîrê Botan e
 Nav eşiran birik im
 Hawar e mîr, hawar e mîr
 Nav eşiran birik im
 Êzdînşer mîrê Botan e
 Ez xelef im xelef im
 Hawar e mîr, hawar e mîr
 Ez xelef im xelef im
 Êzdînşer mîrê Botan e⁵

EZ XELEF IM(3)

Ez xelef im xelef im
 Hawar e mîr, hawar e mîr
 Ez xelef im xelef im

5 Versiyona herî belavbûyî ya vê stranê ev e.

Ev beşa xebata me, ji vir pê de li ser riya çend pirsan, analîz û armanca gotina vê stranê dihewîne. Ev serpirsên ku dikevin pey îhtimalên nirxandinên cuda li jêr in.

Gelo Kilama Ez Xelef im meydanxwestina Xelefê Şûvî ye ji Êzdînşêr (Yezdanşêr)?

Baweriyeke mezin heye ku di vê kilamê de Xelefê (Xelefê Şûvî) axa, serok an ji rêberê eşireke bi navê Şûvî, ji Mîr Êzdînşêr meydan xwestiye û mîr gazî şer kiriye. Yek ji wan kesên ev kilam gotine Şivan Perwer e û ew di destpêka kilamê de behsa çirokeke ku hêz bide vê baweriyyê dike. Di destpêka kilamê de Perwer “Çiroka me di derbareyê Xelefê Şûvî û Êzdînşêrê mîrê Botan de ev e.” dibêje û bi devê Xelefê Şûvî wiha diqire: “Wa Êzdînşêr! Mîrê Botan! Ka kê piştä xwe spartî Romiyan e? Tu dibêjî Xelef ditirse ji meydan e. Ka were em iro dekê xwe li hev bidin. Emê bibinîn kî berx e, kî beran e!” Piştî vê, Perwer dibêje ev şerê ku di navbera pêşengerekî Botan Xelefê Şûvî û Mîrê Botan Êzdînşêr de dibe, şerê birakuijîye ye; dema Kurd bi Kurd re şer bike Osmanî/Tirk ji vê rewşê qezenc dikin û dûre dest bi gotina kilamê dike.

Eger em li ser rewşa cezakirina kesên li hember deshilatdariya Êzdînşêr derdi-kevin bifikirin, îhtimala meydanxwestina serokê eşirekê yê bi navê Xelefê Şûvî li hember Mîr Êzdînşêr geleki zêde ye. Di kilamê de hebûna kesekî ku her dem behsa nav û hêza xwe dike û çavê yê hemberî xwe ditirsîne vê îhtimalê zêdetir dike. Lê di kilamê de îhtimaleke din heye ku Xelefê Şûvî li hember Mîr Êzdînşêr meydanê dixwaze. Sedemên vê îhtimalê ji ev in: Heke Xelefê Şûvî li hember Êzdînşêr meydanê dixwaze û gazî şer dike, çima dibêje “Êzdînşêr mîrê Botan e.” Çima bi pesindarî dibêje “Êzdînşêr mîrê Botanê ye”? Heke Xelefê şûvî biqîriya an ji xîtabî Êzdînşêr bikira, diviya ku hevok bi qertafa tewangê (-ê) biqedîya.⁶ Yanê diviya ku hevok weki “Êzdînşêr mîrê Botanê” bûya. Di vê rewşê de yan bi demê re “ê” bûye “e”, yan ji Xelefê Şûvî meydanê naxwaze û berevajî leqeba wî weki pesindayînekê tîne zimên. Aliyekî din, Xelef çima wî kesî gazî şer dike û meydanê dixwaze; di heman demê de ji dibêje “mîr hawar e” û jê alîkarî dixwaze? Di kilaman de bêyi li wateya wan bêñ nêrîn hin peyv û banesân îhtimal heye tenê ji bo qafiyeyê hatibin bikaranîn û îhtimal heye bi demê re guherîna dengan ji pêk hatibe. Mînak dibe ku “mîr hawar e” di rastiya xwe de “mîr ha were” be û bi demê re guherîbe. Yan ji dibe ku rastî “min hawar e” be û bi demê re bûbe “mîr hawar e”. Em werin li ser gotinên Şivan Perwer ên derbarê kilamê de. Em dikarin bibêjin Şivan Perwer bi gotinên xwe yên di serê kilamê de dixwaze balê bikişe li ser şerên biratiyê yên bûne sedemek ji bo têkçûna serhildanêñ gelê Kurd û serekêñ Kurdan ên sedsala 19mîn.

6 Hema bibêje hemû versiyonên devkî û nivîskî yên vê kilamê de ev rês pênaseya rewşa cihê Êzdînşêr dike. Yanê dawî bi “e”ya lêkera alîkar diqede ne ku bi “ê” ya qertafa tewangê.

Li vir em kevanekê vekin û bibêjin: Ji Xelef re Şûvî tê gotin, wekî serekê eşirekê be. Di çarçoveya vê xebatê de, li herêma Botan ne di rîwayetên nivîskî de ne jî di agahiyên wan kesên derbarê vê kilamê de axivîne, behsa Xelef û eşireke bi navê Şûvî nayê kirin. Di vê rewşê de du ihtimal çedibin: Heke em Xelef wekî kesekî qebûl bikin, wê demê dibe ku Şûvî leqeba wî be, ne ku navê eşirê be; yan jî Xelef ne navê kesekî ye.

Di hin gotegot û şîroveyên derbarê kilamê de dibêjin ku Xelef ji ber îxaneta li Mîr Bedirxan kiriye ji Êzdînşêrî aciz dibe, jê meydan dixwaze û gazî şer dike. Êzdînşêr bi Osmaniyan re peymanê girê dide û di encama vê de ku dibe sedema dilketina rîbereki wekî Mîr Bedirxan bi hêz; wekî rewşike jirêzê serekên aligirên Mîr Bedirxan li dij desthilatiya Êzdînşêr derketine. Ev ihtimal were hişê mirov jî, ji ber ku Xelef di kilamê de tenê behsa hêza xwe kiriye û behsa Mîr Bedirxan nekiriye, ihtimaleke lawaz e. Îhtimala ku rêzên behsa Mîr Bedirxan dikin negihîştibin ber destê me hebe jî, şîroveya ku Xelefê Şûvî ji ber îxaneta li hember Mîr Bedirxan ji Êzdînşêr hêrs bûbe û ew gazî şer kiribe zêde maqûl naxuye.

Cigerxwîn jî di berhema xwe ya bi navê *Folklorâ Kurdî* de dibêje Xelef navê kesekî ye. Lîbelê Cigerxwîn wekî meydan xwestina Xelef li hember Êzdînşêr şîrove nake. Cigerxwîn derbarê kilamê de wiha dibêje: “*Di vir de, Xelef, navê xwe û şûrê xwe û mîrê xwe û hinek jî ji pesnê xwe dane xuyakirin. Çawa, ko navê eşira xwe ji jî me re daye xuyakirin. Ji lewra, ev (Xelef) ji eşira Şûva ye, ko di bin destê mîrê Botan de ye. Çawa, ko em zanîn, ko navê mîrê Botan jî, di ve çaxê de Êzdînşêr bû yan jî Şerezdîn. Herweku dide zanîn, ko di wê çaxê de, kalanê şûrênen xwe sedef dikirin û şûrênen Misri, Kolmisri gihiştibûn Kurdistanê. Ev dîlok di ber dîlanê re tê gotin û bi giranî vê dîlokê dibejin û davêjin berhev û li hev vedigerînin û govend milê rastê diçe*” (Cigerxwin, 1988: 23). Di çarçoveya vê şîroveya Cigerxwîn de, dema Xelef behsa xwe û hêza xwe dike, pê re behsa mîr jî dike û dibêje: “Êzdînşêr Mîrê Botan e.” Belkî bi niyeta fîkrîn ku ew xwe hevberê mîr dibîne, hetanî xwe ji wî bihêztir dibîne, pêşî lê bigire dibêje. Belkî jî mirov dikare bibêje di şertên wê demê de navê mîran û kirinên wan di neqeratên stran û kilaman de wekî bikaranîneke giştî bûye.

Dema mirov van nirxandinan tevan bide ber çavê xwe, mirov dikare bibêje ku baweriyên derbarê wateya vê kilamê de mutleq ne rast in. Yanê mirov dikare bibêje ihtimal hene ev kilam ne derbarê şerxwestina Xelefê Şûvî be û Xelef jî ne navê kesekî be. Bi vê sebebê di bin sernivîsên pirsên li jêr, wateyên di vê kilamê de tênehlîlkirin.

Di piraniya van sernivîsên pirsî de, bi awayekî ji bo Êzdînşêr têkiliyên bihêz tênehlîlkirin. Di serî de divê em kevanekê vekin. Sebebê van çavkaniyan û sebebê

kêmbûna têkiliya kilamê bi lehengiya Ezdînşêr ve, kêmasiyên wê û rola kilamê ya di vegotina kesekî wekî Êzdînşêr ê dîrokî de çi ye, em behs bikin.

Sebebê bingehîn a şîrovekirina her wekî kilam behsa qehremaniya Êzdînşêr dike belkî ji ew e ku Êzdînşêr bi Osmaniyan re peyman girê daye û li hember kesekî wekî Mîr Bedirxan ku di dîroka Kurdan de gelek girîng e, derketiye. Yanê ev kilam di nava Kurdan de wekî merşâ serkeftin û qehremaniyê tê gotin, divê ihtimala pesindayîna kesekî wekî Êzdînşêr ku rola ixanetê jê re tê dîtin, zêde bi mantiqî lê neyê nêrîn.

Neteweyekî wekî Kurdan ku dîroka wan bi destên kesan -bêyî objektîviyê- hatiye nivîsin, dema ku dîroka xwe dinirxînin car caran van agahiyên tewş û çavkaniyên nerast ji xwe re çavkanî digirin û dikevine şaşiyê. Kurd (an jî kesen li ser navê wan diaxivin û dinivîsin) dema kesekî dîrokî an bûyerekê bi nêrîneke nûjen dinirxînin û pirsyar dîkin dikevine şaşiyeye civakî û encameke wisa derdikeye ku hin ji dîroka Kurdan û hin kesen dîrokî rast neyên famkirin. Va ye qurbanekî vê şaşiya dîrokî û civakî kesekî di dîroka Kurdi de jî Êzdînşêr e. Rola neyînî ya dîrokî (xayîn) ku li Êzdînşêr hatiye barkirin, bûye sebeb ku ew kesê girîng neyê dîtin û neyê nasîn. Di pirtûkên behsa sedsala 19mîn dîkin an jî ev serdem jî tê de diborin de navê Êzdînşêr yan bi kurtî dibore yan jî qet nabore. Di çavkaniyên ji bo Kurdan hatine nivîsin de jî kesekî nezan, sexiyekî çavşor, rîberekî sexik, hetanî ku rastî jî kesekî xayînê doza Kurdîtiyê ye. Di pirtûkên dijî Kurdan hatine nivîsin de, arşîvên Osmanî û İngilizî de jî, begekî jirêzê ye yan jî digel ku rehetiya wî û gelê wî di cî de bûye, ew rehet nesekiniye û bûye rîbirekî belayê serê Osmaniyan.

Di dîroka devkî an jî hafizeya herêmê de gelek caran, (bi taybetî gelên ku dîroka wan a nivîskî tune an jî ya heyî jî bi awayekî derewîn hatiye nivîsin) çavkaniyên gelekbihêz tênen dîtin. Dîroka nivîskî gelek caran girîngiyê nadî van çavkaniyan û davêje aliyekî. Lîbelê li gorî Pierre Norayê “*Hafize her dem wekî qewimîneke rojane me bi dema bêdawî ve girê dide; dîrok jî tenê nûnertiya paşerojê ye. Dîroka ku bi xwe şîroveyeke rewşenbîrî, sekuler û pevxistî ye, wekî dij hafizeyê, gotareke rexneyî ye. Dîrok her dem ji hafizeyê şikê dike û ji ber vê jî peywira rastî ya dîrokê dewisan-din û tunekirina hafizeyê ye.*” (Nora, 1989: 8-9). Bi hemû berhemên objektîv ên li ser Êzdînşêr hene -ku ne zêde ne jî- û şopêñ derbarê wî yên di folklora Kurdi de jî mirov bigire destê xwe, girîngiya Êzdînşêr a di dîroka Kurdi de rastir dikare derîne holê. Ev dê bibe sebeb ji bo lêvegerandina rûmeta Êzdînşêr. Mimkin e di hafizeya devkî de mirov bi işaretên qehremanî, wêrekî û rîezdariya Êzdînşêr re têkildar gelek efsaneyan bibîne. Beşek ji van efsaneyan di şîroveyên derbarê wateya kilama *Ez Xelef im* de diborin. Beşek ji efsaneyen derbarê cih û wateya kilama *Ez Xelef im* a di bîra Kurdan de (yanê baweriya ku ev kilam derbarê qehremanî û şerkeriya Êzdînşêr

de ye) didin nîşan ku cih û wateya wê di hafizeya Kurdan de gelek girîng e. Hinek efsaneyên di vê mijarê de wiha ne:

“Biraziyê Bedirxan Êzdîn hebûye. Êzdîn kesekî pir jêhatî û şervanekî baş bûye. Mezinên me digotin Êzdîn fermandarê artêşa Bedirxan bûye. Dema Êzdîn diçû şer, digot: ‘Ez Êzdîn im, ez şêrê mîrê Botan im.’ Elî çawa şêrê Xwedê ye Êzdîn jî şêrê mîr bûye.” “Şerekî sultanê Osmaniyan hebûye û kesekî nekaribûye li hember wî destê xwe bavêje simbêlê xwe. Rojekê Êzdîn rasî vî şêrî tê, destekî xwe avêtiye simbêlê xwe û destekî jî daniye ser şûrê xwe û awirekî tûj avêtiye şerî. Şêrî ji tırsan bi xwe de rîtiye. Ji ber vê wêrekiya wî jê re şer hatiye gotin; yanê bûye Êzdînşer.” “Sultanê Osmaniyan du malbatêñ xanedanî (yek malbata Silêman Beg, a din jî malbata Evdal Beg) ji Botanê sirgûnî Zoqeydê (niha gundekî Misircâ Sêrtê ye) kiriye. Li Zoqeydê paşayekî zalim ê Osmaniyan bi navê Fettah Paşa hebûye. Fettah Paşa rojekê erîşî Evdal Beg kiriye. Evdal Beg xeber ji Êzdînşer re şandiye û jê alikarî xwestiye. Êzdînşer hatiye alikariyê, Fettah Paşa kuştîye û ji kelhê avêtiye jêr. Paşê jî ji bo bide nîşan ku ji Osmaniyan natirse, gotiye ez ê li vir tiştekî biçînim û heta şîn bibe bi derekê ve naçim. Mirov şînbûna tiştekî çandî bide ber çavê xwe, tê famkirin ku Êzdînşer xwestiye bide nîşan ku ji Osmaniyyêner werine tolhildana Fettah Paşa, natirse. Ev jî delîla wê ye ku ew çiqas rîberekî bêtirs û wêrek bûye.”

Rîwayeteke derbarê Êzdînşer a di pirtûka Dîroka Kelepora Mîrnişîniya Botan⁷ de jî dîsa nîşaneya wê ye ku Êzdînşer di hafizeya herêmî ya Kurdî de xwediyê nasnameya şervanî û wêrekiyê ye û di heman demê de kesekî adil e. Ev rîwayet jî bi kurtî wiha ye:

Dema Êzdînşer heft salî bûye bavê wî Sêvdîn wefat dike. Piştî vê, mamê wî Bedirxan xwedîkirina Êzdînşer digire ser xwe. Êzdîn di nava zarên gund de her dem kesekî rîber bûye. Zarok tev di bin emrê wî de ne û lîstikan piranî Êzdînşer bi rê ve dibe. Dîsa rojekê zarokên gund di bin rîbertiya Êzdînşer de bi hespêñ xwe yên darîn lîstika şer lîstibûne. Mîr Bedirxan di wê navberê de bi pêşengêñ Botan re di civînekê de bûye. Êzdînşer ji artêşa xwe ya ji zarokan re gotiye “istîqamet civîn e” û li pêş Êzdînşer li paş zarok bi hespêñ xwe yên darîn daketine odaya civînê. Kesên di civînê de li hember vê bûyerê heyirî dimînin û dikenin û paşê Mîr Bedirxan ji Êzdînşer dipirse: “Ka bibêje tu û artêşa te hûn ci dixwazin?” Êzdînşer gotiye “Mîrê min ez fermandarê vê artêşê me û leşkerên min birçî ne. Ez ji wan re xwarinê dixwazim.” Bi fermana Mîr Bedirxan ji zarokan re xwarin hatiye anîn û wan jî zikê xwe

7 Ev pirtûk ji aliyê Mele Xelefê Bafî ve hatiye berhevkirin û eslê wê ji rîwayetên destxetî yên Erebî pêk tê. Di sala 2005an de pirtuk ji aliyê Dîlawer Zengî ve ji bi tîpêñ latînî ji nû ve hatiye çapkirin (Bafî, 2005).

têr kirine. Piştî vê, Êzdînşêr ji mamê xwe Mîr Bedirxan re gotiye leşkerên Mîrektiya Botan li hember dijmin kêm in û ji vir paş de ez ê artêşa xwe bigihînim, lê ji bo vê jî ihtiyyaca min bi pereyan heye. Li ser vê Mîr Bedirxan gotiye tu dikarî baca eşirekê ji bo ihtiyyaca artêşa xwe bicivînî. Êzdînşêr artêşa xwe hildaye çûye mala axayê vê eşîrê. Lêbelê axa feqîr bûye û gotiye ji bilî dîkekî nikare tu tiştî bide wî. Êzdînşêr ev dîk qebûl kiriye û di rê de bi leşkerên xwe yên zarok dîkî dide rûçikandin. Dema Êzdînşêr digihîje ba Mîr Bedirxan, mîr jê pirs kiriye ka baca xwe standiye yan na. Dema Êzdînşêr dibêje min nestand, Mîr Bedirxan sebebê vê pirs kiriye. Êzdînşêr dîkê di destê xwe de dirêjî Mîr dike û dibêje "Mîrê min ha ji te re, tu dikarî tiştekî ji vî dîkî bistinî? Axayê wê eşîrê jî mîna vî dîkî ye." Li ser vê Mîr Bedirxan kenyiaye û soz daye êdî tu car ji wê eşîrê bacê nestîne (Bafi, 2005: 148-153)

Ev efsane işaretên girîng in û didine nîşan ku Êzdînşêr di hafizeya Kurdên herêmê de ji xayînekî zêdetir qehremanek e. Kesekî wekî Berdixan ku li ser axa di bin hikmê wî de dewlemendiyek aborî û civakeke di nav xweşiyê de ava kiriye, li Kurdistanê jî mîrîtiyeke serbixwe saz kiriye. Êzdînşêr li hemberî Bedirxan bi Osmanî re tifaq kiriye û bûyê sedema têkçûna Bedirxan. Ev yek jî bûyê sebebê qedandina xweşî û dewlemendiya Botan.

Pêşıya ku em vê tevgera Êzdînşêr bi îxanetî bi nav bikin, divê mercên civakî, çandî û siyasi yên wê serdemê li ber çavan bêñ girtin. Çavkaniyêñ devkî û nivîskî hene ku dibêjin bavê Êzdînşêr Mîr Sêvdîn jî di dema xwe de mîrekî serbixwe bûye. Tê gotin Mîr Bedirxan jî bi Osmaniyan re bûye yek û ev rêberê girîng (Mîr Sêvdînê Bavê Êzdînşêr) ji text xistiye. Lêbelê ne Bedirxan, ne jî Êzdînşêr xwestiye ku Kurdistan bi temamî bikeve bin destê Osmaniyan. Di sedsala 19mîn de peymanê beg û rêberên Kurdan bi Osmanî û dewletên mêtinkar re piranî stratejîk bûne. Bedirxan Beg ji bo bikeve cihê wî bi Osmaniyan re bûye yek û Mîr Sêvdîn ji text xistiye, lê paşê ji bo bi temamî bibe serbixwe bi Osmaniyan re têkoşîn kiriye. Êzdînşêr jî ji bo Bedirxan ji text bixe û bikeve cihê wî bi Osmaniyan re bûye yek, lê ew jî li hemberî Osmaniyan serhildanekê (ji ya Bedirxan bihêzir û berfirehtir) dide destpêkirin û dikeve nava liv û tevgerê ji bo Botan bibe mîrekîyeke serbixwe. Dîsa Şêx Ubeydulahê Nehrî jî bersiva gaziya cîhadê ya Osmaniyan dide û xwe alîgirê wan dide nîşan û piştire bi fikra Kurdistanêke serbixwe serhildaneke mezin daye destpêkirin. Em dikarin şerên mîran wekî şerê textî bibînin û di mercên begîtiya wê demê de em dikarin bibêjin bûyereke jirêzê ye. Zêdetir di wan deman de eşîrên Kurdan di mijara ka dê kî bibe mîr de bûbûne komên cuda. Çawa eşîrên ku dixwestin mîritî ji Mîr Bedirxan re bimîne hebûn, wisa eşîrên ku digotin divê mîritî bimîne ji yekî ji mala Mîr Sêvdîn (yanê Êzdînşêr) re jî hebûn. Tê zanîn piştî ku Bedirxan Beg bû mîr jî ev kom bi hev

re di rewşa şer de bûn. Di aliye kî din de ku mirov tifaqa Bedirxan Beg bi Osmaniyan re li ser jitextxistina Mîr Sêvdîn li ber çavan bigire, Êzdînşêr fikiriye ku mîrîti heqê bavê wî û piştre jî heqê wî bûye û Bedirxan ev heq xesb kiriye. Bi vê sebebê mirov dikare bifikire ku Êzdînşêr di mercên wê demê de li hemberî Bedirxan Beg (paşê navbera wan xweş bibe jî) bi hêrs bûye.

Wekî encam di mercên begîtiya wê demê de, mirov dikare navandina bi xayîntiyê ya jî bo pevçûnên di navbera endamên xanedanê de wekî şâsiyeke civakî binirxîne. Loma mîrîn ku bi tifaqa Osmaniyan re hatine ser text, divê mirov li ber çavê xwe bigire ku wan ji bo têkoşîna rizgariya herêma xwe û tevahiya Kurdistanê xebatê mezin kirine. Ev têkoşînên serweriyê di wê demê de hem ji aliye malbata xanedanê ve hem jî ji aliye Kurdan ve têkoşîneke edetî tê dîtin ku di hafizeya Kurdî ya herêmî de ne Bedirxan, ne jî Êzdînşêr wekî xayîn nayêñ binavkirin. Ev kes bi şexsiyetên xwe yên pêş û serkeftî her tim hatine vegotin.

Di hin çavkaniyêن ku behsa Êzdînşêr dîkin de, ev ifade diborin: “*Yezdanşêr di sehneya siyasi ya wê demê de qehremanekî bi nakok lê di heman demê de tipik e. Yezdanşêr li aliye kî li ser erdeke kifş berjewendiyêñ serweriya xwe ya şexsî li pêş girtiye û rîberekî feodalê rastîn bûye. Bêrêbazî û nakokiya wî ya siyasi û minêkariya wî ya ku bi desthilatiyan re li hev hatiye, ji vê diqewime. Li aliye din, ew rexistinkarekî jîhatî û welatparêzeki Kurdistanê bû. Ji bo rizgarkirina axa xwe ketiye nav tevgera serhildanê. Serhildan bi ser tixûbê Botan ketiye û li seranserê Kurdistana di bin destê Osmaniyan de belav bûye. Tevger di rengê feodalîya cudakî de bû lê xwe gihandiye keviya tevgereke neteweyî.*” (Lazarev û Mihoyan, 2013: 138).

“*Kurdan hurmeteke mezin ji Yezdanşêrî re digirt û heta ku digotin nesla Yezdanşêrî ji ya sultanêñ Tirk kevnartir û bi rûmetir e.*” (Averyanov, 2010: 101).

Êzdînşêr jî di çavê piraniya eşîrîn Kurd de mîna Bedirxan ji malbata Ezîzan û ji nesla Xalid bîn Welîd (Xalidê kurê Welîd) wekî kesekî pîroz e, bi qasî Bedirxan Beg muteber e û mîrîti jî dema dora wî hat mafê wî yên rewa ye.⁸ Li aliye kî din valahiya desthilatiyê ku piştî Bedirxan Beg çê bûye, tijekirina wê ji aliye Êzdînşêr ve, di çavê Kurdêñ bê serek de pêwistîyeke mezin bû. Loma Kurd li hember sefer û tevgerên Osmaniyan ên bi navê tedîbê û li hember rîveberên nû yên Osmaniyan ku dihatin tayînkirin di bin zextêñ gelek mezin de bûn. Herweha Êzdînşêr di dema serfermandariya Bedirxan Begê de bi şexsiyeta xwe ya şerker û wêrek navdar bûye û ji bo textê valabûyi jî tam lêhatî ye. Alîkariya zarêñ Bedirxan Begê ji bo serhildana Êzdînşêr ji,

8 Li gora Şerefnameyê Begêñ Cizîrê ji malbata Ezîzan in ku nesla wan digihêje Xalid bin Welîd (Şerefhan, 1990: 1135).

tîne hişê mirov ku di wê demê de nexweşiya di navbera malbatê Êzdînşêr û Bedirxan Begê de xelas bûye, an jî kêm bûye. Êzdînşêr bi serhildana ku da destpêkirin û gerand, hurmeteke mezin hem di herêma xwe de hem jî di nava Kurdan de qezenc kiriye. Bi ser de jî, (çawa di pêş de dê bê vegotin) serhildana ku ew bi rê ve dibe ji serhildana di dema Bedirxan Begê de jî berfirehtir e.

Gelo ev kilam straneke wekî merşan bû ku lesker û yekîneyên Mîrektiya Botan di şer, berxwedan û serhildanan de gotine?

Me berê jî gotibû sedsala 19mîn di dîroka Kurdan de ji aliyê serhildan, berxwedan û şeran ve serdemeke pir bi hereket e. Di Kurdistanê de di vê serdema ku her serhildan ji ya pêşiya xwe berfirehtir bûye û her serhildan bi xwînê hatiye dewisandin, zêdetir hewcedarî bi motîvasyon û wêrekiyê çê bûye. Folklor taybetiyê dema derketina xwe an jî serdema ku behs dike di xwe de digire. Mirov ku bibêje atmosfera kilama *Ez Xelef im*, atmosfera dîroka Kurdan a sedsala 19mîn e, nabe dêrew. Loma ev kilam şewqa ruhê şer, serhildan, berxwedan, serkeftin û qehremaniyê dide, mînanî ku cesaret û motîvasyonê bide servan û gelê Kurd. Di dîroka Kurdan de serhildana pêşin û mezin a sedsala 19mîn di serdema Mîr Bedirxan de dest pê kiriye. Kilama *Ez Xelef im* iştimal heye ku ji ber sebebê li jor di serhildana serdema Mîr Bedirxan de hatibe gotin û di serhildanê pişt wê jî zêdetir belav bûbe û berdewam kiribe. Çîrokê destekê bidine vê fîkrê û wê erê bikin li devera Botan hene. Ev çîrok wiha ne:

“Leşkerên artêşa Bedirxan Beg dema diçûne şer ji bo motîve bibin û piştî şer jî ji bo pîrozkirina serkeftinê, ev kilam digotin.” “Bi qasî me ji kalanbihîsiye gotina vê kilamê ji aliyê dengbêjan ve, rastî salên 1840 û 1847an tê.”⁹ “Dema serkeftineke leşkerî pêk bihata ev kilam bi coş dihat gotin. İro jî rojê şahiyê yên wekî dawetan de û dema serkeftinek çêbibe dîsa bi coş tê gotin.”

Rîwayeteke herêma Botan ku işaretî hebûna vê kilamê di serdema Bedirxan Beg de dike wiha ye: “Di dema Bedirxan Beg de, demekê di navbera Goyî û Ertoşîyan¹⁰ de şerek derdikeve. Ewêna navbera wan û Bedirxan Beg xweş e, xeberekê dişinin û jê alîkariyê dixwazin. Bedirxan Beg leşkerên xwe ji bo alîkariya Goyiyan dişîne û mezînê eşîra Ertoşîyan tê kuştin û Goyî bi ser dikevin. Piştî vê bûyerê Ertoşî sond dixwin ku heta roja heyfa xwe hildin govenda Ez Xelef im berevajiyê eşîrên din bilîzin.”

9 Serdema ku di bin rîbertiya Bedirxan Beg de serhildana mezin a Kurdi çêbûye.

10 Goyî an jî Goyan eşîreke ku navenda wan li Qilabana Şîrnexîye. Ertoşî an jî Hertoşî jî konfederasyoneke eşîran e ku ji 12 eşîran pêk tê û belavî Bêtûşebab, Hekarî, Wan û Kurdistana başûr bûne. Di vê serdemê de Ertoşîyan ku bi Goyiyan re di nava şer de bûn, di nava mîrektiya Hekariyê de di bin desthilatiya Mîr Nûrûlîah de bûn.

Govendeke xasî vê kilamê li gelek deverên Kurdistanê heye û awayê vê govendê ya li Botan û derdora wê dişibe hereketên şerî. Govend wiha tê lîstin: Du gav diçin pêş û du gav jî paş ve têن û gavekê jî dîsa diçine pêş û wiha didome. Ev hereket bi awayê “çûna yek pêş û yek paş” wekî fermaneke leşkerî sembolize dibe. Dîsa li gora rîwayetên devera Botan “Peyva xelef a di vê kilamê de ne navê kesekî ye, xelef pêşengê şer e, rêvebirê şer e û kesê sergovend be dibe xelef.¹¹” Li vir peyva xelef (paşhatî) dijwateya selefê (pêşhatî) û wekî rêvebirê şer were bikaranîn ne xerîb e. Loma di wê demê de rêvebir û pêşengên şeran piranî ji malbatêن xanedanî ne û fermandar in (wekî Bedirxan Beg, Êzdînşer û kurêن Bedirxan). Guhertoyeke vê kilamê ku li devera Botan bi awayê “Ez xelefê Begê Botan im” tê gotin, vê fikrê piştrast dike.

Ku wisa ye, çîma di kilamê de navê Êzdînşer bi derbdar dibore û kilam bi navê wî navdar bûye? Pêşıya ku em bersivê bidin divê em kevanekê vekin û behsa girîngiya Êzdînşer û serhildana sedsala 19mîn a di bin fermandariya wî de pêk hatiye bikin.

Êzdînşer kurê Mîr Sêvdînê (Seyfedîn) mîrê berî Bedirxan Beg e.¹² Ji xeynî vê, serfermandarê artêşa Bedirxan Beg e. Êzdînşerê ku difikire Bedirxan Beg mîritî ji bavê wî Sêvdîn xesb kiriye, pêşıya ku mîreşalê artêşa Anadolê ya Osmaniyan Osman Paşa bimeşe ser Cizîrê (Nisan 1847) sefa xwe diguhere û ji Cizîrê direve û tevî Osmaniyâ dibe. Ji ber endamekî malbata Ezîzan û kurê Mîr Sêvdîn e, ji vê rûmetê hêz digire û di têkçûna Bedirxan Begê de roleke girîng digire. Piştî Bedirxan Beg di destpêka tebaxa 1847an de teslîm dibe, ji kîrhatina wî ya di têkçûna Bedirxan de û ji ber endamekî xanedanê ye, ji aliyê mîreşalê artêşa Anadolê ya Osmaniyan Osman Paşa ve, wekî muteselimê (wekîltiya mîrêmîran) Cizîr, Botan û Hacîbehramê tê tayînkirin. Lîbelê Sultan Evdilmecîd û hikûmeta Osmaniyan, ji bandora wî ya di nav Kurdan de û rêveberiya serbixwe ya bavê wî (Mîr Sêvdîn) ditirsin û kesekî ji malbata Bedirxan Begê wekî rêveberê Cizîrê rast nabînin. Di sala 1848an de bi avakirina eyaleta Kurdistanê re Cizîr jî dibe senceq û dema Mustefa Paşayê ku fermandarê artêşa Bedirxanî têk dibe wekî qaymeqam tê tayînkirin, Êzdînşer dimîne di valahiyê de (Kardam, 2013: 140-141). Ji ber ku pismamê Bedirxan Begî ye tê hizirkirin ku dê bandora xwe di herêmê de zêde bike, loma jî di Adara 1849an de wî dişînin Stenbolê. Paşê jî ji ber Cizîr musaîd nayê dîtin, wî li Müsilê wekî efser peywirdar dikin. Di vê pêvajoyê de paşayên Osmaniyan bo her derên Kurdistanê ku di bin

¹¹ Ev govend berê li devera Cizîrê piranî li ber defê dihat lîstin. Stran piranî bi awayê vegerînê yanê bi dubareya hemberî tê gotin.

¹² Dî hin çîrokan de tê gotin ku Mîr Sêvdîn birayê Bedirxan Beg e (Bafi, 2005: 138).

serweriya Osmaniyan de ne, tên şandin. Hin bajarên kifše yên Kurdistanê ji aliyê leşkergehê Osmanî ve tên dagirkirin (Kardam, 2011: 379-380; Ögün, 2010: 66-67, 77-78; Averyanov, 2010: 131).

Bi têkçûna Bedirxan re bidestxistina Kurdistanê temam bûye û pergala mîrîtiyê hatiye rakirin. Lê bi avakirina eyaleta Kurdistanê û pêkanîna Tenzîmatê, valahiya ku ji tesfiyeya began pêk hatiye nayê tijekirin; di cihê mîrektiyênu ku saziyên gelek kevnar û xwediyê kevneşopiyê dîrokî ne, saziyên nû nayê danîn û di vê rewşê de jî teqez xelasiya ji xerabûnên aborî û civakî, bêasayışî û talanê mumkin nebû. Berteka Osmaniyan a li hember vê rewşê zêdekirina zextan û cezakirina eşîrên bê kontrol bû (Kardam, 2011:384). Zêdebûna bacan, leşkeriya mecbûrî, bi taybetî bertîlxwarî û nelirîtiyê rêveberên herêmî dibûn sebebê nerazîbûneke mezin. Konsolosê Îngilistanê yê Mûsilê Rassam di rapora xwe ya ji balyozê li Stenbolê Stratford re şandî de wiha dibêje: “*Rewşa zilmkariyê gihîştiye asteke wisa ku Kurdan dest pê kirine li rîberekî digerin da ku ji nîrê zilma ew xistine bin barekî giran, xelas bibin.*” (Public Record Office [Pro Fo], 195/394, C.A. Rassam to Stratford de Redcliffe, Moossul, 3: 190-192: 1855: Veg: Ögün, 2010: 107). Yezdanşêr wekî endamekî xanedana Cizîra Botan, malbata Ezîzan û kurê Mîr Sêvdîn ji bo lêgerana rîberekî tam lêhatî bû (Kardam, 2013: 143).

Yezdanşêr biraziyê Bedirxan, di serhildana Botan a di sala 1847an de alî Tirkan kiriye, lêbelê duv re di di sedsala 19mîn de serkişıya serhildaneke herî mezin kiriye. Serhildan bi ser tixûbê Botan ketiye û li seranserê Kurdistana di bin destê Osmaniyan de belav bûye. Tevger di rengê feodaliya cudakî de bû lê xwe gihandiye keviya tevgereke neteweyî.

Şerê Qirimê yê wê demê dest pê kiriye, rî li ber Êzdînşêr û serhildana wî vedike ku bi pêş ve biçe. Di sala 1853yan de dema Osmaniyan bi Rûsan re şer ilan kir, Kurdan guh nedan celba gazîkirina leşkeriyê.¹³ Di salên 1853-57an de di navbera Kurdan û Rûsan de têkiliyê dostane pêk tên (Averyanov, 2010: 102-132).

Ji ber ku Yezdanşêr kurê Mîr Sêvdîn bû rêveberiya Cizîra Botan heqê xwe didît û pêşî ji aliyê Bedirxan ve û paşê ji aliyê Osmaniyan ve ev heqê wî hat xesbkirin û ew hat mexdûrkirin.¹⁴ Yezdanşêr li ser vê rewşê çar salên li Mûsilê bi xeyala vî

13 Ewê bersiva vê gaziyê didin jî eşîrên li ser sînorê şerê Rûs û Osmaniyan in ku di bin zextên yekîneyên Osmaniyan de bûn (Averyanov, 2010: 131). Pişti ku Rûs bi ser dikevin Kurdan xwe ji şer vekişiyane (Averyanov, 2010: 132).

14 Êzdînşêr, dema di serhildana Bedirxan de alîkariya Osmaniyan dikir, hêvî dikir ku dê Osmanî wî wekî waliyê Kurdistanê tayîn bikin. Lêbelê ji ber Osmaniyan nedixwest rîberê navdar ê Kurd bihêztir bibe, destekdayîna wî red kir (Lazarev û Mihoyan, 2013: 139).

heqê xwe yê ji destê wî hatî standin diborîne û ji mehêne dawiya sala 1853yan ve li herêma Botanê digere û amadekariya serhildanê dike. Li ser têkçûna Osmaniyan li hember hêzên Rûsan a di havîna 1854an de, vê ji bo bikaranîna planêne xwe wek fersendekê dibîne û radibe piyan. Yezdanşêr bi hêzeke 400 kesên ji Mûsilê civandine, hefteya duyem a Cotmeha 1854an ji bo biçe Cizîrê ji Mûsilê vediqete. Serhildan di Kanûna Pêşî ya sala 1854an de tam di navika Kurdistanê de, li başûr û rojhilate Tirkiyeyê Anadola başûr-rojhilat (eyaletên Botan û Hekarîyê) dest pê dike. Êzdînşêr bi vî awayî di 15 rojan de dibe xwediyyê axa edetî ya Mîrektiya Cizîra Botan. Qada serhildanê di sala 1855an de herêma bakurê Kurdistanâna başûr û Kurdistanâna başûr-rojhilat digire û ber bi başûr-rohilatê ve belav dibe. Pêşî Kurdên Hekariyê, dûre Kurdên Miksê û eşîrên Botan tevî Yezdanşêr dabin; di demeke kin de Êzidî jî di nav de eşîrên din ên Kurd tevî wî dabin. Ji bo serhildanê bifetisînin, paşayê Bexdayê Kenan leşkergehê Bexda û bajarê din li Sêrtê dicivîne û dimeşe ser Êzdînşêr, lê di navîna meha kanûnê de nêzî Sêrtê têk diçe û direve. Li ser vê serhildan belavê Bexdayê heta Wanê dibe. Di meha sibatê de êdî 60 hezar kes di artêşa Êzdînşêr de hene, hin çavkanî dibêjin 100 hezar e.¹⁵ Romên li herêmê û 2 hezar jî ji Erebistanê tevî sefên Êzdînşêr dabin. Serhildan di dawiya zivistana 1855an û destpêka biharê de digihîje asta herî jor. Di navbera leşkerê Êzdînşêr û Osmaniyan de li nêzî Keleha Pagvansê ya başûrê Gola Wanê şerek derdikeve. Di vî şerî de 4 hezar miriyên Osmaniyan çêdibin û bi paş vedikişin (Averyanov, 2010: 132-133; Lazarev û Mihoyan, 2013: 139; Kardam, 2013: 142-144; Kardam, 2011: 379-380).

Serhildana ber emrê Êzdînşêr û zêdebehûna hejmara alîgirên wî, waliyê Kurdistanê û rêveberên herêmî bi awayekî cidî xistine nava fikaran; tırsiyane ku Êzdînşêrê serhildér bibe “Bedirxanekî nû”. Waliyê Kurdistanê tırsiyaye ku Bedirxan Beg û Xan Mehmûd ên sirgûnkirî ji Gîritê birevin û bêne Kurdistanê. Loma di rewşeka wiha de serhildan dê ji herêma Botan derkeve û heta Miksê bikare belav bibe (Kardam, 2013: 145-146). “Hikûmeta Osmanî (Bab-ı Alî) qebûl kiriye ku serkeftina Êzdînşêr ji bo wan ji destçûna Qers û Erziromê xetertir e (Notên derbarî Kurdên Botan yên Îvanovê Musteşar ku konsolosê kevn ê Erziromê bû û herî dawî bû Konsolosê Helebê, 1877-78, Veg: Averyanov, 2010: 342). Beşêke mezin a artêşa Osmanî ji bo terbiyekirina serhildana Kurdistanâna mezin a Êzdînşêr di şerê 1854-55an de dema şerê Rûs û Osmaniyan de ji qada şerê eniya Qersê hatiye vekişan (Averyanov, 2010: 104). Bab-ı Alî di naveka 1855an de ji bo serhildana Êzdînşêr bifetisîne operasyonê dide destpêkirin. 22yê Sibata 1855an de yekîneyên osmaniyan û hêzên Êzdînşêr li Dirûna (îro Duruköy) navbera Mêrdîn û Cizîrê rastî hev têne. Yezdanşêr bi giranî

¹⁵ Ne Osmaniyan ne jî Îranê tu demê ji Kurdên bin emrê xwe de ev qas leşker necivandine.

têk diçe, pêşî vedikişe Cizîrê, pê re diçe Qesra Gelî ya li bihurka Qesrikê ku li ser riya Cizîr û Dêrgulê ye (Kardam, 2013: 147). Yezdanşêr dema li Qesra Gelî bûye ji nû ve amadekariyên serhildanê dike û dixebite ku bi artêşa Rûsan re bikeve têkiliyê, lê nikare bi ser bikeve. Osmanî di vê navberê de serhildêran paşve davêjin. Di dawiya meha nîsanê de Yezdanşêr bi soza namûsê ya konsolosê Îngilîstanê li Mûsilê û paşayê Osmaniyan ji Qesra Gelî derdikeve û bi nûnerên Osmaniyan re biryara hevdîtinê dide. Lê di dema hevdîtinê de yekcar tê girtin û dibin Stenbolê û tê zîndankirin. Li ser vê, tevgera Kurdî bê serek dimîne, paş dikeve û di demeke kin de jî xelas dibe (Lazarev û Mihoyan, 2013: 140; Averyanov, 2010: 134; Celil, 1992: 166). Yezdanşêr paşî sirgûnê Vîdînê tê kirin. Di Kanûna Paşî ya 1858an de direve û dîsa hewl dide ku serhildanekê rôexistin bike lê tê girtin û dîsa tînin Vîdînê. Her çiqas paşî bê efûkirin jî, careke din îzna wî ya vegera Kurdistanê nayê dan (Kardam, 2011: 379-380).

Derbarê girîngiya serhildana Êzdînşêr de ev têngotin: “*Tiştê ku serhildana Yezdanşêr ji yên pêşîya wî cudatir dike, himêzkirina axa fireh a Kurdistana bakur û rojavayê ye.*” (Lazarev ve Mihoyan, 2013: 140). Waliyê Kurdistanê Mehmed Hemdî Paşa di rapora xwe ya 26ê Kanûna Pêşî ya 1854an de ji Derseadetê re şandî de, “*Heke rôbir gihîstibûna armancêن xwe, dê ev neguncanî bi vê deverê tenê nemaya û li aliyekî Sêwas û li aliyê din heta Bexdayê belav bûya û dê bûbûya sebebê mesrefen mezin. Di vê rewşê de tevger dê ji serhildana Bedirxan bûbûya pirsgirêkeke mestir û bi vekirî were dîtin ku her ku biçûya dê derketa çend qatêن xwe. Ji dema efsûnkarî (piştî Bedirxan Beg ji holê hat rakirin) li vê herêmê nehatîye dîtin û nehatîye bihîstin ku Kurd wiha bi hev re bûne tîfaq û evqas pevçûnên mezin kirine.*” dibêje û kifş dike ku di piş perdeya vê bûyerê de Yezdanşêr heye (Öğün, 2010, 88-89).

Li vir emê kevanekê bigirin û dîsa vegerin ser mijara bi ci sebebê kilam li ser navê Êzdînşêr hatîye gotin û navdar bûye. Êzdînşêr di serdemâ Bedirxan de serfermandarê artêşê bûye, bi şerkerî û wêrekiya xwe navdar bûye; dibe ku di vê kilamê de behsa nav û dengê xwe, hêza xwe kiribe û cesaret dabe artêşa xwe. Dibe ku kilam ji aliyê wî bi xwe ve hatibe nivîsîn an jî li ser hatibe nivîsîn û dibe ku gorî mercêñ wê serdemê ji nû ve bi navê wî hatibe şirovekirin. Li aliyekî din, ji ber ku mîrê herî dawî¹⁶ Êzdînşêr e û eger mirov mezinahiya serhildana di bin emrê wî de, encamên wê û navdarbûna Êzdînşêr li ber çavan bigire iştimala ku kilam berê hebe û dûre pirtir bi navê wî hatibe xwendin, bêtir derdikeve pêş.

16 Piştî ku Êzdînşêr di sala 1855an de ji holê hat rakirin, dawî li desthilatiya mîran a li herêmê anîn. Lîbelê ji bo demek pir kin Osman Begê kurê Bedirxan mîrîtiya xwe ilan kir. Ji ber ku mîrîtiya Osman Beg pir kin bûye, mirov dikare bibêje Êzdînşêr mîrê dawî ye.

Pirseke din jî ku bê hişê mirov dibe ku wiha be: Eger kilamê di dema serfermandariya Êzdînşer de dest pê nekiribe, yanê ji pêşî de hebe, yan jî bi sefermandariya wî re dest pê kiribe, çima ji Êzdînşer re “mîr” tê gotin. Bersivên vê pirsê yên bi iñtimalê wiha ne: İhtimala hebûna kilamê di pêşıya ku Êzdînşer bibe mîr (di dema serfermandariya wî an jî pêşî de) ji bo îlankirina mîrîtiya wî, iñtimal heye ji nû ve hatibe şirovekirin. Loma hin işaretên iñtimala guherinê hene ku kilama dema serfermandariya wî bi mîrîtiya wî re guheriye¹⁷. Yek ji van jî hin versiyonê vê kilamê li herêma Botan “Êzdîn şêrê mîrê Botan e/Botanê” tê gotin.¹⁸ Çawa tê dîtin li vir behsa Êzdînşer ne wekî mîr, wekî şêrê mîr tê kîrin. Ev çîroka li herêma Botan jî vê iñtimalê piştrast dike: “Biraziyê Bedirxan Êzdîn hebû. Şervanekî pir jêhatî bû. Mezinan digotin ku Êzdînşer serfermandarê Bedirxan bûye. Dema Êzdînşer diçû şer, ‘Êzdîn şêrê mîrê Botan e’ digot. Hz Eli çawa şêrê Xwedê ye, ew jî şêrê mîr bûye.” Di vê rewşê de piştî Êzdînşer dibe mîr, ristika ‘Êzdîn şêrê mîrê Boten e’ tê gotin ku iñtimal heye bûbe ‘Êzdînşer mîrê Boten e/Botanê.¹⁹

¹⁷ Li gorî rîwayeteke devera Botan: “Dema Êzdînşer bû mîr, ji bo vê pîroz û ilan bike ev kilam gotiye û şahiyêni 40 roj û 40 şevan bidome li dar xistiye.” Di vê rewşê de, ristika Ez Xelef im (Divê xelef bi wateya dijwateya selefê be. Yanê divê wateya wê “ez xelef im”, “ez paşhatî me” be) a di kilamê de, ristika “Êzdînşer mîrê Botan e” ku tê wateya îlankirina mîrîtiyê û ristika “Xweyê şûrê sedef im, nav eşîran bengî me” ku hêz, nav û nîşana mîrê nû hatiye ser text nîşan dide, vê rîwayetê piştrast dikin. Ji bili vê ristika “Bi gumguma daholê” ya ku di wersiyona pirtûka Dîroka Kelepora Mîrnîşîniya Botan (Bafi, 2005) de dibore, işaretê şahiyekê dike. Dibe bê gotin ku ristika “Mîr hawar e”ya ku di kilamê de dibore jî, tê wateya “mîr ilan dike, mîr gazî dike.”

Baş e, gelo ev kilam/helbest bi mîrbûna Êzdînşer re hat gotin, an di pêşıya wî de jî li Kurdistanê ji bo mîrbûnê dihat gotin? İhtimal heye ku ev kilam ji bo hemû mîrên li Kurdistanê ji bo îlankirina mîrîtiyê yan jî cara pêşî ji bo îlankirina mîrîtiya Êzdînşer hatiye gotin. Heke em iñtimala ku kilam ji bo îlankirina mîrîtiya hemû mîrên Kurdistanê bûye qebûl bikin jî iñtimala ku kilam bi navê Êzdînşer bûye -ji ber ku mîrê dawî bû û di nava Kurdan de bi nav û deng bû- divê bê ravekirin û li ber çavan bê giritin.

¹⁸ An jî ev ristik di rastiya xwe “Êzdîn, Şêrê Mîrtiya Botan e” ye û dibe ku deng jê guherîbin.

¹⁹ Navê wî yê rastî Êzdîn e û li gorî rîwayetê ji ber ku şervanekî baş û wêrek bûye, “şêr” wekî leqeblî navê wî hatiye zêdekirin. Rîwayeta sebeba dayîna vê leqebebê li devera Botan wiha ye: “Şerekî sultanê Osmaniyan hebûye, tu kesî nedikarî simbêlê xwe li ber vî şêrî badaya. Êzdînşer destekî xwe daniye ser simbêlê xwe, destek jî li ser şûrê xwe û awirek avêtiye şêr; şêr ji tırsan rîtiye xwe de. Piştî wê rojê ji Êzdîn re Êzdînşer an jî Şêrêzdîn hatiye gotin.”

Îşareteke ku ihtimala versiyona kilamê ya di dema serfermandariya wî ku piştî mîrîtiyê guherîbe, piştrast dike dîsa di versiyoneke kilamê ya li herêma Botan veşartî ye. Di hin versiyonê herêma Botan de “Êzdînşêr begê Botanê” tê gotin. Di mîrektiya Botan de mîrêni ji xanedanê (çi mîr be ci mîr nebe) bi peyva begê hatine xîtabkirin û ev jî hem di çavkaniyan de hem jî di çîrokên nava gel de tê dîtin. Di serdema fermandariya leşkerî de jê re beg hatibe gotin ihtimal heye ji vê sebebê be. Îcar mirov dikare bibêje piştî ew dibe mîr ev riste ji bo mîrîtiya wî bê nişandan bi awayê “Êzdînşêr mîrê Botan e” hatiye guhertin.

Baneşana “mîr hawar e” jî li gora şiroveyên vê sernivîsê dibe ku di wateya “mîr diqîre, gazî dike” de hatibe bikaranîn. Xelef jî li gora van şiroveyan dijwateya selefê ye û tê wateya paşhatî. Yanê ev peyv (xelef) ji pêşeng, mîr û fermandarêni ji malbata xanedanî ya wê serdemê re tê gotin. Êzdînşêr ku ji xwe re “xelef” dibêje (yan jî ku Êzdînşêr re xelef hatiye gotin) ji ber ew kurê Mîr Sêvdîn û nesla malbata xanedanî bûye, peyda bûye.

Di versiyona kilamê ya *Dîroka Kelepora Mîrnîniya Botan* (Bafi, 2005) de ristikêن “Gel eşîra bi hêvî me” û “Gel eşîra bi xwende me”²⁰ jî, işaret dikin ku mîr, rîber an jî fermandar ji bo şer û serhildanê ji eşîran hêviyeke erênî dike; herwiha mirov dikare bibêje ku eşîr ji bo tevlibûna şer û serhildanê têni motîvekirin. Dîsa di heman pirtûkê de ristikêni bi awayê “*Bomba bavêñ Gemrexê; meşin herin ser Şernexê*” di wesfê gazîkirina şer de ne.

Wek encama nîrxandinêni di bin vê sernivîsa pirsî de; ev kilam di sedsala 19mîn de li Kurdistanê di şer û serhildanan de ji bo tîrsandina dijmin, zîndekirin û cesaretkirina ruhê leşkerî û piştî serkeftinê ji bo pîrozbahiyê (mîna marşa mehteranê ya Osmaniyan) kilameke marşkî bûye û ihtimal heye ku di her serdemê de li gora bûyer û kesan ji nû ve hatibe şirovekirin.²¹ Dema em werin ser sebebê ku ev kilam zêdetir bi navê Êzdînşêr û Mîrektiya Botan hatiye nasîn û gotin; hebûna navê

20 Li gorî me di pirtûkê de ev riste şaş hatiye nîvîsin. “bi xwende me” bê wate ye û li kilamê jî nayê, divê rastiya ristikê wekî “Gel eşîra bixwe bendî me” be.

21 Li vir hin taybetiyêni din jî hene ku divê li ser bê sekinîn: Di hin ristikêni kilamê yên bi awayê “Êzdînşêr mîre/begê Botan e/Botanê” de tê behskirin ka mîr kî ye an jî dema xîtabî mîr tê kirin ristikêni din li gora kesê yekem hatiye kêşan. Li gorî vê (ji ber bi piranî li gorî kesî yekem hatiye kêşan) kilam li ser navê serhildan û rîberê wê dihat gotin û dibe bê gotin ku di ristikêni li gorî kesê sîyem hatine kêşan de jî (kesê kilam li ser navê wî tê gotin) ew kes behsa xwe dike. Yan jî di rastiya xwe de dîsa li gorî kesê yekem hatiye kêşan û “Êzdînşêr im mîrê/begê Botan im” bi guherîna dengan re ihtimal heye bûbe awayê kesê sîyem. An jî em dikarin bibêjin di zimanê kilaman de hin qertaf li gorî qafiyeyê dibe bêni bikaranîn.

Mîrektiya Botan di versiyonê kilamê yên gehîştine îro de, ji ber şer û serhildanê Kurdan ên sedsala 19mîn ku belavê piraniya Kurdistanê bûne, dibe ku zêdetir ji navenda Botan bûne²² û serek û fermandarên wan jî ji mîrên Botan bûne. Yanê kilam piştî ku serhildanê Kurdan ên nîveka duyem a sedsala 19mîn qewimîne, li vê serdemê hatiye adaptekirin û navdar bûye yan jî cara pêşî di vê serdemê de derketiye. Sebebê borîna navê Îzdinşêr di gelek versiyonê kilamê de û wisa jî hatina wê heta roja me, bi ihtiîmaleke mezin ew e ku Îzdinşêr mîrê dawî bû û serhildana wî gelekî girîng bû.

Piştî me bi vî awayî yek ji wateyên ihtiîmalî anî ziman, di bin pirseke sernivîsî de em ê derbasî wateyeke din a ihtiîmalî bin.

Dibe ku ev kilam derbarê Şêx Ubeydulahê Nehrî de be?

Ji bo ev pirs bi referansên erêni were berfirehkîrin, divê Şêx Ubeydulahê Nehrî, rûmeta wî ya di nava Kurdan de û girîngiya serhildana ku wî da destpêkirin bêz zanîn. Di dawiya sedsala 19mîn de dema veguherîna dewletên Osmanî û Îranê ya nîv-mêtîngîriyê qedîya, rewşa Kurdan a aborî û siyasî jî bi lez lawaz bû. Tevgerên gelî, pevçûnên çekî û êrîş, bûbûn bûyerên jirêzê; desthilatiya rêveberên herêmî yên ji aliyê Osmaniyan ve hatibûn tayînkîrin ketibû asteke bi qasî tunebûnê. Bêdesthilatî û aloziyê ji bo ku tevgera rizgariya Kurdistanê ji nû ve xwe gur bike, derfetên bikeys amade dikir (Lazarev û Mihoyan, 2013: 149-150). Piştî şerê rojhilatê ku bi serhildana Îzdinşêr dijwartir bû bi bist salan jî hikûmeta Osmaniyan di vê pêvajoyê de ji bo desthilatiya xwe qewî bike li quncik û deverên talde yên Kurdistanê jî tedbîrên gelek hişk û dijwar digirtin. Şêx û serekên eşîrên Botan û Hekariyê ji bo serxwebûna xwe ya berê careke din bi dest bixin li benda demeke musâid bûn (Averyanov, 2010: 139, 140). Di salên 70yî yên sedsala 19mîn de ji nû ve gurbûna “pirsgirêka rojhilatê” û nêzikbûna şerê Rûsan û Osmaniyan bûn sebebê nexweşîyê li ser rewşa sînorê Îran-Osmanî yên ku Kurdistan parce kiribûn. Di destpêka sala 1877an de li du eniyan (Balkan û Qafqasyayê) şerê di navbera Rûsan û Osmaniyan de (herba 93an) dest pê kir. Çawa şerê 1877-78an di navbera Osmanî û Rûsan ku li Asyaya Biçûk bûbû sebebê windakirina erdan qedîya, Osmaniyan ji bo Kurdên serhildêr bidewisîne, ji nû ve dest avêtin çekan. (Averyanov, 2010: 185-186; Bruinessen, 2005: 278-279; Lazarev û Mihoyan, 2013: 146-148).

²² Cizîr navenda Mîrektiya Botan bû ku yek ji mîrektiyê kevintirîn ên Kurdistanê bû; ji ber li ser riyêni ji Anadolê têni û diçin Îraq û rojhilatê Sûriyeyê bû, bi boneya rewşa xwe ya erdnîgarî di dîroka Kurdan a siyasî, aborî û çandî de roleke girîng lîstiye (Lazarev û Mihoyan, 2013: 115).

- Gözaydın, N. (1992). “Yine Folklor Üzerine”, Türk Dili, S.486, Haziran, s. 1018-1021.
- Mayor, A. (2000). “Bibliography of Classical Folklore Scholarship: Myths, Legends, and Popular Beliefs of Ancient Greece and Rome”, Folklore, 111:1.
- Mella, J. (2014). A Brief Bibliography of Kurdistan and the Kurds, WKA & Kurdish Museum, Library & Archive: London.
- Meho, I. L. & Maglaughlin, K. L. (Ed) (2001). Kurdish Culture and Society: An Annotated Bibliography (Bibliographies and Indexes in Ethnic Studies no: 9) Greenwood: Westport.
- Nuredin, B. (Amadekar) & Mistafa Resul, İ. (). Bibliografiy Kitêbi Folkloriy Kurdî (2004-1860). Kitêbxaneyî Kelepurî Kurd: Silêmanî, Herema Kurdistan.
- Yıldırım, K. & Pertev R. & Aslan, M. (2103). Ji Destpêkê Heta Niha Folklorâ Kurdî, weşanên Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstitûya Zimanê Zindî: Stenbol.

Malper:

- <http://Kurdishstudiesnetwork.net>
www.jstor.org
<http://www.tandfonline.com/>
<https://scholar.google.com.tr/>

<http://librarycatalog.bilkent.edu.tr/>
<http://www.sciencedirect.com/>
<http://www.academicjournals.org/>
<http://www.oxforddictionaries.com/>

Extended Abstract

Each academic study that claims having an original topic should at first be aware of studies that have been done in that area. Because of that, a scholar should make some research, walk in the corridors of libraries without getting lost and get information about his/her topic to continue the research. That shows why, and how bibliographies do have an important role in this process of researches. They make big and glorious libraries ‘small’ for researchers and give extra time to researchers for their research by this way. Originated from Greek words *biblion*=books, and *graphy*= writing, bibliography means “A list of the books of a specific author or publisher, or on a specific subject” according to the Oxford Dictionary.

Nowadays there are so many different bibliographies that researchers benefit from. While some consist of publications about a certain topic, some comprise publications about a person. While some focus on articles only, others take books in about certain subjects. Libraries also publish yearly bibliographies about what they have to help the researchers.

With the development in technology, especially in network communication, internet itself became a very huge source for scientific researches, and many web sites such as *JSTOR*, *Taylor&Francis online*, and *Google scholar* are very important resources for researchers. But they also became huge online libraries as the normal libraries are, and it is also very probable to ‘get lost’ between the ‘lines’ as ‘getting lost’ between corridors of libraries. That once again shows the importance of bibliographies to avoid the chaos and find the right ‘way’ to get the information, and reach the needed publications for the research.

This is for all departments of science and for folklore studies and Kurdish folklore studies as well. Compared to other subjects there are few bibliographies about Kurdish studies and specifically very few about Kurdish folklore. Some important ones are;

1-*Bibliografiay Kitêbi Folkloriy Kurdi* (2004-1860), (Bibliography of books of Kurdish Folklore 1860-2004).

2- “*Kürt Müziği, Dansları ve Şarkıları Üstüne Bir Bibliyografa Denemesi*”(A try of bibliography on Kurdish Music, Dance, and Songs).

3- *A Brief Bibliography of Kurdistan and the Kurds*

4- *Kurds and Kurdistan's Bibliography*

5- *The Kurds and Kurdistan: A Selective and Annotated Bibliography* (Bibliographies and Indexes in World History).

6- *Kurdish Culture and Society: An Annotated Bibliography* (Bibliographies and Indexes in Ethnic Studies).

This study in which publications in English language about Kurdish folklore are collected is also aimed to make a contribution in this field.

The work compiles articles and books only about Kurdish folklore written in English, and many publications that were not directly about Kurdish folklore were excluded.

JSTOR, *Taylor&Francis online*, and *Google scholar*, the very important and most used online 'libraries', were the main source for finding and collecting the publications. 'Kurdish folklore', 'Kurdish folk tale', 'Kurdish culture', 'folklore in Kurdish culture' were the main entries for searching on those web sites. At first the articles and the books were found, and then their 'bibliographies' were also searched to find other publications related to Kurdish folklore. Beside those main sources, the bibliographies mentioned above are also used for this purpose.

Finally this bibliography about Kurdish folklore came up and it is believed that this work which is open for extention like all bibliographies will be an example for this kind of works in the future, and will also be a step to compose a good bibliography of Kurdish folklore by compiling sources from other languages such as Arabic, Persian, Turkish, German etc.

WERGEREK / A TRANSLATION

Li ser Edebiyata Kurdî & Li ser Melayê Cizîrî

Martin Hartmann

Ji Almanî: Abdullah İncekan*

Pêşekî

Martin Hartmann yek ji rojhilatnasên navdar yê Almanyayê ye. Ew di sala 1851î de li Breslauê (Polonyaya iro) tê dinê. Li pey qedandina zanîngehê ew li ser zimanê Samî di bin navê *Die Plurilateralbildungen in den semitischen Sprachen* doktora xwe dike. Dû re ew li Edirne û Stenbolê dimîne û zimanê Tirkî hîn dibe. Di nav salên 1876-1877an de Hartmann li Beyrûdê li konsolosxaneyê wek tercuman dixebite. Di vê demê de ew li bajarên devûdor digere û wan ji nêzîk ve nas dike. Gava di 1887an de Bismarck li Berlinê enstitûya bi navê *Seminar für Orientalische Sprachen* vedike, Hartmann li wir dest bi kar dike û hetanî teqawudbûnê di 1918an de li wir dixebite.

Hartmann li ser gelê musilman û coxrafyaya wan gelek xebatan dike. Ew ji Edirneyê bigre ta Stenbolê, ji Suriyeyê ta Lubnanê, ji Misirê ta Lubnanê, ji Libyayê ta Çinê lêkolinan li ser ziman, adet û gelên van deran dike. Ji bo ku Almanya ji vê coxrafyaya hanê ji nêzîk ve nas bike, ew bi hin kesên din re di sala 1912an de civata *Deutsche Gesellschaft für Islamkunde* (Civata Almanî ji bo nasîna Îslamê) ava dike û ev kom bi navê *Die Welt des Islams* (Cîhana îslamî) kovarekê derdixe ku hê jî té çap kirin.

* Lékolîner, Almanya
reasercher, Germany.
e-mail:
aincekan@gmail.com

Martin Hartmann di xebatan xwe de ciyekî taybet dide Kurdan jî. Xebata wî yan pêşîn di heqê herêma Botan de di sala 1896an de wek pêveka kovarekê bi vî navî der tê (68 rûpelî ye):

Bohtân. Eine topogr.-histor. Studie (Botan. Lékolîneke topografik û dîrokî)¹. Aus: Mitteil. der Vorderasiat. Gesellschaft 1896, Berlin.

Salekê dù re ew besê dudiyan yê vê berhema xwe, ya ku ïcar 112 rûpelî ye, diwesîne. Di van herdu xebatên xwe de ew li ser navê gund, eşîr û bi gelempêri li ser Botan diseleine.

M. Hartmann salekê li pey vê xebata han ïcar bi nivîsekê li ser edebiyata Kurdî li ber xwendevanên xwe ye. Nivîsa 10 rûpelî di kovareke li ser Rojhilatê de der tê:

Zur Kurdischen Literatur (Li ser Edebiyata Kurdî). *Wiener Zeitschrift für die Kunde des Morgenlandes* 12 (1898), rûpel 102-112.

Martin Hartmann di sala 1904an de Dîwana Melayê Cizîrî wek fotolitografi çap dike. Ji bo ku xwendevan di heqê berhemê de bibin xwedîyê fikrekê, ew jê re pêşgotinekê amade dike û wê li Berlinê derdixe.

Ji bo xwendevanên Kurd ji van xebatên Martin Hartmann haydar bibin, min nivîsa wî ya li ser edebiyata Kurdî wergerand Kurmancî. Pêşgotina wî jî berî du salan di kovara Nûbiharê de weşiya bû. Ji ber ku herdu nivîs hevdû temam dikan, me muhîm dît herduman bi hev re biweşînin. Weku dê xwendevan bibînin, zimanê metnan di hinek noqteyan ji Kurdî dûr dixwiyê. Elbet min dikarîbû hin cumle û awayê gotinê ji zimanê eslî yê herdu nivîsan dûrxista, lê min xwest bira xwendevan bi uslûba nivîskar jî bihese, loma jî bêhna wergerê ji wan tê. Ji ber kêmasiya demê min îmkan nedît li name û nivîsên din yên Hartmann binihêrim. Îhtimal heye ku di wan de behsa Kurdan bûbe.

Beriya ku em cî bidin herdu wergeran, ez dixwazim noqteyekê bînim ziman. Di *İslam Ansiklopedisi* de, ya ku Diyanetê amade kiriye de, maddeyek ji bo danasîna Martin Hartmann û berhemên wî jî heye. Tişta balkêş ev e ku tê de bi tu awayî li ser van hersê xebatên Hartmann nehatiye sekinîn.

Abdullah İncekan

¹ Hêjayî gotinê ye ku Nûbihar niha vê berhema han dide wergerandin. Bi hêviya ku ew zûtirîn li ber destê xwendevanan be.

LI SER EDEBIYATA KURDÎ

Jaba di *Recueil de notices et récits kourdes* (Pet. 1860) de ji rûpela 8an pê ve di heqê heşt şairên Kurd de notekê dinivíse. Yê kevn, Eli Herîrî di 471î de, yê dudiyan, Melayê Cizr² di 556an de, yê sisêyan, Muhammed, wek Feqiyê Teyran tê binavkirin di 777an de, yê çaran, Melayê Batê di 900î de, yê pêncan, Ehmedê Xanî di sala 1063yan de, yê şesan, İsmail di 1121î de, yê heftan, Şerif Xan di sala 1161î de, yê heştan, Murad Xan di sala 1199an ya koçî de wefat kiriye.

Heta niha kes ji destxetên ku berhemek wan jî hin berhemên van şairan dihe-wandin, haydar nebû. Di vê noqteyê de di Adara 1896an de bi têkiliya hevalekî ji Stenbolê destxetek kete destê min ku li gorî salixdanê aîdî Kurdeki ye ku li wê derê dijî. Min dû re dît ku di vê destxeta ji 542 rûpelan ne kêmtir ya ebata 21x14.8 cm de, beşen muhîm yên di listeya Jaba de hatibûn ziman, cî digrin. Hema rûpela 2yan vê sernavê nîşan dide:

هذا قصيدة شيخ احمد الجزري المسمى بـ بلا³

Meriv dikeve dudiliyan, ka ev gotinêni bi hibra sor hatine nivîsin ji destê wî nivîsevanê ku metna qesîdeya jêrîn nivîsiye ye yan na. Xuya ye wî ji nivîsina bi herfîn mezin yên ji hev dûr heznekiriye. Nivîsina bi herfîn nêzîk û tevlihev yên di rêzan de zêdetir li ber dilê nivîsevan bûye. Danberheveke ciddî ya herfan nîşan dide ku sernav bi eynî destî ku temamiya metnê nivîsiye, hatiye nivîsin. Îhtimala ku kitêbfiroşek sernavekî din nivîsibe, tuneye.

Qesîdeya ku xwe dighîne rûpela 20î ji 128 qitayêñ çar rêzî pêk tê. Ew bi wezna ————— hatiye nivîsin. Naveroka wê mîstîzm e.

Ew di rûpela 21î de bi vê sernavê bi Dîwanê dest pê dike:

هذا ديوان رئيس الشعراء شيخ احمد الجزري رحمة الله

Di rûpela 222yan de ew bi van gotinan diqedê:

قد تم ديوان ملا احمد الجزري في يد العبد للسيد

² Nîsbet bi vê şêweyê xerabbûyî yên Cizreyê ye (Bnh. Cezre di -kitêba min- *Bohtan* de, rûpel 20). Forma belavkirî Cezerî ye.

³ Haza qesîdetun Şêx Ehmed el-Cezerî el musemma bi Mela (Ev qesîde ya Şêx Ehmedê Cizîrî yên ku bi nasnavê Mela hatiye navdayîn.)

Di vê berhevokê de ev besên jêrîn yên xwediye ciyekî taybetî ne, hene:

1. Diyalogeke di navbera şair û kesekî din ku wek Mîr tê binavkirin, 19 dumalikên 6+6 rêzî bi wezna ملا rûpel 202-208. Sernavê dumalika pêşin سئوال ملا (Suala Mela) û جواب میر (Cewaba Mîr) e, li jorî yên din tenê *Mela* û *Mîr* hatine nivîsin. Bi gotina *Mîr*, ez derhal li Emir Umadeddin⁴ difikirim ku gava şair [Mela] di 540î de li wir navdar bû, ew hukimdarê Cezîrê bû. “Xwişkeke vî hukimdarî hebû ku dilê Şêx Ehmed ketibûye. Ji bo wê wî gelek xezel nivîsbûn û di ser de jî dîwançeyeke bi navê Dîwana Mela qedandibû... Dû re mîr Umadeddin xwast evîna wî ya platonîk biceribîne û zewaca xwişka xwe teklif kirê. Şêx Ehmed qebûl nekir (ji bona ku redd-kirina xwe îsbat bike û nîşan bide ku evîna wî ya ji xatûnê [prensest] re ne ji bona zewaca bi wê re ye, wî cî neda hestan)”. (Jaba, Recueil, rûpel 8 û dewama wê). Herdu malikên dawîn şuphe nahêlin ku kesê ew pê re xeber dide, ev hukimdar e:

ملا

ز برا قلزما میران	بغواصي گهر چينم
دبحى شرح تفسيران	تو دريايان وه نابيهم
ژ مير و بگارين جيران	غلامى مير عمامدينم

مير

د دلغا لفظ و معنا لى	مه كيشا شانه شمشاده
ژ ۋى املا و انسائى	مه لوحى دل نىما ساده
ژ حسنى رونقك دائى	كو شيخ احمد مه استاده

Şair dibêje: “Ez xulamê Mîr Umadîn⁵ im.” Mîr dibêje: “Ku Şêx Ehmed me ustاد e”. Çawa di qitayêن dawîn de, herwisa di cîhêن din de jî xuya ye pesin heye.

2. Xeberdana di navbera Feqiyê Teyran û Şêx Ehmed Cizîrî, 21 dumalik û qitayek bi tenê. Her malikek xwediye şes rêzikên heft heceyiye ku min nikarîbû ez wezna wan derxim, rûpel 208 hetanî 215. Sernavê hemû besê ev e:

مکالمه فقه طيران و شيخ احمد الجزمي

Fقه طيران malikan (Feqî) û ملا (Mela) bi dor hatine nivîsin. Bi meriv derhal li Muhammed difikire ku wek Feqî Teyran jî tê binavkirin. Ew di listeya Jaba de wek şairê sisêyan derbas dibe. Ku di metna Kurdi ya Jaba de ew bi awayê

4 Di şûna ‘imad de.

5 Şêweyê nav ne xerîb e. ‘izz eddîn dibe ‘izdîn û ‘ezdîn (di heqê vê de li kitêba min *Bohtan*, rûpel 80, not 2, bn.); zaîn eddîn dibe zaîdîn û her wekî din.

فقي طيران hatibe nivîsin, asteng nine ku Kurd di nivîsîna kelîmeyên biyanî de bê dîqet in, lê şair Feqiyê Teyran di sala 777an de miriye, loma jî Şêx Ehmed nikarîbûye pê re qise bike. Tenê iştimal dimîne ku di 550î de kesekî xwedîyê eynî navî bûye yan jî gotina فقه طيران 'hîkmeta teyran' mecaz bûye ku li vir xeber didin. Bi qasî ku ez ji muhtevaya misrayan fehm dikim, ew bi tenê mîstîkî ne.

3. 17 Rubâi bi wezna Rubaiyan, rûpel 216-220.

4. Li ser xebitîna helbesta pêşîn ya Dîwana Hafiz bi wî awayî ku hin misra bûne du perçe û di dawiyê de li qitayeke heşt misrayî hatine zêdekirin, rûpel 220 hetanî 222. Temamiya beşa Dîwanê ya di pêsiya vê perçeyê de cî digre (rûpel 21-202), ji şîrîn tenê pêk tê ku bi weznîn cihê hatine nivîsin. Di nav wan de herî zêde ji wezna *Remel* hatiye hezkirin. Di dawiya her şîrî de tachallus (texellus- mexles) şair bi awayê ملا yan jî ملی heye.

Di şêwe û naveroka şîran de meriv derhal dibîne ku Mela xwe li mîsalên Farisî girtiye. Mecazên ew bi kar tîne, bi Hafiz têna nasîn; û hin tişt dikarin rasterast wek werger jî bêñ dîtin. Ziman tije gotinê Erebî û Farisî ye, lê bi qasî ez dibînim dîsa jî uslûba wî rasterast Kurdî ye. Gelek balkêş e ku zimanê saf Kurmancî ye, bi tu awayî ji devoka em ji xebatêñ berê, yên ji perçeyên metnê edebî û yên gramêrê yên Xalidî⁶ nas dikin, cuda nine. Ku şîrîn li vir di binê navê "Dîwana Mela" de hatine komkirin, bi rastî jî ji nîvê pêşîn yê qirnê şesan yê hîcrî bin -yanê ji beriya 750 salî bin-, (û se-bebek tuneye ku şasitiyek hebe), meriv dikare bi rihetî were wê netîceyê ku wê demê zimanê nivîsinê yê Kurmancî hebûye û vî zimanî xwe di nav sedsalan de parastiye. Îhtimal gelek mezîn e ku bi vî zimanî gelek berhem hatibin nivîsin û merivê jêhatî dê sedî sed di nav erdê çiyayî yê Kurdan de gelek perçeyen ji vê edebiyatê bibîne. Lomeyên hemû kesên di nav Kurdan de mane (bnh. Xalidî, *Hediye*, rûpel 5, cümle 5) yên di heqê aloziyên mezîn yên devokêñ herêmî ji van gotinan re nabin tezat. Di Erebî de jî zimanê nivîsinê li kêleka devokêñ herêmî de bi serê xwe dijî. Ev devok di serî de hebûne û ewê bi tu awayî dev jê bernedin bijîn. Devok di Erebî de zêdetir di binê tesîra zimanê nivîsinê de mane; ji Kurdî zêdetir ji ber ku jimar, qîmet û fêhma edebiyatê li vir kêmter bûye. Li aliyê din zimanê nivîsinê, yê bi carekê ve hatiye avakirin, dikarîbû di Kurdî de pirr bi hêsanî xwe biparêze: Tenê jimareke piçûk ya mirovan ew hîn bûbûn; mirovîn bêpişê nediketin vî cihê pîroz.

Mesela ew şîira [Xanî] ku wek ya dudîyan⁷ di berhevokê de cî digre, ji hêla ziman

6 Yusuf Ziyaeddîn el-Xalidî, *el-Hediyye el-Hemîdiyye fil-Luxa el-Kurdiyye*, Constantinopel 1310.

7 Qeside û Dîwana Mela wek berhema pêşîn ya destxetê hatin nîşandan.

ve xwediye eynî taybetmendiyan e, digel ku ew 505 sal li pey wefata Mela hatine restin -xêncî cihêbûnên ji ber hilbijartina cureyê metnê derketibin holê.

Ev şîr heman şîr e ku Jaba di nivîsa xwe de -di *Recueil rûpel* 9an de- behsa wê dike û dibêje: Gava Ehmedê Xanî di sala 1000î ya koçî de li Bazîdê bi cî bû, berhemekê nezmê bi navê Mem û Zîn (un ouvrage en vers, intitulé: Mem-u-Zin) nivîsiye. Socin di *Kurdische Sammlungen* rûpel 99an de dibêje: “Nusxeyeke şîrê li Cizirê hebû; lê xwediye wê Feqî Emer nexwest musveddeyê bifroşe min.”⁸

Di Constantinopel⁹ de şîr di navbera rûpelên 224-403yan de cî digre. Sernavê wê ev e:

اين كتاب من كلام جناب مولانا احمد افندى رحمة الله وهو المسمى بالمم زين

Li ser wê jî ji destekî din, sernaveke din:

هذا كتاب من تاليف ملا احمد الخانى

Helbest ji 51 beşan pêk te; ev beş bi sernavên cihê-cihê dirêj yên Farisî û bi qe-lemâ sor ji hev hatine qetîn.

Forma wan hêsan e: Dumalikên bi wezna _ _ _ _ _ ku bi qafîye ne. Ji ber ku wezn bi itîna hatine amadekirin, di xwendina metnê de dîbin alîkariyeke mezin.

Zimanê wê bi pirranî hêsan e û rihet diherike; lê dîsa jî di fêhmkirinê de gelek caran zehmetî derdikevin, ji ber ku hin gotin û biwêj tê de hene, yên di kitêbên di destê me de nehatine îzahkirin. Di gelek rûpelan de maneya gotinê tê fehmkirin, lê ji nişka ve ciyêngîşîn beyar derdikevin pêşîya me. Ji ber vê jî ez naveroka vê perçeyê nadim¹⁰. Îdî bûye ferz¹¹ ku ew zû were weşandin. Alîkariya ku pirtûkxaneya qraliyetê li Berlinê ji bo destxetê dide, gelek kêm e. [Eduard] Sachau şîrê di seyaheteke li rojhilata navîn de bi yekî Sûriyê dide nivîsin; encama wê Ms. Sachau 320 û 342 ye. Mixabin ew di heqê nusxeya bingehîn de tiştekî nabêje. Nivîsevan, yê ku bi ihti'malekê xêncî

8 Di heqê herdu destxetê Jaba bidestxistibû û perçeyê li Muzexaneya Asyayê ya St. Petersbûrgê de ku Lerch jê wergerek dabû li wir mêze bike. Berhema Ehmedê Xanî, ya ku demekê di destê Socin de mabû, ew wî bi rastî jî wek “berhemekê ku hemû taybetmendiyê edebiyata zanayên Kurd di xwe de dihewîne.” bi nav dike. Di heqê têkiliya wî ya bi berhema gelî ya muhim ku Socin di No 31î de dide, ez tenê dikarim bibêjim ku her du bi tu awayî bi hev re girêdayî nînin. Meriv dikare bibêje ku ev çiroka gelî ya bi devoka Botî zêdetir dişibe metnekê ku nivîskarê wê jî kêmî kêm bi qasî yê metna din muhîm e, lê mixabin temam nine; û bi devoka Sauğbulaq (Saucbulaq [Sa-vucbulaq navê berê yê Mahabadê]) behsa mijarê dike û li cem min heye.

9 Destxeta ku ez li vir behs dikim, bi vî awayî bi nav dikim.

10 Naveroka wê bi gelemerî li cem Lerch, di *Mélanges asiatiques III* de, rûpel 242 û pe ve, heye.

11 Lerch jî ev daxwaz anîye ziman, rûpel 254.

zimanê xwe yê zikmakî -zimanê Sûriyê- Kurdî jî bi têra xwe zanîbûye¹², bi gelempêrî nikarîbûye zimanê Kurdî yê nivîsinê yê Xanî fehm bike; wî ew bi mekanîkî û di ser de jî bi destnivîseke tevlihev nivîsiye. Ku wî destxeta li ber çavan girtibe, wê demê meriv dikare bi rihetî bibêje ku destxeta wî jê nivîsiye di gelek noqteyan de tezatî Constantinopel e. Hin caran hin misra hene ku di Constantinopel de qet tunene. Di [Eduard] Sachau de, 320, di dema niha de gelek caran *t* heye, di Constantinopel de herfa *d* heye. ... Lê di van noqteyan de E. Sachau 320 ne bi rêk û pêk e¹³.

Niha ji bili vanan du MSS. Sachau, 344 û 341, wekî 320 û 342yan yên navê wan derbas bû, deşifreya wan û wergera Erebî bi “alfabeya” Sûriyê hene. Xuya ye ev xebat jî ji destê eyñî mîrovî ye ku orijînalâ Kurdî bi Erebî jî nû ve nivîsiye; ew kêrî tiştekî nayê û tenê nîşan dide, ka gava mirovên Rojhilata Navîn, xisûsen yên Sûriyê, di tiştekî de karê dibînin, ci dikarin bikin. Mêrik ev kar bê dilxwazî kiriye, lê wî ew kiriye; yanî wî bi sefalet gotin bi gotin wergerandiye, bêyî ku ji xwe bipirse, ka ew gotin maneyekê didin yan na. Na, carna jê re îlham jî hatine! Beşa 4an, misra 23 bi vî awayî ye:

لورا کو جهان وکی عروسة
وی حکم ددست و شیر روسة

Maneya wê ewha ye:

هنا صار العالم مثل العروس
نحن عطينا حكمة بيدة مثل روس

û li dawiyê wî nivîsiye: دولت روسیا

Şâîr bi bîr neaniye ku li Rûsan bifikire. Şûr “şûrê tezî ye.” Mîna vê yanê baqilo di eyñî besê de, di misraya 39b'yê de, Almanya jî kiriye nav mijarê. Misra wiha ye:

هندی کو ژشجاعتی غیورن
او چند ژ منّتی نفورن

Jeremias ci jê derdixe?

بمقدار ما هم غيورين بشجاعة
هلاقنر يشمازون من المانية

Meriv dibêje qey vî camêrê hanê bi zanebûn ev xerabî kirine, ji ber ku zanîbûye ku yê ku kar daye wî jê fehm nake. Maneya misrayan ev e: “Hindî ji şeca'etê xeyûr in (Kurd), ew çende ji minetê nefûr in.” Jeremias ew wiha wergerandiye: “Ew çende

¹² Ger Jeremias Şamir be, wî yê devoka Hekkariyê (esasen ev binavkirineke gelek bi şubhe ye) xeber dabe; ev tişt ji MS. Sachau rûpel 250î der tê (Bnh. Lidsbarski, *Neu-Aramäische Handschriften* 1, rûpel xxv)

¹³ Tişta ku ji bo SACHAU 320 hatiye gotin, ji bo SACHAU 342 jî derbas dibe.

ji Almanyayê nefret dikan.” Ev mîsalên piçûk têr dikan. Misrayêni ji aliyê gramer û naverokê ve rast hatine wergerandin mustesna ne.

Di dawiya şîrê de dîrokek heye ku, bi sala wefata şâir ya Jaba dide re di tezatê de ye. Beş 51, misra 152-154 (rûpel 403, rêz 8-10) bi vî awayî ye:

خطی تیه سر نوشت سر مشق سه ساله خطای تکت مشق
لورا کو دما ژ غیب فک بو تاریخ هزار شخص ویک بو

پیساله کهشته شخص و چاران وی پیشروی کناه کاران

Bi qasî ku ez misrayan fehm dikim şair dibêje, ew bi zehmetî sê salan li ser berhemê xebitiye; gava ew ji nebûnê derket, sal 1061 bû; niha ew ketiye sala 64an. دحزا رو شیصت و سیدا. Ev tezat e û gotina şair bi xwe jî li hember tesbîten Jaba yên di nivîsê de ye. Tarîxeke din jî di heqê şair de li cem Xalidî (*Hediye* No 279) derbas dibe ku dibêje wî Nûbar di 1094an de nivîsiye. Ev agahî bi *tarîxa* di dawiya Nûbarê de tê tesdîqkirin. Ji bo zêde agahî li jêrê binihêre.

Metna sisêyan ya destxetê rîsaleyeyeke tibbî ye, rûpel 404-410. Ew bi vî sernavê ji destê kesekî xerîb e:

هذا نسخة الطب بلغت الكرد تاليف ملا محمد الارفاسي

Xuya ye di heqê nivîskar *Muhammed Elarvasî* de tiştekî din tuneye. Lê Xalidî di *Hediye* xwe de di nav berhemên nesrî yê edebiyata Kurdî de vê rîsaleyê jî bi bîr tîne (rûpel 276, rêz 5 û dewama wê de). Xalidî wê wiha bi nav dike:

رسالة ملا محمد الارفاسي في علم الطب

No 4, rûpel 412-452, *Nûbara* wekî din jî navdar, ferhengoka Erebi-Kurdî ya bi wezn ya şairê Mem û Zînê ye. Di notêni Jaba de jî behsa wê tê kirin, lê di binê navê Nûbihar de. Destxeteke wê, ya ji destê kesekî din¹⁴ e ku tenê çend misra jê kêm in,

¹⁴ Ev tişt ji gelek noqteyêni cihê-cihê dixwiye. Car-carna metna Xalidî li gorî kîfî hatiye nivîsin; di misraya 5b de wiha ye (Constantinopel, rûpel 412, rêz 7): عرب حجم كرمانيج و . Xalidî di rûpel 279, rêz 16 de: عرب و حجم و كرمانيج و . Ez texmîn dikim ku Xalidî g - tina rûmî bi zanebûn nexistiyê, ji ber ku binavkirina Tirkân bi vî navî = رومي . Justi-Jaba, Dictionnaire) li zora wî çûye. Ji nav cihêbûnên din ez dixwazim tenê bînim ziman ku besa *erkan el'islam û el'imam*, yên di Constantinopel de li pêşîya *tarîxê* ne, li ba Xalidî li dû wê ne, lê di Constantinopel de tenê hersê misrayê pêşîn yên di Xalidî de hene, cî digrin. Herwiha di Constantinopel de deh misrayêni ku di Xalidî de di rûpel 293yan de di bin navê قطعة من ديوان المشار اليه hatine dayîn, tunene. Notek ku Xalidî li dû Nûbar û Eqîdeya Ehmedê Xanî (rûpel 398) bi cî dike û wergera wê wiha ye, me di heqê çavkaniya Xalidî de ronî dike: Li dû

di *Hediyeya Xalidî* de (rûpel 279-292) cî digre. Xalidî bi çend gotinê kurt dest pê dike ku tê de wiha tê gotin:

الفها (هذه القصيدة) العارف الربانى صاحب التأليف الذى فاخر بها القاصى والدانى شيخ مشائخ الجزيرة علامة كرستان مولانا و قدوتنا السيد احمد خانى قدس سره العالى سماها (نوبار) والعامنة تقول (نوبهار) ز

Ji van gotinan qîmeta şair, ya ku ew li welatê xwe hê jî pê mezher e, dixuye û ji wê jî sernavdayîna Jaba dikare bê derxistin; li hember vê Constantinopel sernavdayîna Xalidî wek ya rast dibîne û dide. Xalidî di berhema xwe ya li jor behsa wê bû de sala nivîsina berhemê wek 1094 nîşan dide. Wî ev tarîx ji ku derxistiye? Ji tarîxa ku şair bi xwe di dawiya kitêbê de daye (Xalidî, rûpel 222 = Constantinopel rûpel 452). Dayîna tarîxê bi ewqas bend û fen hatiye dayîn (di nav jêrenotan¹⁵ de ez wê li gorî Constantinopel didim) ku şîroveya wê lazim e -weke ku di Constantinopel de li kêlekê hatiye kirin. Li gorî vê tarîx ev e: Seeta çaran ya nîvî roja sisêyan ya meha şesan ya sala 1094an ya koçî.

Parçeyê pêncan, rûpel 453-467, *Eqîdeya Ehmedî Xanî* ye, ya ku Xalidî (rûpel 294-297) dîsa bi destnivîsa¹⁶ yekî din çap kiriye. Di Constantinopel de rûpel 467 nota dawîn wiha ye:

لسلطان عارف الامجد قد كمل فى وقت اسعد تاليف شريف ملا احمد

Rûpel 468 û 469 bi parçeyên biyanî hatine tije kirin. Di rûpel 468an de şes dumalikêن Nîzamî, di rûpel 469an de şîireke bi Tirkî di bin sernavê *Na't-i Şerîf* cî digrin.

Parçeyê şesan (rûpel 470-528) dîsa şîireke ferhengî ye di bin navê *Gül Efsan* bi uslûba *Nûbarê*. Ji aliyê Şahîn Xanî ye, nivîskar wekî din nayê naskirin. Li gorî

ku min jê re beşen derbasbûyî yên birêz Ehmedê Xanî xwendin, ustاد Şêx Ebdullah Faîzî el Muhammed el-Ensarî ji bajarê Mûşê, ji terîqeta Neqşibendi, li Constantinopel dimîne, ev tişt li gorî wî hatine nivîsin, فهو صاحب الرواية فيها (heşt misra hatine dayîn). Ev gotin bi eynî awayî îsbat dikin ku edebiyata neteweyî ya Kurdan li cem wan ciqas zindî ye (li gotinê Feqî Emer li ba Socin jî binihêrin, *Kurdische Sammlungen*, Werger rûpel 99, rêz 15). Bi tu awayî şuphe tê de tune ku li paytextên demekê yên desthilata Kurdan (Cezîre, Bedlîs, Sêrt, Bazîd) û hetta li Stenbolê jî xizneyên qîmeta wan nayên texmîn kirin, bêñ dîtin.

15 افرنگه دبیزت هانى اکر تو بادعاني بفکره کتیبا ثانی د جلدی اول دا ژ جزوّا عاشر د ورقى چارى دا ژ صفحى دست رابست د سطرا ثالث دا ژ کلیمیا ثانی بگر تو حرف چارى تاریخه ژبو نوباری

16 Ji cihêbûnan ez misra 13a didim. Li Constantinopel: كوران ژurban ژبو وى هنار شهاند Xalidî Rêz 14a: Constantinopel شهاند دکل وان هنار din.

dumalikên 3 û 4 yên beşa dawîn şîr ji 359 misrayan tê meydanê û di sala 1160î de hatiye amadekirin¹⁷.

Rûpel 529 vala ye.

Di rûpel 530-541 de şîreke bi Farisî li ser stérkan e; bêyî ku navê nivîskar were dayîn û bê sernav. Di dawiyê de ev not heye: **قد تم نسخة نحوم** Sala nivîsinê ji rûpela 540î, ji rêza 4an der tê; sal 1159 e.

Li ser qîmeta mezin ya destxetê meriv nikare gengeşiyê bike. Di 222 rûpelên pêşîn de abîdeyeke edebî, ya ku hetanî niha bi nav nedihat naskirin, bi kopyayeke têkûz heye; mîrata herî kevn ya edebiyateke ku li Ewrûpayê hetanî niha nayê nas-kirin. Li ber esera hanê qîmeta yên mayîn wenda dibe. Ji ber zehmetiya fehmkirina metnên Kurdî, li rê ye ku Dîwana Mela bi teknîka fotomekanîk çap bibe, da ku her-kes bikaribe xwe bîghînê. Mîsaleke ji vê re li vir hatiye dayîn. Di ser de jî rûpeleke hatiye hilbijartin ku derbasbûna navê *Mîr Umadîn* taybetiyekê didê (li jor bnîh.).

Kurtedemekê beriya girtina nusxeya kontrolê, min hejmarêن 1-5 yên rojnameya *Kurdistanê* ya ku li Kahirê ji aliyê kurê rehmetiyê Bedirxan Paşa, Miqdad Midhat Beg tê derxistin, girtin. Rojname, ji ber ku di hêla xwe de yekane ye, balkêş e, lê dilê min zêdetir lê rûnişt, gava min dît -li dû ku sîparîşa min di cî de hat şandin- ku ji hejmara dudiyan pê ve perçeyek ji Mem û Zînê (li jor bnîh.) tê de tê weşandin. Li gorî hejmar 2, rûpel 4 di destênen Miqdad Midhat Beg de wergereke Erebî ya berhemê heye ku miheqeq ji ya li jor behsa wê hat kirin, çêtir e. Ji notekê (hejmar 3, rûpel 3) jimara pirrbûna destxetan derdikeve holê ku li gorî wê Hecî Ebdilqadirê ji Sora¹⁸ tevahiya şîrê bi destê xwe nivîsiye. Mixabin wiha dixwiye ku ji rojnameyê re umrekî kin nesîb bûye. Bi hejmara 5an, ya 4ê hezîrana îsal, hatiye girtin. Ew li Tirkîyeyê qedexe ye û her Kurdê ku ew di destan de bê dîtin giran tê cezakirin.

ور ببیژی چند بیتێن ای همام سی صد و پنچاه و نه بیتێن تمام
17 هم ژ ابجد غین و قاف و سین دان بو کل افشاری چه خوش تاریخه ان

18 Xuya ye devoka vê herêmê xwedîyê taybetiyen e; tê gotin ku Ebdilqadir bi Kurmancî şîr nivîsîne, lê zimanê wî yê Sora bûye.

LI SER MELAYÊ CIZÎRÎ*

Bi wasita lutufkar ya birêz Dr. Hermann Gries, wergêrê pêşin yê sefareta împaratoriya Alman li cem cenabê mezin yê Sultan, di Adara 1896an de destnivîsa tovkirî, ya ku aîdî hevalekî birêz Gries bû, ket destê min ku esera edebî ya li vir wek fotolitografi hatiye dayîn jî tê da bû. Min di *Wiener Zeitschrift für die Kunde des Morgenlandes* 12 (1898) de, rûpel 102-112, raporeke kurt li ser nivîsî.

Di destnivîsa tovkirî da xêncî hinek perçeyên ne bi Kurdî ev berhemên han yên bi Kurmancî hene:

1. Şîireke bi sernavê “Qesîdeya Şêx Ehmed el-Cizîrî (ku bi Mela tê binavkirin)” rûpel 2-20
2. Dîwaneke bi sernavê “Dîwana Şaîrê Mîr Ehmed el-Cizîrî” bi îmzeya “Dîwana Mela Ehmed el-Cizîrî” rûpel 21-222
3. Şîira Mem û Zîn ya Mela Ehmed El-Xanî, rûpel 224-403
4. Rîsaleyeke tibbî ji alîyê Mela Mihemmed Elarwasî, rûpel 404-410
5. Ferhengoka Erebî-Kurdî *Nûbar* ya Mela Ehmed El-Xanî, rûpel 404-410; ev ji aliyê Albert von Lecoq -ku wî ji Suriyê ji destnivîsekê peydakiriye- di kitêba *Metnên Kurdî* da (Berlin 1904) wek fotolîtografi hatiye derxistin
6. Eqîdeya Mela Ehmed El-Xanî, rûpel 453-467
7. Şîireke wek ferhengok bi sernavê *Gul Efsûn* bi terza *Nûbara Şâhîn Xanî*, rûpel 470-528

Parçeya herî muhîm rûpelên 2 heta 222yan¹⁹ e ku li vir hatiye dayîn –ev perçe di destnivîsê bi xwe de wek xebata edebî ya Şêx Ehmed el-Cizîrî Îbn Omer tê nîşandan. Ji ber ku di rûpelên 220-222yan de *terkîbbendek* heye ku tê da misrayên dawîn yên çarînên şîira pêşin ji Dîwana Hafiz hene, dikarin li hember vê beyanê hinek şuphe hasil bibin. Lê Şêx Ehmed di sala 556an de (1161), Hafiz jî di sala 791î de (1389) wefat kiriye û mumkîn nine ku bikaranîneke wiha aîdî şâîrê me be. Meriv nikare vê îsnadkiranîa şaş wek delîl qebûl bike û xebatên wî bi tevahî mîna xebatên kesên din nîşan bide. Ez rastî ciyêن ku meriv dikare bibêje kesin ji şîira Farisî ya dû 556an hatine girtin, nehatim. Divê meriv bê şuphe qebûl bike ku rûpelên 2-219yan

* Martin Hartmann, ev nivîs ji bo Dîwana Melayê Cizîrî ku di sala 1904an de li Berlinê çap kiriye, wekî “Pêşgotin” nivîsiye.

¹⁹ Reqema 1 di dosyê de tuneye.

mehsûlên nivîskarê ku navê wî di destnivîsê de hatîye dayîn, in. Îcar wê demê em xwediyyê kitêbeke bêhempa ne. Heta niha destxeteke din ya eserên Şêx Ehmed ê Cizirî tuneye. Di sala 1900î de ez pê hesiyam ku şêsek Kurd ji wîlayeta Wanê idîa dike ku di destê wî da dîwanek heye; lê min tiştekî qetî tesbit nekir. Albert von Lecoq di sala 1902yan de tesbit dike ku Kurdêni li Surîyê bi navê Dîwana Mela dizanin, lê wan gotine ku di destê wan de ew berhem tuneye. Îhtimal heye ku nusxeyê din, belkî yê ji eva hanê çêtir û kevintir, derkevin holê. Sebebênu min qerar dayê ez nusxeya Stenbolê bi halê wê yê orîjinal derbixim, ew in ku him ne qetî ye em nusxeyek din bibînin û him jî divê ez vê nusxeya hanê şûnda bidim xwediyyê wê û li aliyê din qedera destnivîseke di destê yekî şexsî de jî nedîyar e.

Gava meriv bide ber çavênu xwe ku ev berhem di edebiyata Kurmancî de abideya duduyan e, wê demê qîmeta wê bi xwe der tê holê –bi şertê ku meriv gotinênu Kurdan yên di heqê edebiyata Kurdî di kitêba Jaba *Recueil de Notices et Recits Kourdes* rûpel 8an de rast qebûl bike. Ev abideya kevintirîn ya vê edebiyatê ye ku di destê me de ye, gava li ciyekî Dîwana Elî Herîriyê kevn, mirina wî di 471an (1078) de ye, dernekeve holê.

Wiha xuya ye ku di heqê şâir de sirf di kitêba Jaba de, ya ku li jor navê wê derbas bû, agahdariyek heye. Li wir tê gotin (rûpel 13 û dewama wê²⁰): “Şâirê duduyan Melayê Cizirî ye. Ew ji Cizirê, ji Botan e. Navê wî Şêx Ehmed e. Ew di sala 540î de li Cizirê dertê holê. Di wî wextî de Mîr Îmadeddîn mîrê Cizirê bû û xwîshekeke wî hebû. Dilê Şêx Ehmed ket xwîşka Mîr. Wî gelek xezel nivîs i û dîwanekê piçûk jî amade kir ku navê wê “Dîwana Melayê Cizirî” ye. Zimanê Dîwanê zimanekî zerîf (mustelîh) e û Kurd gelek jê hez dikin. Mîr Îmadeddîn ji bona ku mêze bike ka Şêx Ehmed bi rastî ji wê hez dike yan na xwîşka xwe da wî. Lê Şêx Ehmed qebûl nekir. Wî di sala 556an de wefat kir û gora wi li Cizirê ye. Gora wî ciyê ziyaretê ye”.

Bê şik ev Mîr Îmadeddînê ku li vir behsa wî ye ew mîr e ku şâir di 19 cot qit'an de bi wî re qisedike (rûpel 202-208). Sernavê herdu qit'ayêne pêşîn “sewala mela” û “cewaba mîr” in, yên dawîyê sirf “mela” û “mîr” in. Sirf di her du qit'ayêne dawîyê de behsa navan tê kirin; gotina şâir bi “Ez xulamê mîr Îmadîn” im û ya mîr jî bi “Ku Şêx Ehmed me ustاد e” tê dawî kirin.

Ev Îmadeddînê ku li cem şâir bûye Îmadîn kî ye? Gelo ew, ev mîrê mehellî ye ku tekiliya Mela pê re heye? Gelo ev meriv, ew kesê ku Jaba çiroka wî dibêje ev e? Yan jî ew merivekî naskirî ye di tarîxê de?

Bi îhtîmalekê emê cewabeke me têr bike bibînin. Di sala 521î de Îmadeddîn

20 Ev wergera hanê ne wek wergera Jaba ye.

Zengî, bavê Nûreddînê mezin, Cezîra Îbn Omer fetih kir. Îbn Elatîr behsa vê sala hanê dike û dibêje eger bajêr teslîm neba, ewê wê şevê li ber lehiyê biketana û mîr û leşkerên wî helak bûna. Îmadeddîn di 5. Rabiussanî 541î de (14. Ilon 1146) ji aliyê koleyên xwe ve tê kuştin. Gava Mela, weke ku Jaba dibêje, bi rastî di sala 540î de dest bi nivîsina şîiran kiribe, wê demê gelek wext dimîne ji bo ku ew bi mîr re têkeve têkiliyê û ev qisedana di şîrê de jî tê fem kirin. Lê meriv nikare van tarîxan ewqas ciddî jî bigre. Gava Mela bûbe 60 salî, wê demê dibe ku wî di dema fetihkirina bajêr de ji alîyê Atabegê Musulê ve qabiliyeta xwe ya hûnerî pêşda biribe û mîna şâîrên rojava ev qabiliyet kiribe binê emrê Mîr. Ku Îzzeddîn Alî Ibn Elatîrê 74 salan li dû şâîrê me wefatkiriye bi wê heneka li ser zewacê nizane me şaş nake. Ev meriv, nivískarê navdar yê Kamilê, hemşehriyê wî ye û wî bi gotinên dema xwe û demên berê baş dizanîbû. Çiroka romantîk ya di heqê hezkirina Şêx Ehmed ji prensesa bedew piştî salan hatiye dîtin. Lê ku kronist qet bi tu carî behsa şâîrê Kurd ku di wê demê de jî qîmeta wî li cem gelê wî gelek zêde bû, nake, ne tesaduf e. Li vir motîfên neteweyî rolekê dilizin. Famêla Ewlad Elatîr²¹ li Kurdish bi çavekî dostane mîze nedikirin û bi gelempêrî eyan e ku Ereb qîmetê nadîn edebiyatêni biyanî. Ibn Elatîr baş Kurdî zanîbûbe jî, ew lê negeriyaye ku Dîwana Melayê me ji nêzîk ve nasbike.

Melayê Cizirî wek şâîr çiqas mezin e, di heqê vê de ez cesareta ku qerarek bidim bi xwe re nabînim. Lê ez dikarim sirf vê bibêjim: Eyan e ku ev terza şîrê ya tasawufê di serê sedsala pêncan de li Rojava Pêş û ya Navîn bi gelempêrî dihate nasîn û xwendin. Xebateke cidî dikare belkî derxîne meydanê ku şâirekî Farisî wek esas hatiye girtin. Ev kesin e ku em gelek motîf û tabîran ji şîira Farisî nasdikin. Û dîsa eyan e ku hevwelatîyên şâîr gelek zû qîmet dane wî – mîna iro (li jorê mîzebike). Ew tew layîqî şerhbûnê jî bûye: di rupela 128an de bi qelema sor hinin not, bi ڦ, bi zimanê Farisî hene.

Şîira Şêx Ehmed wek abîdeya ziman xwedîyê qîmeteke pir bilind e. Gava meriv sirf li şîira wî mîzebike, meriv netîcyeke qetî dernaxe, ka gelo ew ceribandineke şexsekî ku gelek baş biserketî ye, ye yan xelekek ji zincîrekê ye ku bi aliyekî ve diçe. Di ihtiîmala ewil de ev Dîwana hanê esera li dijî kitêba ji tovkirina kilamên gelerî pêk tê ku berhevkarê wê saleke beriya Şêx Ehmed li rojhîlatê Endelûsê miriye, ye. Em vê berhemê bi navê Dîwana Îbn Quziman nasdikin.²² Lîbelê şîira Şêx Ehmed xwedîyê karakterek dinê ye -bereksî xebata sethî ya Erebê İspanyolî [...]. Ev ne karê

²¹ Li ser famêla Goldziher *Abhandlungen zur arabischen Philologie 1*, 161

²² Fotolitografiya destxetekê tenê jî aliyê David von Günzburg hatiye çapkîrin (Berlin, Calvary & Co. 1896). Jibo gotinên min li *Deutsche Literaturzeitungê* (1896 Sp. Rûpel 1287 mîze bike.

Şêx Ehmed e, ne jî hedefa wî ye. Ruhê ku li vir [li cem Cizîrî] hukim dike, ruhekî ewha ye: Îhtişam, xesasiyet, jixwebawerî, dîqet. Ev xebat him li gor nimuneyên navdar û him jî li gor meyla wextê ye, ya ku di edebiyata Farisiû ya gelên di binê tesîra wan da hukim dikir: Nivîsîna bi motîfên dînî, yanê tesewufî. Em hê di sedsala pêncan de rastî şîrekê têne ku tê de li wê tê gerîn ku fîkrêni şîira tesewufî ya Farisan bi zimanê gel were bikaranîn. Rubaiyên Baba Tahirê ji Hemedan ku di sala 410an de (1019) wefat kiriye, hene ku bi zimanekî ku ji zimanê Şêx Ehmed pirtir nêzîkî zimanê nivîskî yê Farisiû ye²³. Em pê nizanin ka Baba Tahir bi bikaranîna ziman bi vî terzî tenê bû û yên ku li wan derdoran dînîvisîn nêzîkî wî bûn yan na²⁴. Di heqê dewra Şêx Ehmed de em li ciyekî baş in. Em ji notên Jaba dizanin ku (rûpel 13 û pê va) li cem Kurmancan heft merivên din hene ku bi Kurmancî nivîsîne. Em esera şâirek ji wan, Mem û Zîna Ehmed el-Xanî, nas dikin ku li jor navê wê derbas bû. Gava meriv zimanê vê şîrê bide ber Dîwana Şêx Ehmed, dertê meydanê ku cihêbûnên mezin di nava wan de tunene. Ehmed el-Xanî ku di sala 1063an de (1653), yanê 507 (492) salan li dû Şêx Ehmed, miriye ji beldeya Hekariyê ye û Şêx Ehmed ji ji Cizîrê bûye. Yanê wekhevbûna ziman sirf ji ber wekhevbûna şîveyan nine. Bi îhtîmaleke mezin him Ehmed el-Xanî û him jî Şêx Ehmed zimanekî sun'î bikar dianîn. Ew li wê negeriyane ku şîveyen mehellî yekûyek bikarbînin. Ew li wê gerîyane ku ji nava zimanên mehellî zimanekî ava bikin ku di nava cîvatek bi orf û adetên wekhev bi hev re girêdayî ne, bibe zimanê dayîn û standinê. Mînakên wan hebûne. Meriv didît ku welatê Farisan û xwendeyên welatê wan zimanekî nivîskî bikardianîn ku mîna zimanê devkî nebû, lê dîsa jî wek zimanê dayîn û standinê baş dihat bikaranîn. Ma çîma ceribandineke ewha ji bo Kurdan ku xwe wek qewmek qebûl dikin, çênebe? Em nizanin ka yên ku li avakirina zimanekî nivîskî xebitîne hedefeke dûrûdirêj dane ber xwe yan na. Lê dîsa jî wan hinek tişt bidest xistine: Kêmî kêm hinek metnên edebî yên bi Kurmancî ji beldeyên ku nivîskar jê ne, derketin. Ew nivîskar ji beldeyên Hekariyê (5), Cezîrê (1) û Bayezidê (2) ne. Ev belde di nav sînorên împaratoriya Tirk de ne. Di heqê ziman de em xwedîyê zanîneke mezin nînin. Lê ev tişt qetî ye ku destana neteweyî ya Mem û Zînê ku ji aliyê Ehmed el-Xanî ve hatiyê nivîsîn, li cem Kurdên Kurmanc yên Tirkiyê tê naskirin û hez kirin. Ji ber ku ev şîira han xîtabî rihê neteweyî dike, dewleta Tirkiyê çapkirina wê naxwaze û ji xwe ji ber vê jî Bedirxanpaşazade 'Ebdurrahman ew di rojnameya

23 Li ser şîweya çarînên Baba Tahir: The Lament of Baba Tahir edited, annotated and translated by Eduard Heron-Allen, London 1902, S. XVI ff.

24 Xeberên li ser muasirê wî Kemaluddîn Pindar ji Raiyê me pêş da nabin; mîze bike: Ethé, Neupersische Litteratur (im Iran. Grundriss), r. 223.

xwe “Kurdistan”ê²⁵ de derxist. Li dû van gotinan cesareteke mezin lazim e ku meriv qala “Kurdiya sereke” yan jî “Kurmanciya sereke” bike. Lê em karaktera Dîwana xwe wek berhemeye edebî ku ji bajarekî yan jî ji herêmekî zêdetir xîtabî milletekî mezin dike, ji wê derdixin ku ew bi zimanê xwe ne tenê ye û -weku li jor jî hate gotin- ew xelekek ji zincîrekekê ye. Wê ev Dîwana hanê jibo tarîxa zimanên Kurdî roleke mezin bilîze. [...]²⁶

Çapxaneya Împaratoriyê bi hûrbûneke mezin ev fotolitografi amade kir. Ji ber ku resima ronahî, qilêr û newekheviyên rengîn li ser kaxîzê derdixe, imkana paqijkirinê tunebû. Em ji paqijkirinek ku ihtîmala şîrovekirinek şexsî dide, dûr man û me ew cî paqij nekirin. [...]

Hermsdorf (Mark)
Gulan 1904

-
- 25 Li ser kovarê li dawiya nivîsa min di kovara *Wiener Zeitschrift für die Kunde Morgenlandes* (S. 112) mêye bike.
- 26 Hartmann li vir qala wê dike ku jibo analîzkirina ziman (û nivîsîna grameran) metnên cihê-cihê lazim in û Dîwana Mela jî di vê çerçevê de muhîm e. Ji ber ku ew li vir rasterast li ser berhem û heyata Mela nesekiniye, min ev beş wernegerand. [Wergêr]

DOKUMENTEK / A DOCUMENT

A Yezidi Commentary by Mawlānā Muhammad al-Barqalī Şîroveyeke Ezidîtiyê ya Mewlana Mihemedê Berqelî

Mustafa Dehqan*

ABSTRACT:

There is a natural tendency in dealing with the Yezidism of becoming overwhelmed by the fascinating and complex details of its present situation, oral tradition, and sacred texts that, however, it is safe to say, defy simple comprehension and adequate explanation. My purpose here, however, is possibly much simpler and that is to suggest what role the Muslim Kurds played against the Yezidis in the 10th/16th century Kurdistan. In part the comments that follow here are especially about the Kurdish Muslim polemics against the Yezidi religion. And depend on an earlier study of mine entitled “The Fatwā of Malā Şâlih al-Kurdī al-Hakkārī”, which may be consulted for the background and sources (Dehqan, 2008). What is provided in the present essay has two sections: i. some notes on the newly-found manuscript of a commentary by Mawlānā Muhammad al-Barqalī who has written it on the *fatwā* of Mawlānā Şâlih, and ii. the edition and English translation of the text which is given here for the first time.

* Independent scholar,
Iran / Lékolînere
serbixwe, Iran

e-mail: mustafadehqan@
yahoo.com

KURTE:

Di xebatên Êziditiyê de meyleke xwezayî heye ku ew bi hûrguliyên ecêb û tevlîhev ên rewşa niha, kevneşopiya devkî û metnên pîroz ve bênen tepisandin, lê dîsa jî, li cih e bê gotin ku têgehîştin û ravekirinên lêhatî pir zehmet e. Li vê derê armanca min piçekî hêşantir e, ezê wê rola Kurdên Misilman rave bikim ku li Kurdistana sedsalên X-XVIem de li hember Êzidiyan hatiye listin. Ji aliyekî ve, şîroveyên li vê derê bi taybetî jî derbarê wan minaşeyenê Kurdên Misilman de ne yên li hember dîmê Ezîdîtiyê. Herweha ew pala xwe didin xebata min a bi navê “Fetwaya Mela Salihê Kurdê Hekkarî” ku dikare ji bo paşxan û çavkaniyan ji vê xebatê sûd bê wergirtin (Dehqan, 2008). Ev gotara me ji du beşan pêk tê: 1. Hin notên derbarê destxeteke tefsîreke Mewlana Mihemedê Berqelî ya ku nû hatiye dîtin ku ew tefsîr li ser fetwaya Mewlana Salih hatiye nivîsîn; 2. Edîsyon û wergera wê metnê bi zimanê Îngilîzî, ya ku cara ewil li vê derê tê pêşkeşkirin.

I. MANUSCRIPT AND AUTHOR

The second Arabic manuscript against the Yezidis I ever had the joy of handling on a visit to the Library of Âstân Quds, in Mashhad, was at the first glance merely a copy of Mawlânâ Sâlih al-Kurdî’s *fatwâ*; although it was a manuscript of four folios (fols. 127r.-130r.) with precisely the same incipit and the same material at least in its first folios, my curiosity was aroused by a further mention of the 10th/16th century Kurdish ‘âlim Mawlânâ Muhammed al-Barqalî. On return home I managed to identify the text as both a complete manuscript of the work of Mawlânâ Sâlih (re-written by Barqalî), that escaped my eye during its edition, and Barqalî’s own commentary on the same work, both belonging to the *qalam* of one of the representatives of the legal experts from Kurdistan.

The present manuscript survives in a *majmû‘a* (Mashhad, Ar.14292/3, measuring 21.2x15.5). The *majmû‘a* in question is comprised of three works. The first one is a commentary on *Fawâ’id al-Zîyâ’îyya* by ‘Ishâm al-Dîn Ibrâhîm b. Muhammed b. ‘Arabshâh Asfarâ’înî (873-1468/951-1544). The compiler shows also his interest in the *Sharh Taşrif* by ‘Izz al-Dîn Zanjânî: the second manuscript. The colophon attributes the copying of these given manuscripts including the third one, that of Barqalî, to Muhammed¹ b. Shams al-Dîn Khudâwirdî. The manuscript, in *naskh* script, is written on 1 Muharram 1005/24 August 1596, in Anatolia. In the Library’s catalogue there are no details about the manuscript’s depository, except for a general reference to the origin of Barqalî’s commentary as coming from the collection of Sayyid Muhammed Bâqir Shîrâzî, a contemporary Shiîte *faqîh* and author of *al-Fiqh al-Islâmî wa Siyr al-Zaman*, who dedicated the *majmû‘a* as an inalienable religious endowment (*waqf*) to the Âstân Quds, in Muharram 1405/October 1984 (‘Irfânîyân, 1991, ix, 336). The text which is the

¹ The name Muhammed is written in *muqaṭṭa‘a* letters: *m+h+m+d*.

subject of this study is to my knowledge unique. In no other Arabic collection that I considered is there such a range of commentaries on the Yezidi religion as reflected in the eyes of Barqalī.

Who was the author in ethnic and social terms? What was the relationship between Barqalī and Mawlānā Sālih? It is hard to answer. In comparison with Mawlānā Sālih, this is a more famed case but we must confess that we do not yet (or any longer) know satisfactory details on Mawlānā Muḥammad Barqalī.

The name Barqalī fortunately is twice buried in the pages of the *Sharaf-nāma*. Although the reading Barqalī still seems to me doubtful but, according to *Sharaf-nāma* and some other primary sources it is a possible close reading of the orthography we have. Sharaf Khān removes any doubt about Barqalī's roots when, in the introductory sentences to the Bitlīs section of the *Sharaf-nāma*, he mentions Barqalī as one of the celebrities of his respected ancestral town. Mawlānā Muḥammad, Sharaf Khān says, was raised (and perhaps born) in Bitlīs. We also know from the *Sharaf-nāma* that Barqalī was connected with the rule of Sharaf Khān's grandfather. This connection will be proved by the *hāshiyas* he wrote in *nahw* and dedicated them to the chronicler's grandfather-Sharaf Khān the Killed (Scheref, 1860, i, 341-42).

